



K.T.

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

BEŞA MAKEZANISTA ZIMAN Û WÊJEYA KURDÎ

TEZA LÎSANS A BİLİND

**PEYDABÛNA NIRXÊN CIVAKÎ Û VEKOLÎNA WAN DI HIN
ROMANÊN KURMANCÎ YÊN FOLKLORÎK DE**

ENES AKINCI

131302104

ŞÊWIRMEND

DOÇ. DR. MEHMET ZAHİR ERTEKÎN

BÎNGOL, 2019



T.C.

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

YÜKSEK LİSANS TEZİ

**BAZI KURMANCI FOLKLORİK ROMANLARDA YER ALAN
TOPLUMSAL DEĞERLER VE BU DEĞERLERİN İŞLENİŞİ**

ENES AKINCI

131302104

DANIŞMAN

DOÇ. DR. MEHMET ZAHİR ERTEKİN

BİNGÖL, 2019

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Enes AKINCI tarafından hazırlanan *Peydabûna Nirxên Cîvakî û Vekolîna Wan Di Hin Romanên Kurmancî Yên Folklorîk De (Bazî Kurmancî Folklorik Romanlarda Yer Alan Toplumsal Değerler ve Bu Değerlerin İşlenişi)* başlıklı bu çalışma, 26.11.2019 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliği ile/ oy çokluğu ile] başarılı/başarısız bulunarak jürimiz tarafından [Kürt Dili ve Edebiyatı] Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

Tez Jürisi Üyeleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan : Dr. Öğr. Üyesi Mehmet Emin PURÇAK

İmza: 

Danışman : Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN


İmza: 


Üye : Dr. Öğr. Üyesi Bedrettin BASUĞUY

İmza: 

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun 20.09.2019 tarih ve 18-2 sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.


Doç. Dr. Abdülnasır SÜT
Enstitü Müdürü



NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
ABSTRACT	III
PÊŞGOTIN	IV
KURTEBÊJE	V
DESTPÊK	1
1. Armanç û Girîngîya Tezê	1
2. Çavkanîyên Sereke	1
3. Sînorên Tezê.....	6
4. Zehmetîyên Tezê.....	6
5. Rêbaz.....	7

BEŞA YEKEM

BI GIŞTÎ NIRX Ê TAYBETÎYÊN WAN

1. BI ÇARÇOVEYA GIŞTÎ NIRX.....	8
1.1. PÊNASEYA TÊGEHA NIRXÊ.....	8
1.2. TAYBETÎYÊN NIRXAN	11
1.3. SENIFANDINA NIRXAN.....	13
1.3.1. NIRXÊN CIVAKÎ.....	17
1.4. ERKA (FONKSÎYON) NIRXAN	18
2. TÊKILÎYA FOLKLOR Ê ROMANÊ.....	21
3. TÊKILÎYA FOLKLORÊ Ê NIRXAN	26

BEŞA DUYEM

NIRXÊN CIVAKÎ DI YANZDEH ROMANÊN KURMANCÎ DE

2.1. AŞITÎ	30
2.2. BAWERÎ	31

2.3. COMERDÎ.....	32
2.4. DIRISTÎ.....	38
2.5. EDALET.....	40
2.6. EFÛKIRIN.....	43
2.7. FEDAKARÎ.....	45
2.8. HEVALTÎ – XWEDÎTÎ.....	47
2.9. HURMET.....	49
2.10. MERHEMET.....	58
2.11. MÊRXASÎ.....	61
2.12. MÊVANPERWERÎ.....	81
2.13. NEFSBIÇÛKÎ.....	91
2.14. PAQJÎ.....	91
2.15. QENCÎ.....	92
2.16. SEBIR.....	95
2.17. SOZDAYÎN.....	98
2.18. WEKHEVÎ.....	101
2.19. WETENPERWERÎ.....	103
2.20. XÊRXWAZÎ.....	111
2.22. XWEŞBÎNÎ.....	115
2.23. ZÎREKÎ.....	116
ENCAM Û HILSENGANDIN.....	118
ÇAVKANÎ.....	126
PÊVEK.....	130

KURTE

Nirx, kevirên bingehîn ên jîyana civakî û çandê ne. Lêrikibîna ferdan ya li civaka ku lê dijîn û bi parastina nirxan re, veguhêzîna wan ji neslên dahatûyê re girîng e. Çawa ku her netewe xwedî nirxan be, nirxên hevpar ên gerdûnî jî hene.

Di van salên dawî de li hemû dinê gelek xebatên akademîk, di derbarê nirx û perwerdehîya nirxan de tên kirin û di encama wê de jî xebatên biqîmet derdikevin holê. Armanca hîlbijartina mijara nirxan ew e ku, ferqkirina kêmasîya vê qadê ye û ji xebatên dê sibe bînin kirin re pêşengî ye. Wek her zimanî, pêdivîya vekolîna nirxan a bi kurdî, berê me da vê xebatê.

Di vê xebatê de, nirxên civakî yê ku di romanên kurmançî yê folklorîk de peyda bûyî, hatin tespît kirin û analîza wan hat kirin. Xebata me ya bi navê *Peydabûna Nirxên Civakî û Vekolîna wan Di Hin Romanên Kurmançî yê Folklorîk* De ji du beşên sereke pêk tê. Beşa yekem ji bo zanarîyên teorîk ên derbarê nirxan de hatiye veqetandin. Di beşa yekem de, derbarê pênaseya têgeha nirxê, senifandina nirxan, taybetîyên wan û fonksîyonên wan de agahî hatine dayîn û her wekî din li ser têkilîya folklor û nirxan, folklor û romanê em hinekî sekinîn. Beşa duyem ji bo nirxên civakî hatiye veqetandin. Di vê beşê de ewil me pênaseya van nirxên civakî kir û me mînakên nirxên civakî yê me ji romanên kurmançî yê folklorîk tespît kirî yek bi yek rêz kir û me hin ji van mînakan şîrove kir.

Di pêvajoya xebatê de, ji kitêbên çavkanîyê yê di derbarê nirx û perwerdehîya nirxan de, dane hatin berhev kirin. Ji panzdeh romanên kurmançî yê folklorîk, yanzdeh heb hatin bi dest xistin. Ev roman yek bi yek hatin xwendin û nirxên ku di van romanên de peyda bûyî hatin nivîsandin. Di dawîya xebatê de encamên giştî ku di lêkolînê de hatine bidestxistin hatine dayîn. Her wekî din nirxên civakî yê ku ji romanên hatine tespît kirin weke tabloyê di beşa pêvekê de hatiye pêşkeş kirin.

Bêjeyên Sereke: Nirx, civak, folklor, roman, kurd, çand.

ÖZET

Değerler toplumsal hayatın ve kültürün temel taşlarıdır. Bireylerin yaşadıkları topluma uyum sağlamaları ve değerlerin korunup gelecek nesillere aktarılması önem arz etmektedir. Her milletin kendine özgü değerleri mevcut olduğu gibi evrensel ortak değerler de mevcuttur.

Son yıllarda değerler ve değerler eğitimi ile ilgili çalışmalar oldukça önem kazanmakta ve bunun sonucunda değerli çalışmalar ortaya konulmaktadır. Bu çalışma Kürtçe alanında değerleri ilk kez ele alıp incelediğinden önemlidir. Değerler konusunun seçilmesindeki amaç, bu alanın eksikliğini hissedip bundan sonra yapılacak olan çalışmalara öncülük etmektir. Her dilde olduğu gibi Kürtçede de değerler konusunun işlenmesi gerektiği, bizi bu çalışmaya yönlendirmiştir.

Bu çalışmada folklorik Kürtçe romanlarda yer alan toplumsal değerler tespit edilip bu değerlerin analizi yapılmıştır. *Bazı Folklorik Kürtçe Romanlarda Yer Alan Toplumsal Değerler ve Bu Değerlerin İşlenişi* adlı çalışmamız başlıca iki bölümden oluşmaktadır. Birinci bölüm değerlerle ilgili teorik bilgilere ayrılmıştır. Bu bölümde değer kavramının tanımı, değerlerin sınıflandırılması, özellikleri ve işlevleri ile ilgili bilgiler verilmiştir. Aynı zamanda folklor - roman ve folklor - değer ilişkisi üzerinde durulmuştur. İkinci bölüm sosyal değerler için ayrılmıştır. Bu bölümde öncelikle sosyal değerlerin tanımı verilmiştir son olarak folklorik Kürtçe romanlarda yer alan sosyal değerler tespit edilip bunların analizi yapılmıştır.

Araştırma süresince değerler ve değerler eğitimi ile ilgili kaynak kitaplardan bulgular toplandı. Toplam on beş folklorik Kürtçe romanın, on bir tanesi elde edildi. Bu romanlar tek tek okunarak bulunan değerler kaleme alındı. Çalışma sonunda, çalışma sonucunda elde edilen genel sonuçlar değerlendirme ile birlikte verilmiştir. Aynı zamanda romanlardan tespit edilen sosyal değerler tablo haline getirilerek tezin Ek kısmında sunulmuştur.

Anahtar Kelimeler: Değer, toplum, folklor, roman, Kürtler, kültür.

ABSTRACT

Values are the cornerstones of social life and culture. It is important for individuals to adapt to the society they live in and to protect and transfer the values to future generations. Each nation has its own unique values as well as universal common values.

In recent years, studies on values and values education are gaining importance and as a result valuable studies are put forward. This study is important as it first examines and examines values in the Kurdish field. The purpose of choosing the subject of values is to feel the lack of this field and to lead the future studies. As in every language, the issue of values should be dealt with in Kurdish, and this led us to this study.

In this study, social values in folkloric Kurdish novels were determined and analyzed. Social values and their processing in some Folkloric Kurdish novels consist of two main sections. The first part is devoted to theoretical knowledge about values. In this section, definition of value concept, classification of values, properties and functions are given. At the same time, the relationship between folklore - novel and folk - values is emphasized. The second section is devoted to social values. In this section, firstly the definition of social values is given. Finally, social values in folkloric Kurdish novels were determined and analyzed.

During the research, findings were collected from reference books about values and values education. Eleven of the fifteen folkloric Kurdish novels were obtained. These novels were read one by one closely to find values. At the end of the study, the general results obtained from the study were given together with the evaluation. At the same time, the social values determined from the novels are tabulated and presented in the appendix of the thesis.

Key Words: Values, society, folklor, novels, Kurds, culture.

PÊŞGOTIN

Mijara vê xebatê ya sereke li ser nirxên civakî ye. Di vê xebatê me hewl da ku em bi pêwendîya folklor û romanê, di romanên kurmancî yê folklorîk de nirxên civakî peyde bikin û analîzekê li ser wan bikin.

Di destpêkê de di amadekirina vê tezê de ji bo sebir û keda wî ji mamosteyê xwe yê şewirmend, ji Doç.Dr. M.Zahir ERTEKÎN re malavayîyê dixwazim. Ji bo piştgirî û cesareta ku dayî min, ji heval û dosta xwe Gulê re spasîyên xwe yê taybet pêşkeş dikim. Di wergerên metnên îngilîzî de ji bo alîkarîya wî spas û malavayîyê li Kek Yakûp BEDLEK dikim. Di sererastkirina tezê de ji bo alîkarîya wan, spasîyê li hevala xwe Aynûr ILI û li kek Gulbedîn GULMEZ dikim. Her wekî din spasîyên xwe pêşkeşî malbata xwe û hemû heval û dostên xwe yê ku keda wan li ser min heyî dikim.

Qada kurdî ji bo nirxan û keşîfkirina wan têr û tije ye. Bi hêvîya ku bi hemû qisûr û kêmasîyên xwe, ev xebat rê li ber gelek xebatên din ên akademîk veke.

Enes AKINCI

BÎNGOL - 2019

KURTEBÊJE

amd. : Amadekar

bnr. : Binêrin

ber. : Berawîrd bikin

h.b. : Heman berhem

b.n. : Berhema navborî

bnr.jor. : Li jor binêrin

bnr.jêr. : Li jêr binêrin

r. : Rûpel

wer. : Wergêr

ç. : Çap

c. : Cîld

j. : Jimare

hwd. : Her wekî din

vgh. : Veguhêz

TDK. : Türk Dil Kurumu

DESTPÊK

Her civakên li ser rûyê dinê xwedîyê folklorekê ne û ev folklor gelek caran ji edebîyata wê civakê ya nivîskî re dibe pişt û çavkanî. Edebîyata kurdî ya modern jî gelek caran rehên xwe digihîne zargotinê. Yek ji van cureyên edebî ya ku pişt xwe dide folklorê roman e. Ev roman rehên xwe digihînin folklorê wê civakê ango ev roman pişt xwe didin destan, efsane û çîrokên gelêrî yê wê civakê. Di romanên folklorîk de jîyana civakî, orf û edet, hemanên çandî derdikevin pêş lewma di van romanên de nirxên civakî zû tîr ferqîkin. Lewre, di vê xebatê de me jî pişt xwe da romanên kurmançî yê folklorîk û me yanzdeh romanên kurmançî ji xwe re esas girt û di van romanên de em li nirxên civakî gerîyan.

1. Armanc û Girîngîya Tezê

Di vê xebatê de me hewl da ku em derbarê nirxan de hin zanyarîyên bingehîn bidin û mijarê bi pêwendîya folklor û romanê re zelal bikin û analîzekê li ser nirxên civakî yê ku ji romanên kurmançî yê folklorîk hatine tespîtîkin bikin. Bi vê xebatê, me xwest balê bikişînin ser mijara nirxan û rê li ber xebatên nû yê akademîk vekin.

Xebata me yekemîn teza masterê ya ku derbarê nirxan de ye. Bi vê xebatê me xwest ku di camîeya akademîk de, bi kurdî jî çend tişt hatibin nivîsandin û em balê bikişînin li ser romanên kurmançî yê folklorîk. Lewra folklorê kurdî û romanên kurmançî ji bo keşîfîkirin û analîza nirxan gelekî guncav e. Di vî warî de ev xebat, dê rêya gelek xebatên nû yê akademîk veke û dê pêşengîya xebatên bi vî rengî bike.

2. Çavkanîyên Sereke

Di vê xebatê de, ji bo beşa teorîk (pênaseya têgeha nirxê, erka nirxan, senifandina nirxan, nirxên civakî û taybetîyên nirxan) me bi temamî ji kitêb û gotarên tirkî îstîfade kir. Lewra di edebîyata kurdî de ev qad gelekî vale ye û heta niha tu xebat derbarê nirxan de nehatiye kirin.

Di beşa pêwendîya folklor û romanê û folklor û nirxan de me xwe gihand kitêb û gotarên kurdî. Di vî warî de du teorîsyen û rexnegirên kurd, Remezan Alan û Remezan Pertev bi kitêben xwe rêya me ronî kirin û ji me re bûn alîkar. Hin ji van berhemên sereke li jêr hatine rêzkirin.

1. *Bendname*, Remezan Alan, Weşanên Avesta, 2009, Stenbol.
2. *Folklor û Roman*, Remezan Alan, Weşanên Peywend, 2013, Stenbol.
3. *Keşkûl*, Remezan Alan, Weşanên Peywend, 2019, Stenbol.
4. *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev-Mustafa Aslan, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, 2013, Stenbol.
5. *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Ramazan Pertev, Weşanên Avesta, 2018, Stenbol.

Têkilîyeke xurt a nirxan bi folklor û edebîyatê re heye. Çi berhemên devkî bin çi yên nivîskî bin, mirov dema berê xwe dide wan, jîyana wê civakê ya sosyal bi awayekî eşkere xwe dide der. Lewma me jî berê xwe da romanên kurmancî yên folklorîk ku van romanên piştî xwe dane destan, efsane, çîrokên gelêrî û hwd. Di yanzdeh romanên kurmancî yên folklorîk de çi nirxên civakî hebin yek bi yek hatin tespîtîkirin. Romanên kurmancî yên folklorîk ên ku me ji bo xebata xwe xwendî û tê de nirxên civakî tespît kirî, li jêr li gorî rêza alfabetîkê hatine dayîn.

Romana *Bilîcanê* ji alîyê Perwîz Cîhanî ve, ku ew bixwe kurdekî ji Rojhilatê ye û li Zanîngeha Mardîn Artukluyê, di beşa Ziman û Edebîyata kurdî de mamostetîyê dike, di sala 2002an hatiye nivîsandin. Çapa vê romanê ya yekem di sala 2002an, ji Weşanxaneyê Dozê derdikeve û li Stenbolê çap dibe. Romana *Bilîcanê* ji 512 rûpelan pêk tê û ev roman îlhama xwe ji destana neteweyî ya Kerr û Kulik distîne.

Romana *Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan* ji alîyê Îhsan Colemêrgî ve di sala 1992an hatiye nivîsandin û kitêb di sala 1995an li Swêdê di nav Weşanên Apecê de çap bû. Çapa duyem a vê romanê di sala 2001ê, li Stenbolê, ji nav Weşanên Avestayê derdikeve. Çapa di destê me de ya sêyem e ku di sala

2013an dîsa ji Weşanxaneyê Avestayê derketiye. Romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan ji 195 rûpelan pêk tê û bi devoka Hekaryan hatiye nivîsandin. Kitêb îlhama xwe ji destana neteweyî distîne ku gelek caran ev çîrok bi formên cuda weke stranê tê gotin. Mijara vê romanê ya sereke li ser evîna Cembelî û Binevşê ye.

Romana *Dewrêşê Evdî* ji alîyê Eyup Kiran ve hatiye nivîsandin. Ev roman, di sala 2011an ji nav Weşanên Nûbiharê derdikeve. Roman îlhama xwe ji destana Dewrêşê Evdî digire. Ev destan li gelek deverên welêt, bi gelek formên tê gotin. Kitêb ji 288 rûpelan pêk tê û çapa wê ya sêyem li ber destan e.

Romana *Dimdimê* ji alîyê Ereb Şemo ve hatiye nivîsandin. Çapa vê romanê ya ewil di sala 1966an derketiye ku ev roman wek yekem romana folklorîk tê hesibandin. Ev roman îlhama xwe ji destana Kela Dimdimê distîne. Gelek varyantên destana Dimdimê hene. Her çî qas temaya sereke ya vê kitêbê şer û berxwedan jî be, di kitêbê de hêmanên çandî, jîyana kurdan a civakî û gelek nirxên civakî xwe didin der. Ji nav Weşanên Lîsê çapa kitêbê ya ewil di sala 2007an, ya duyem jî di sala 2016an derketiye. Kitêb ji 266 rûpelan pêk tê. Wergera romanê ya tirkî ji alîyê Edîp Polat ve hatiye kirin û ji weşanên Evrenselê, di sala 2005an çapa wê ya ewil derketiye.

Romana *Evîna Mêrxasekî* ji alîyê Îbrahîm Osman ve hatiye nivîsandin û çapa wê ya ewil di sala 2008an ji Weşanxaneyê Lîsê derketiye. Kitêb ji 381 rûpelan pêk tê. Roman li ser sêrpêhatîya Dewrêş û Edûlê ava bûye ku ji bo xatirê ku bigihijê hezkirîya xwe Edûlê, Dewrêş li gel yanzdeh hevalê xwe dadikeve qada şer û dibe cangorîyê evîna xwe.

Romana *Evîna Pinhan* ji alîyê Sabrî Akbel ve di sala 2006an hatiye nivîsandin. Çapa kitêbê a ewil ji nav Weşanên Nûbiharê derketiye. Roman li ser çîrokeke gelêrî Keja Gulîsor û Salihê Nasir Axa ava bûye. Roman ji 112 rûpelan pêk hatiye. Tirkîya romanê di sala 2018an ji Pirtûkxaneyê Tubayê bi navê “*Gizli Kalmış Bir Aşkın Hikayesi*” derketiye.

Romana *Mem û Zînê* ji alîyê Ronî War ve hatiye nivîsandin. Çapa romanê ya ewil di sala 2011an ji Weşanên Avayê derketiye. Roman îlhama xwe ji destana gelêrî Memê Alan distîne ku gelek varyantên vê destanê hene. Roman ji 160 rûpelan pêk hatiye.

Romana *Ristemê Zal* ji alîyê Edîp Polat ve hatiye nivîsandin. Çapa romanê ya ewil di sala 2007an ji Weşanên Evrenselê derketiye. Roman îlhama xwe ji Destana gelêrî Ristemê Zal distîne. Roman ji 335 rûpelan pêk hatiye.

Romana *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* ji alîyê Mehmed Uzun ve di sala 1991ê hatiye nivîsandin. Çapa romanê ya ewil di sala 1992an ji nav Weşanên Dozê derketiye. Di sala 2010ê ji nav Weşanên Îthakiyê çapa wê derket. Dîsa ji heman weşanxaneyê bi wergera Selîm Temo tirkîya romanê bi navê “*Abdalın Bir Günü*” derketiye. Roman li ser jîyan û serpêhatîyên dengbêjê navdar Evdalê Zeynikê ava bûye. Roman ji 152 rûpelan pêk hatiye.

Romana *Siyabend û Xecê* ji alîyê Ronî War ve hatiye nivîsandin. Çapa romanê ya ewil di sala 2011an ji Weşanên Ava derketiye. Roman îlhama xwe ji destana gelêrî Siyabend û Xecê distîne. Roman ji 157 rûpelan pêk hatiye û çapa duyem li ber destan e.

Romana *Tehar û Zeharê* ji alîyê Ronî War ve hatiye nivîsandin. Çapa romanê ya ewil di sala 2011an ji Weşanên Ava derketiye. Roman îlhama xwe ji destana gelêrî Tehar û Zeharê distîne. Roman ji 150 rûpelan pêk hatiye

Ji bo mijara nirxan, li edebîyata tirkî gelek tezên masterê û yên doktorayê hatine hazirkirin. Di lîteraturê de hejmara van tezan gelek zêde ye. Hin ji van xebatên ku me jî daye ber çavan û di warê metodê de rê nîşanî me dane ev in:

Di sala 2007an li Zanîngeha Selçukê, ji alîyê Vural Kaya ve tezeke bi navê “*Cahit Zarifoğlu'nun Çocuk Kitaplarında Temel Değerler*” ya masterê hatiye hazirkirin. Kaya di vê xebata xwe de kitêbên Cahit Zarifoğlu ji alîyê nirxên dinyewî û nirxên civakî ve dinirxîne.

Di sala 2011an li Zanîngeha Stenbolê, ji aliyê Murat Turna ve tezeke bi navê *“1980 Türk Romanında Değerlerin Çözümlemesi”* ya doktorayê hatiye hazirkirin. Ev xebat di sala 2015an ji aliyê weşanxaneyê Îzê weke kitêb hatiye çapkirin. Turna di vê xebata xwe de cih daye belawelabûnên sosyal, siyasî, olî, iqtisadî, hiqûqî û netewî ya nîrxan û di binê van serenavan de analîzên xwe kiriye.

Di sala 2011an li Zanîngeha Karadeniz Teknikê, ji aliyê Ezgi Kumbasar ve tezeke bi navê *“Muzaffer İzgü'nün Romanlarının Değerler Eğitimi Açısından İncelenmesi”* ya masterê hatiye hazirkirin. Ev tez ji aliyê perwerdehîya nîrxan ve hatiye analîzkirin.

Di sala 2012an li Zanîngeha Uşakê, ji aliyê Serdar Özgün ve tezeke bi navê *“1920-1930 Yılları Arasında Yayımlanmış Türk Romanlarında Görülen Değerler Üzerine Bir Araştırma”* ya masterê hatiye hazirkirin. Özgün di vê xebata xwe de analîzên xwe li ser nîrxên exlaqî, nîrxên estetîkî û nîrxên olî kiriye.

Di sala 2013an li Zanîngeha Uşakê, ji aliyê Ersu Çırak ve tezeke bi navê *“Cengiz Aytmatov Romanlarının Değerler Eğitimine Katkısı”* ya masterê hatiye hazirkirin. Çırak di vê xebata xwe de nîrxên ku di romanên Cengiz Aytmatov de derbas bûne tespît dîke û li ser perwerdehîya nîrxan fikrên xwe tîne ziman.

Di sala 2014an li Zanîngeha Afyon Kocatepeyê, ji aliyê Bahadır Gülден ve tezeke bi navê *“Yavuz Bahadıroğlu'nun Çocuk Romanları ve Hikayelerinde Yer Alan Değerler”* ya masterê hatiye hazirkirin. Gülден di vê xebata xwe de nîrxên ku di roman û çîrokên Yavuz Bahadıroğlu yê zarokan de derbas dibin tespît dîke û li ser wê analîzên xwe dîke.

Derbarê nîrxan de gelek kitêbên çapkirî jî hene, me jî xwe gihand çend heb jî wanan û me jî wan îstîfade kir. Di sala 2012an ji aliyê Doç. Dr. Bülent Dilmaç û Doç. Dr. Kadir Ulusoy ve kitêbeke bi navê *“Değerler Eğitimi”* ji Weşanxaneyê Pegem Akademiyê derket. Ev kitêb ji du beşan pêk tê û tê de

pêneseya nîrxê, senifandina wê û perwerdehîya nîrxan bi awayekî berfireh cih digire.

Kitêbeke din ya derbarê vê mijarê de dîsa ji Weşanxaneyê Pegem Akademiyê, di sala 2014an bi navê “*Değerler ve Değerler Psikolojisi*” derketiye. Edîtorên vê kitêbê Doç. Dr. Bülent Dilmaç û Doç. Dr. Hasan Hüseyin Bircan in. Kitêb ji neh beşên cuda pêk tê û her beşek ji aliyê akademîsyenekî ve hatiye hazirkirin. Di vê kitêbê de, di her gotarekê de mirov alîyekî nîrxanê cuda dibîne.

3. Sînorên Tezê

Ev tez eger neyê sînorkirin û çarçoveyê wê dîyar nebe îhtîmal e ku ji peyama sereke ya ku bê xwestin dîr bikeve. Xebata me tenê li ser romanên kurmancî yê folklorîk ava bûye ku me qet berê xwe nedaye çîrok, helbest û cureyên din ên romanên ku me ew esas negirtine. Hejmara wan tam neyê zanîn jî bi kurdîya kurmancî gelek romanên folklorîk hatine nivîsandin. Xebata me ji van romanên tenê yanzdeh heban esas digire. Di nava van romanên de ji Qefqasyayê, ji Dîasporayê û ji Rojhilat jî mînak hene ku her yek parçeyeke mozaîka edebîyata kurdî temam dikin.

Her wekî din xebata me di van romanên de li hemû nîrxan nagere. Tenê berê xwe dide nîrxên civakî ku ev tişt jî sînorê teza me dîyar dike. Lewma ji bilî nîrxên ku hatine tesbîtkirin mihtemelen hinên din jî hene. Lê ji bo ku ji sînorê tezê neyê derketin, em li ser wan nesekinîn.

Nîrxên civakî yê ku di romanên kurmancî yê folklorîk de xwe dane der ev in: *Aşitî, bawerî, comerdî, diristî, edalet, efûkirin, fedakarî, hevaltî, hurmet, merhemet, mêrxasî, nefsbîçûkî, paqijî, qencî, sebir, sozdayîn, wekhevî, wetenperwerî, xêrxwazî, xweşbînî û zîrekî.*

4. Zehmetîyên Tezê

Zehmetî û pîrsgirêka sereke ya vê xebatê di kurmancî de tunebûna xebatên li ser mijara nîrxanê bû. Me ji bo nîrxanê di kurdî de tu çavkanî û referans ji xwe re peyde nekir. Lewre me berê xwe da zimanê tirkî û me ji

gelek gotar û kitêbên tirkî yên akademîk îstîfade kir. Me ji van çavkanîyan, ji bo teza xwe ji gelek metnên akademîk ji tirkî bo kurmancî wergerand. Di vê pêvajoyê de gelek wextê min bi wergera van metnên akademîk re çû.

Zehmetîya herî zêde ew bû ku di warê nirxan de her çi qas berhemên îngilîzî yên gelekî bikêr hebûn jî ji ber ku îngilîzîya me ne xurt bû, me nekarî ji van berheman îstîfade bikin. Zorîya mijarê bixwe li alîyekî, peydekirina çavkanîyan û berfirehîya mijarê hin zehmetîyên din ên vê xebatê bûn.

5. Rêbaz

Du rêbazên tespîtkirina nirxên civakî hene. A ewil, nirxên civakî tên dîyarkirin paşê di nav romanên kurmancî yên folklorîk de li wan nirxan tê gerîn. Ya diduyan, romanên kurmancî yên folklorîk tên xwendin paşê hema çi nirx hebin tên tespîtkirin. Xebata me rêbaza ewil esas digire. Ewil me nirxên civakî dîyar kir, paşê di romanên xwe de em li wan gerîyan û me ew yek bi yek tespît kir.

Ev xebat ji alîyê rastnivîsê ve li gor rêgezên *Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmanciyê** hatiye nivîsandin. Bi giştî, heta ji me hat, di nivîsandina vê xebatê de em li ser qaîde û esasên wê man.

* Bnr. Bahîz Omer Ehmed, Bahoz Baran û yên din, *Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmanciyê*, Weqfa Mezopotamyayê, Stenbol, 2019.

BEŞA YEKEM

BI GIŞTÎ NIRX Û TAYBETÎYÊN WAN

1. BI ÇARÇOVEYA GIŞTÎ NIRX

1.1. PÊNASEYA TÊGEHA NIRXÊ

Nirx û perwerdehîya nirxan ne mijar û qadeke nû ye. Ji serdemên tarîxê ên qedîm û vir ve lêkolîneran derbarê nirx û perwerdehîya wê de fikrên xwe anînê zimên. Li gorî Lickona neqil dike, Feylesofê Yewnanî Platon, perwerdehîya nirxan wek peywira dibistanan dîtiye¹. Mijara nirxan her çi qas mijareke ku li ser tê sekinîn û dîsa her çi qas derbarê nirxan de gelek xebatên zanistî û sosyolojîk hatibin kirin jî hêj negihiştiye encameke hevpar ku nirx çi ye û di nava xwe de çi dihewîne.

Her çi qas pênaseyeke hevpar a nirxê tune be jî bi wê rola xwe ya muhîm a li ser civakê balê dikişîne ser xwe. Jîyana hevpar a mirovan bi rêzikên civakî didome. Nirx, ji van rêzikên civakî re dibin çavkanî û pişteke qawîm. Lewma nirx, kevirên bingehîn ên civakê ne. Nirx bandorê li tevgerên mirovan û jîyana wan a civakî dike. Lewma nirx gelek alîyên jîyana civakî dixemilîne û gelek fonksiyon û kêrhatîyên wê hene. Bêyî nirxan, civakek bi kaos û gêreyên civakî re rûbirû dimîne û dahatûya wê civakê dikeve xetereyê lewma parastina nirxan û veguhestina wan ji neslên sibe re muhîm e.

Gelo nirx çi ye? Di literatura zanistên civakî de gelek pênaseyên nirxan ên ji hev cihê hatine kirin. Têgeha nirxê, di sala 1918an ji alîyê Znaniecki ve cara ewil di zanistên civakî de hatiye bikaranîn. Ev têgeh bi latînî tê wateya “qîmetdarbûn” an jî “bihêzbûnê” ku ji koka “valere” hatiye dariştin.² Têgeha nirxê ji berê heta îro ji felsefeyê heta civaknasîyê, ji ekonomîyê heta perwerdehîyê di gelek beşên zanistê de hatiye bikaranîn. Bi encama wê jî gelek pênaseyên nirxan ên cihêreng derketine holê. Di ferhenga D.Îzolî de nirx di wateyên wek buha, fiyet, qîmetdayîn û hurmet

¹ Ersu Çırak, *Cengiz Aytmatov Romanlarının Değerler Eğitimiine Katkısı*, Yüksek Lisans Tezi, Uşak, 2013, r. 16.

² Nuri Bilgin, *Sosyal Psikolojide Yöntem ve Pratik Çalışmalar*, Sistem Yayınları, İstanbul, 1995, r. 83.

nîşandayîne de hatiye bikaranîn.³ Li gor TDKyê nirx: Hemû hêmanên madî û manewî yê nirxên neteweyekê yê civakî, çandî, ekonomîk û zanistî ne.⁴ Erdem Artan nirxan wek “Her cure fikr, tevger, nêrîn, rêbaz û qîmetên civakî, însanî, îdeolojîk an jî îlahî, ên di nav civakekê de ango di nav bawerî û îdeolojîyêkê de an jî di nava mirovan de hatî qebûlîkirin û pejirandin” pênase dike.⁵ Lewma em dikarin bibêjin ku nirx bi civakê ve girêdayî ne û rehên xwe ji çand û bawerîyên wê civakê distînin. Nirx ku berê di wateya têgeha îqtîsadê de dihat bikaranîn û bi hayber û pereyan re eleqedar bû, di roja îroyîn de wek têgeheke exlaqî jî tê bikaranîn.

Li gor Beil nirx, şewandina tevgerên hem derbarê mirov bixwe hem jî kesên din de dike û nirx erka rêberîya tevgerên mirovan dike.⁶ Bi rêberîya nirxan, mirov tevgerê him li hember xwe him jî li hember civakê dike. Nirx bi vê peywira xwe, li tevgerên mirovan mudaxele dike û şekil dide wan tevgeran.

Têgeha nirxê di gelek qadên zanistê yê wek psîkolojî, civaknasî, felsefe, aborî û dîrokê de tê bikaranîn. Nirx, ji olê heta ekonomîyê, ji derûnnasîyê heta civaknasî û felsefeyê di gelek qadên cihê de tê bikaranîn. Di zanista felsefeyê de kesê ku cara ewil li ser têgeha nirxê sekinî ye, bi berhema xwe ya navdar “*Xetên Bingeh ên Aksîyolojîyê*” Eduard Von Hartmann e. Dema em li van çend sedsalên dawî dinêrin, em dibînin ku nirx bûye yekem pirsgirêkên bingeh ên zanistên civakî. Nirx, di gelek beşên zanista civakî de bûye mijara lêkolînê. Civaknas, derûnnasên civakî, mirovnas û derûnnas hin ji wan zanyarên ku di derbarê nirxan de lêkolînan dikin. Di ferhenga akademîk de navê vê zanistê wiha hatiye ravekirin: Aksîyolojî ango nirxzanî ew disîplîn e ku di warê bandora nirxan a li ser civatê de xebat û lêkolînan çêdike.⁷

Em dikarin nirxê wek “hemû bawerîyên ku tevgerên mirovan dişikilînin û taybetîyên bingeh ên mirovan ji zîndewerên din vediqetînin û di nava xwe de

³ D. Îzolî, *Ferheng*, Weşanên Deng, Amed, 2007, r. 430.

⁴ TDK, “Türk Dil Kurumu Sözlüğü”, <http://sozluk.gov.tr/>, 05 Sibata 2019.

⁵ Erdem Artan, *Üniversite Gençliği Değerleri: Korkular ve Umutlar*, TESEV Yayınları, İstanbul, 2005, r. 14.

⁶ Brigitte Beil, *İyi Çocuk, Zor Çocuk. Doğru Davranışlar Çocuklara Nasıl Kazandırılır?* (Çev. Cuma Yorulmaz), Arkadaş Yayınevi, Ankara, 2003, r. 14.

⁷ Ferheng Akademîk, <https://www.ferhengakademik.org/index.php>, 08 Tebax 2019.

dihewînin û xwedî taybetîyên ku mirovan dikin mirov” pênase bikin.⁸ Nirx bi vê fonksiyona xwe ya taybet berê tevgerên mirovan jî dide deverekî. Ango nirx rêbertîya tevgerên mirovan dikin.

Îfadeyên Bolay ên li ser vê mijarê balkêş in: “Tiştê ku di dewsa bêziravîyê de wêrekîyê, di dewsa zeîfbûnê de bihêzbûnê, di dewsa bêkêrîyê de jêhatîbûnê, di dewsa qesîsîyê de comerdîyê, di dewsa neheqîyê de edaletê, di dewsa tiralîyê de zîrekîyê, di dewsa derewê de dirîstbûnê dide tercîhkirin çî ye? Bandora nirx û bawerîyan li ser pêkanîna van tevger û tercîha tevgeran de her tim heye.”⁹

Mirov jîyana xwe di nav civakê de didomîne û tevgerên xwe li gor civaka ku lê dijî şêkil distîne. Nirx, rêbertîya van tevgeran dikin. Ango mirov dikare bibeje ku nirx pisûle ye ku berê mirov dide cihê ku biçê. Ji rabûn û rûniştinê heta cil lixwekirinê, ji zêwacê heta silavdayînê her tişt di bin bandora nirxan de ye.

Kurtdede Fidan di gotareke xwe de wiha dibêje: “Nirx, bi zayînê re di mirovî de ne mewcûd in. Bi demê re, bi encama têkilî û çavdêrîyê mirov fêrî wan dibin.”¹⁰ Nirx bi rêya genetîkê derbasî ferdan nabin; li derûdorên wek dibistan û malbatan tîndîr fêrbûn. Bi zayînê re mirov nabin xwedî nirxan, bi demê re, bi jîyana civakî re mirov fêrî nirxan dibin. Bi têkilîya mirovan, ji malbatê û ji derûdorê bi rêya ceribandîna û çavdêrîkirinê mirov fêrî nirxan dibin.

Mocan, meseleya mutlaqbûn an jî goranîya nirxan wiha anîye ziman: “Bi tarîxa felsefeyê re, meseleya mutlaqîya (neguher) nirxan an goranîya (guherbar) nirxan bûye mijara nîqaşê. Li gorî kesên ku mutlaqbûna nirxan diparêzin nirx biteqez rast in an jî biteqez xelet in. Li gorî mirovan, civakê û demê naguherin. Dizîkirin, qetil, derewkirin ji bo her mirovî, her dem xelet e. Li gorî kesên ku goranîya nirxan diparêzin, nirx carinan di heman civakê de li gorî mirovan an jî di heman wextî de li gorî civakan cihêrengîyê nîşan didin.”¹¹

⁸ Kadir Ulusoy&Bülent Dilmaç, *Değerler Eğitimi*, Pegem Akademi Yayınları, Ankara, 2012, r. 16.

⁹ Hayri Bolay, “*Değerlerimiz ve Günlük Hayat*”, Dem Dergi, İstanbul, 2007, r. 15-16.

¹⁰ Nuray Kurtdede Fidan, “*Sosyal Bilgiler Dersinde Değerler Eğitimi: Nitel Bir Araştırma*”, The Journal of Academic Social Science Studies, 2013, r. 363.

¹¹ Ahmet Mocan, *Abdullah Ziya Kozanoğlu'nun Tarihi Romanlarındaki Değerlerin Türkçe Eğitimi Açısından İncelenmesi*, Yüksek Lisans Tezi, Muğla, 2011, r. 32

Nirx, bawerî û îdealên ku ji alfyê civakê an jî ji alfyê komeke civakî ve biqîmet tîn dîtin in. Nirx parçeyeke girîng ya çanda mirov û civakê pêk tînin, li gor civakan û demê bi awayekî cihêreng derdikevin pêşberî me. Lewma em dikarin bêjin nirx dînamîk in; him di nav civakan de him jî di nav demê de diguherin.

Li gorî Oğuzkan nirx, bawerîyên resen ên tevgerên berdewamî yên şexsekî li rewşên cîwêwaz beralî dîke û nirx bingeheên xwe jî orf, edet, bastan û kevneşopîyên civakê distînin.¹² Li gorî Gungor jî nirx biteqez jî hev nayên qutkirin. Bi hev re hebûna xwe ya civakî dikarin bidin nîşandan.¹³

Mirov dikare gelek pênaseyên din ên nirxan li vir rêz bike lê dîsa jî dawîyê de em ê negihîjin pênaseyê yekser û hevpar. Wek me di serî de got, her çî qas derbarê nirxan de gelek xebatên zanistî û sosyolojîk hatibin kirin jî hêj negihîştîye wê encamê ku nirx çî ye û di nava xwe de çî dihewîne.

1.2. TAYBETÎYÊN NIRXAN

Wek her disiplîne nirx jî xwedîyê hin taybetîyên xweser in. Di binê vê serenavê de em ê cihê bidin hin ji van taybetîyên nirxan. Ev taybetîyên nirxan ên ku hatine dayîn, ji aliyê teorîsyenên ku hakimê vê qadê ne hatine rêzkirin.

Öztürk, taybetîyên nirxan bi vî awayî rêz kiriye:

- 1- Nirx tîn parvekirin.
- 2- Nirx cidî ne.
- 3- Nirx bi coşê re peyde dibin.
- 4- Nirx tîn jêcihekirin.
- 5- Nirx mayînde ne.
- 6- Nirx baweriyek in.
- 7- Nirx hevryazek in.¹⁴

¹² A. Ferhan Oğuzkan, *Eğitim Terimleri Sözlüğü*, TDK Yayınları, Ankara, 1993, r. 45.

¹³ Güngör Erol, *Değerler Psikolojisi Üzerine Araştırmalar*, Ötüken Yayınları, İstanbul, 1998, r. 74.

¹⁴ Ayşe Öztürk, *“Değerler Eğitimi Programının 6 Yaş Çocuklarının Sosyal ve Duygusal Gelişimlerine Etkisi”*, Selçuk Üniversitesi SBE, Konya, 2011, r. 12.

Ev taybetîyên li jor ku ji bo nirxan hatine rêzkirin, didin nîşan ku nirx di nava civakê de roleke girîng dilîzin û bandorekê li ser civakê çêdikin. Li gorî van taybetîyan em dikarin bibêjin ku nirx civakê zinde dihêle.

Rokeach jî taybetîyên nirxan wek li jêr îfade kiriye:

- 1- Pîverên piralî ne ku rêbertîya tevgerên ferdan dikin.
- 2- Rêbertîya ferdan dikin ku xwe îfade bikin.
- 3- Xwedî bandor in ku li kesên din bandorê bikin û wan qaneh bikin.
- 4- Ferdan teşwîq dikin ku di asta civakî de cihekî bistînin.
- 5- Di tercîhên ferdan yê polîtîk an jî olî de roleke girîng dilîzin.
- 6- Di rexne, pesindayîn û nirxandina mirovan a li hember xwe û şexsên din de roleke girîng dilîzin.
- 7- Pîvanên wek nirxandina ferdan ji alîyê exlaqî ve ne.¹⁵

Fichter jî taybetîyên nirxan bi vî awayî rêz dike:

- 1- Nirx tîpî parvekirin.
- 2- Nirx cidî ne.
- 3- Nirx bi coşê re peyde dibin.
- 4- Nirx tîpî jêcihekirin.
- 5- Nirx civakî ne.
- 6- Nirxên civakî domdar in.
- 7- Nirx bi ziman û sembolan vediguhêzin.
- 8- Nirx ji guherîna re vekirî ne.
- 9- Nirx hêmanên exlaqî, bawerî ango standartên watedar in.
- 10- Nirx standartên ku hîlbijartin ango guherîna bûyer, mirov û tevgeran beralî dike.¹⁶

¹⁵ Ali Karababa, *Değerler ve Değerler Psikolojisi*, Pegem Akademi Yayınları, Ankara, 2015, r. 5.

¹⁶ Mehmet Yazıcı, "Değerler ve Toplumsal Yapıda Değerlerin Yeri", *Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, Elazığ, 2014, r. 212-213.

1.3. SENIFANDINA NIRXAN

Senifandina nirxan ji alfyê gelek lêkolîneran ve hatiye kirin û her senifandin jî li gorî taybetîyên xwe yê xweser hatine kirin. Lewma di destê me de senifandike hevpar tune ye. Nirx heta niha li gorî fonksiyon, naverok, hêman û hwd. hatine senifandin. Em ê di vê beşê de cihê bidin çend senifandinên sereke yê ji hev cihê yê lêkolîneran.

Allport, Vernon û Lidzey di xebatên xwe de nirx di bin şeş kategorîyên bingehên wek aborî, estetîk, zanistî, siyasî, civakî û olî vekolane.¹⁷ Her wekî din Gungor jî nirx di bin şeş kategorîyan de ew gihandine hev. Em dikarin van kategorîyan nirxên wek; estetîk, teorîk, iktisadî, siyasî, civakî û olî bisenifnin.¹⁸ Filîz di sala 1998an de senifandineke cihê ya nirxan çêdike û nirxan di bin du kategorîyên wek; naverok (biarmanc-biniyet) û erkî (fonksiyonî) de dide ber hev.¹⁹

Dilmaç û Arıcak di encama xebatên xwe de, nirx di bin neh kategorîyan de standine û bi vî şiklî vediguhêzin:

1. **Nirxên Civakî:** Di vê grûba nirxan de nirxên wek xêrxwazî, nefsbîçûkî, dilnazikî, hurmet û xweşbînî xwe didin pêş.
2. **Nirxên Hokar:** Di vê grûbê de jî wesf, perwerde û hokar derdikevin pêş.
3. **Nirxên Entelektuel:** Di vê grûbê de têgehên wek siheta beden, siheta hiş û aqil, zanîn û serfirazî derdikevin pêş.
4. **Manewîyat:** Îbadet, ol, îman, hizur li pêş in.
5. **Nirxên Materyalîst:** Armancên daringî û amûrên wek dirav, mal û milk, statu vê grûba nirxan pêk tînin.
6. **Rûmeta Mirovî:** Têgehên wek namûs, şeref/rûmet, edalet derdikevin pêş.
7. **Nirxên Romantîk:** Di vê grûba nirxan de jî evîn, zewq, yar li pêş in.
8. **Azadî:** Têgehên wek serxwebûn, ked, çand û vê grûba nirxan pêk tînin.
9. **Fituwet:** Di vê beşê de têgehên wek comerdî, mêrxasî derdikevin pêş.²⁰

¹⁷ Ulusoy&Dilmaç, *Değerler Eğitimi*, r. 23.

¹⁸ Erol, *Değerler Psikolojisi Üzerine Araştırmalar*, r. 74.

¹⁹ Ulusoy&Dilmaç, *h.b.*, r. 23.

²⁰ Karababa, *Değerler ve Değerler Psikolojisi*, r. 17.

Senifandineke din jî ji alîyê Sarı ve hatiye kirin ku bi vî awayî ye: “Li gorî wesfên wan em dikarin behsa sê senifandinên nirxan bikin. Ev nirxên madî, nirxên manewî û him nirxên madî û him nirxên manewî ne. Nirxên manewî di nava xwe de çar nirxên sereke yên bi navê; nirxa heqîqetê (nirxên zanistî), nirxa qencîyê (nirxên exlaqî), nirxa xweşikîyê (nirxên estetîkî) û nirxa heq û edaletê dihewînin. Nirxên madî ji mal û milkan pêk tên. Nirxên him madî û him ên manewî di nava xwe de kedê dihewînin.”²¹

Eduard Spranger nirxan wek modelên li jêr disenifîne:

- 1. Nirxên Zanistî:** Giringî ji rastîyê re tê dayîn, zanîn, muqayese, nêrîna rexneyî li pêş e. Ferdên xwedîyên van nirxan bin wek hengirî, ezmûnî û entelektuel tên binavkirin.
- 2. Nirxên Aborî:** Karvanîti û hêsanbarî li pêş e. Bi armancên daringî û amûran re têkildar e. Ferdên ku xwedîyên van nirxan bin di jîyanê de qîmet didin nirxên daringî.
- 3. Nirxên Estetîk:** Simetrî, lihevhatin, pergal, şikil û estetîk li pêş e. Li gor ferdên xwedîyên van nirxan, huner ji bo civakê zarûret e.
- 4. Nirxên Civakî:** Hezkirina mirovî, xêrxwazî li pêş e. Ferdên xwedîyên van nirxan bin, xwîngerm û mirovperwer xuya dikin.
- 5. Nirxên Polîtîk:** Serkêşî, hêza takekesî, şan û tekûzayî li pêş e. Ferdên xwedîyên van nirxan bin ji rêvebirinê hez dikin.
- 6. Nirxên Olî:** Nirxên ku derbarê bawerîyên giştî û derbarê dinya û gerdûnê de ne li pêş in. Yên ku xwedîyên van nirxan bin gerdûnê bi tevahî dinirxînin û dikarin di rêya dîne xwe de çêjên dinyewî feda bikin.²²

Her çi qas her netewe xwedîyê nirxên xweser bin jî nirxên hevpar ên gerdûnê jî hene. Sarı dibêje ku nirxên civakî gerdûnê ne.²³ Ango nirxên civakî, nirxên hevpar ên mirovahîyê ne. Ji alîyê giringî û qîmetdayînê ve jî rêza nirxên netewî û nirxên gerdûnê jî li gorî civakan diguherin. Mînak, mêvanperwerî nirxeke gerdûnê ye lê

²¹ Osman Sarı, “Sosyal Değerler Emek ve Sosyal Edebiyata Dair Bazı Düşünceler”, FSM İlmî Araştırmalar İnsan ve Toplum Bilimleri Dergisi, İstanbul, 2013, r. 216.

²² Karababa, *Değerler ve Değerler Psikolojisi*, r. 16.

²³ Sarı, *h.b.*, r. 212.

hinek civak qîmeteke zêde didin vê nirxê û didin pêşîya gelek nirxan lê ji bo civakeke din dibe ku ev nirx ne ew qas biqîmet be.

Evin û Kafadar di xebatên xwe de li ser nirxên netewî û nirxên gerdûnî sekinîne. Ev nirx bi vî awayî ji hev veqetandine. Netewe, dewlet, weten, artêş, komar, sembolên neteweyî (sirûda neteweyî, abîdeyên neteweyî, cejnên neteweyî, ala.), gernasî, ziman, çand û orf wek “sembolên netewî û nirx” dîyar kirine. Demokrasî, maf û azadîya mirovan, şaristanî, aşitî, wekhevî, zanist û fikirîna zanistî, huner, hesasîyeta hawîrdorê û hezkirin jî wek “nirxên gerdûnî” dîyar kirine.²⁴ Wek tê xuyakirin ji van nirxên hatine bi rêzkirin neh heb nirxên netewî, neh heb jî nirxên gerdûnî ne.

Refshauge cih daye nirxên bingeh. Li gorî Refshauge nirxên bingeh ev in:

- **Diristî:** Bi awayekî hevgerî dirist û ewlemendbûn.
- **Tekûzî:** Tekoşîna ji bo serkeftina herî bilind ya takekesî ya di her qada jîyana civakî û takekesî û jîyana dibistanê de.
- **Hurmet:** Ji bo xwe û kesên din rêzgirtin û qebûlkirina fikir û nêrînên cihê yê kesên din.
- **Berpirsyarî:** Ji bo tevgerên xwe yê civakî û şexsî, li hember xwe, li hember kesên din û hawîrdorê berpirsyarîbûn.
- **Tevlîbûn:** Ji bo kamiranîya civakî û aborî ya netewe û civakê, endambûna komeke çalak û hilberdar.
- **Hevkarî:** Di gihîştina armancên hevpar de, xebata di nav hevkarîyê de.
- **Girîngîpêdan:** Bi empatî û tevgerên merhemetî fikirîna kamiranîya xwe û ya kesên din.
- **Bêalî:** Li hember bêedaletîyê, pêşdarazîyê û nejidilbûyînê derketin û sadiqbûna hêmanên edaleta civakî.
- **Demokrasî:** Qebûlkirin û bilindkirina berpirsyarî, maf û azadîya hemwelatîya Awustralyayê.²⁵

²⁴ Ulusoy&Dilmaç, *Değerler Eğitimi*, r. 28.

²⁵ *H.b.*, r. 32.

Prencipe&Helwig nirx di binê şeş grûban de dîyar kirine. Li gorî wan;

1. Nirxên exlaqî yên di derbarê meseleyên wek kamiranî, edalet û mafan de.
2. Nirxên xislet ên exlaqî yên ji şexsîyeta takekesî an jî nirxên derbarê taybetîyên xisletan pêk tên.
3. Nirxên xislet ên neexlaqî yên di derbarê taybetîyên xisletan de.
4. Nirxên exlaqî yên siyasî.
5. Nirxên siyasî yên çandî yên di nava xwe de nirxên siyasî yên wek eşqa weten an jî welatperweriyê dihewînin.
6. Nirxên olî.²⁶

Yazici di gotara xwe de wiha dibêje: “Li ser nirxan gelek senifandinên cihê hatine kirin. Di nava van senifandinan de yên herî zêde tên zanîn û tên qebûlkirin senifandinên ku ji alîyê Nelson, Rokeach, Spranger û Schwartz ve hatine kirin in. Li gorî Nelson sê senifandinên nirxan hene: nirxên ferdî, nirxên komî û nirxên civakî. Nirxên ferdî, têkilîyên wê bi tercîhên me yên şexsî, bi hobî, tiştên kirîn û firotinê û bi hîlbijartinên me re hene. Nirxên komî, nirxên ku bi endamên komeke diyar ve tên parvekirin in. Ev kom; komên polîtîk an dînî, klûb, malbat û hwd. Nirxên civakî, nirxên wek edalet, hurmet, cihêrengî, wekhevîyê ne û ev nirx bi kêrî parastina hebûna ferdî ya di nav civakê de tên. Di pênasekirina nirxên civakî de têgehên wek hişê civakî, norm, ruhê komê û civakîbûn tên bikaranîn.”²⁷

Xebatên derbarê nirx û perwerdehîya nirxan a welatekî bandorê li pergala wê ya perwerdehîyê jî dike. Di van salên dawî de li Tirkîyê û li gelek welatan li ser nirxan û perwerdehîya wan gelekî tê sekinîn. Wezaretê Perwerdehîyê ya Tirkîyê di sala 2018an de bernameya xwe ya hîndekarîyê nû kir. Di vê bernameya nû ya hîndekarîyê de perwerdehîya nirxan jî cih girtiye û serenaveke taybet ji bo vê beşê hatiye veqetandin. Ji bo her merheleya polan ên dibistanan nirxên hevpar hatine dîyarkirin. Navê van nirxên hevpar jî wek “*nirxên bingeh*” hatiye pênasekirin. Nirxên bingeh ên di bernameya nû ya hîndekarîyê de derbas dibin ev in: “*Edalet, dostanî, diristî, xwekontrol, sebir, hurmet, hezkirin, berpirsiyarî, wetenperwerî,*

²⁶ Ulusoy&Dilmaç, *Değerler Eğitimi*, r. 33.

²⁷ Kubilay Yazıcı, “*Değerler Eğitime Genel Bir Bakış*”, *Türklük Bilimi Araştırmaları Dergisi*, Ankara, 2006, r. 501.

xêrxwazî.”²⁸ Ji bilî nirxên hevpar, li gorî her ders û her astê nirxê divê bên dayîn jî hene. Ev nirx li gorî dersan û li gorî asta polan ji hev diguherin. Mînak, li gorî Bernameya Hîndekarîyê ya Dersa Zanistên Civakî, di polên 4, 5, 6 û 7. de nirxên ku divê li xwendekaran bên qezanckirin ev in: “*Edalet, qîmetdayîna yekîtîya malbatê, serxwebûn, aşitî, zanistî, zîrekî, piştevanî, hestiyarî, diristî, estetîk, wekhevî, azadî, hurmet, hezkirin, berpirsiyarî, teserûf, wetenperwerî, xêrxwazî.*”²⁹ Ev nirx bi awayekî sistematîk, li gorî asta polê û li gorî unîteyên dersan li xwendekaran tên qezanckirin.

1.3.1. NIRXÊN CIVAKÎ

Nirxên civakî ji bo mirovan in. Nirxên civakî di nav civakê de û bi mirovan re dijîn. Ji bilî mirov û civakan li xwezayê, bi heywan û nebatan re ne mewcûd in. Lewma ji nirxên civakî re nirxên mirovî (les valeurs humains) jî tên gotin. Nirx yek ji hêmanên girîng ên civakê ne. Civak bi parastin û veguhezîna nirxan, gaveke saxlem diavêjin dahatûyê û rê li pêşîya her cure kaos û anomîyan digirin. Lewma nirx di jîyana civakî de roleke gelekî mezin û çalak dilîzin. Turna, di xebata xwe de ji bo nirxên civakî wiha dibêje: “Nirxên civakî jî eynî wek nirxên exlaqî erka muhafezekirina ahenga civakê pêk tînin.”³⁰ Nirxên civakî bi vê peywira xwe ya stratejîk, di civakê de xwediyê cihekî girîng in.

Nirxên civakî temsîla fikir û hestên hevpar ên ferdên civakê dikin û nirxên civakî yekîtîya civakê xurt dikin. Nirxên civakî bi bawerîyên olî û exlaqê re girêdayî ne û piştî xwe didin wan. Nirxên civakî li gorî civakan diguherin. Bi demê re di heman civakê de jî diguherin. Li gorî Sarî, nirxên civakî çî pêdivîyên me yên madî çî yên manewî bînin cih jî pêdivîyeke me ya bêdawî li nirxên civakî heye.³¹

Her çî qas di literatûrê de senifandineke hevpar a nirxên civakî tune be jî hin lekolfîneran li gorî xwe ew senifanfîne. Göz nirxên civakî bi vî şiklî rêz dike: “*Hezkirin, hurmet, xweşbînî, azadî, berpirsiyarî, edalet û wekhevî, biratî, alîkarî û*

²⁸ MEB, [http://mufredat.meb.gov.tr/Dosyalar/2018130153652546-DKAB_\(4-8.%20S%C4%B1n%C4%B1f\)_DOP_%202018.pdf](http://mufredat.meb.gov.tr/Dosyalar/2018130153652546-DKAB_(4-8.%20S%C4%B1n%C4%B1f)_DOP_%202018.pdf), 08 Tebax 2019.

²⁹ MEB, <http://mufredat.meb.gov.tr/ProgramDetay.aspx?PID=354>, 08 Tebax 2019.

³⁰ Murat Turna, *Türk Romanında Değerler Çözülmesi*, İz Yayıncılık, İstanbul, 2015, r. 47.

³¹ Sarî, “*Sosyal Değerler Emek ve Sosyal Edebiyata Dair Bazı Düşünceler*”, r. 208.

piştevanî, diristî, zîrekî, mêvanperwerî, qencî, xêrxwazî, fedakarî, şefqet û merhemet, nefsbîçûkî û dilnizmî, silavdayîn, xwedî derketina mîrasa çandî.”³² Li gorî Korukcu, nirxên civakî bi rêjeyeke zêde çavkanîya xwe ji olê distînin. Di nav wan de nirxên wek li xwe kirina cil û bergan, têkilîya mezin û biçûkan a di malbatê de, têkilîyên cîrantîyê, serdana nas û dostan, alîkarî û parvekirin, parvekirina kêfxweşî û xemgînîyan û hwd. hene.³³ Ev nirxên hatine rêzîkirin ji bo pêkhatina yekîtî û pergala civakê hêmanên pêwîst in. Li gorî Ulken jî nirxên civakî, nirxên bingeh ên hişmendîya kolektîf a civakê pêk tînin.³⁴

Nirxên civakî ji bo pêşvebirina têkilîyên sosyal û rê libergirtina her cure berberîyê roleke çalak dilîzin. Mirov van nirxên civakî bi saya du sazîyên civakî fêr dibe. A ewil malbat e, ya diduyan jî bi rêya perwerdehîyê ye ku her du sazî jî di civakê de, xwedîyê cihekî stratejîk û girîng in. Mirov nirxan cara ewil, di malbatê de bi rêya perwerdehîyêke înfomal dinase û li dibistanê bi rêya perwerdehîyêke formal û sistematîk nirxan qezanc dike. Ozturk mirovên ku bêyî nirxên civakî dijîn wek mirovên bêşexsîyet, zeîf û bêmexsed dibîne.³⁵

1.4. ERKA (FONKSÎYON) NIRXAN

Bi giştî nirx bandorê li jîyana me ya civakî dikin. Di jîyana me ya civakî de her nirxek xwedîyê erkekê ye û wê erkê bi cîh tîne. Heke em civakê wek avahîyekê tesewir bikin, ferdên wê, hêmanên bingeh in û nirx jî çîmentoya wê ye. Nirx ferdên civakê digihîne hev û sûdê li berdehamîya wê civakê dike. Bi van rolên xwe yên girîng, nirx di civakê de xwedî erkeke mezin in.

³² Kemal Göz, “*Toplumsal Değerler Bağlamında Yaşama Hürriyeti*”, Pamukkale Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, İstanbul, 2014, r. 89.

³³ Adem Korukcu, “*Değişim Sürecinde Toplumsal Değerlerin Eğitiminde Din Eğitimi*”, Marife Dini Araştırmalar Dergisi, Konya, 2012. r. 117.

³⁴ Sarı, *h.b.*, r. 209.

³⁵ Hüseyin Emin Öztürk, *Batı Çocuk Klasiklerinde Temel Değerler*, Nar Yayınları, İstanbul, 2008. r. 160.

Di jîyana me ya civakî de, him ji bo me bixwe him jî ji bo civakê gelek erkên nirxan yên cihê hene. Ertan Özensel rola nirxan wiha îfade dike: “Nirx, pîvanên herî girîng in ku wateyê didin hêmanên civakê yên sosyal û çandî.”³⁶

Gökçe, erkên nirxan bi vî şiklî bi rêz dike:

- Nirxeke civak-çandî di bingehê de standarta oryantasyona hîlbijêr e. Ango di vê konteksê de nirx, kirîterên giştî yên tevgerên bihişmend û biarmanc in; kirîterên bijartinê yên ji bo armanca şênber a tevgerê ne. Lewma, nirx peywira daxwazên ferdekî yên wek tevgerên civakî tîne qebûl dikin, bi cih tîne.
- Nirx ji alîyê çandê ve tîne çêkirin û di heman demê de bandorekê li ser çandê jî dikin. Lewma nirx bingeha çandê pêk tînin.
- Nirx bi mirovan tîne zanîn û naskirin. Ango di pêvajoya sosyalîzasyonê de nirx ji alîyê kesan ve tîne hînkirin. Bi kurtasî, li binyada şexsîyeta ferdî entegre dibin. Di encama vê de nirx wek perçeyek ji şexsîyeta ferdî tîne dîtin.
- Nirx xwedîyê asteke gotinê ne. Ango nirx him alîyê wê yê zihnî him jî yê hisî-hestiyarî îfade dikin.³⁷

Li jîyaneke ku nirx zêde neyên hesibandin, misoger e ku bi rewşên neyînî re rast bînin. Çimkî nirx ji bo mirovan di meylên bixeter û erdên şemîtok de wek lewheyên nîşaneyê ne, rê nîşanî mirov dikin. Di bingeha civakeke demokratîk de jî nirx hene. Jîyana demokratîk, dê xwe li civakên ku hurmet ji mafên mirovan re tîne dayîn û hurmet ji otorîterêye tîne dayin û piştgirî lê heyî xwe bide xuyakirin. Her wekî din nirx, watedarkirina sedema heyîna ferdî û nirxandina buyerên ku li derdora wî pêk tîne, pîvanan pêşkeş dike.³⁸

Rokeach bi me dide zanîn ku sê fonksiyonên nirxan hene. Ji van a ewil fonksiyona nirxan a sererastkirin û eyarkirinê ye. Rokeach ya diduyan wek

³⁶ Ertan Özensel, “Sosyolojik Bir Olgu Olarak Değer”, Değerler Eğitimi Dergisi, 1(3), 2003, İstanbul, s. 220.

³⁷ Orhan Gökçe, “Türk Gençliğinin Sosyal ve Ahlaki Değerleri”, Selçuk Üniversitesi Ata Dergisi, Konya, 1994, S.6, s. 133.

³⁸ Karababa, *Değerler ve Değerler Psikolojisi*, r. 7.

fonksîyona nirxan a parastina egoyê bi nav dike. A sisêyan û ya dawî jî fonksîyona nirxan a xwe pêkanîne ye.³⁹

Rokeach li ser fonksîyonên nirxan disekine. Li gor wî nirx;

- Ferdan sewq dike ku di mijarên civakî de pozîsyonekê bistînin.
- Bandorê ji aliyê tercîhên ferdan yê polîtîk an jî îdeolojîyên olî de dike.
- Rêbertîya pêşkeşîya ferdî ya bi xwe dike.
- Nirxandin û darizandina ferdî ya xwe û ya kesên din de, pesindayîna xwe û ya kesên din an jî dîtina qisûran de roleke kirîtîk dilîzin.
- Ji ber cihê wê yê navendî, di pêvajoya muqayeseyê de wek pîvanê tê bikaranîn.
- Di bandorkirin û qanehkirina kesên din de tê bikaranîn.⁴⁰

Nirx, kevîrên bingeh ên jîyana civakî û çandê ne. Bi fonksîyonên xwe, di jîyana civakî de roleke gelekî girîng dilîzin. Li civakê piştgirîya civakî pêk tînin. Heke em nirxandineke biçûk li ser fonksîyonên nirxan bikin em dikarin bibêjin ku nirx xwedîyê rolên girîng in, bandorê li tercîhên ferdan dikin û nirxandin û muqayeseya ferdan de wek hêmaneke pîvanê tînin bikaranîn. Nirx xwedîyê wê hêzê ne ku aşîtîya civakî, hezkirin, biratî û piştgirîyê pêk bînin. Dîsa nirx rêbertîyê dikin, rê nîşanî civakê dikin. Parastina jiyanê demokratîk de jî nirx derdikevin pêş. Bi kurtasî em dikarin bibêjin nirx, pisuleyên ku berê me û yê civakê didin rêya kevneşopî û heqîqetê ne.

³⁹ Karababa, *h.b.*, r. 7.

⁴⁰ Bilgin, *Sosyal Psikolojide Yöntem ve Pratik Çalışmalar*, r. 83-84.

2. TÊKILÎYA FOLKLOR Û ROMANÊ

Mirov bi rehetî dikare bibêje ku roman, di nav cureyên edebî ên nivîskî de ya herî populer e. Her çî qas ev cureya edebî nû nû be jî, îro li hemû dinê bûye cureyeke populer. Lukacs, ji bo romanê şibandineke wiha dike: “Bi têkçûna epîkê re bû weledê dewra modern.”⁴¹ Heke em bi îfadeya Henry James jî bêjin; “Roman, di nav hemû cureyên edebî de ya herî serbixwe, esnek û dahîyane ye.”⁴²

Derbarê romanê de her çî qas pênaseyeke hevpar tunebe jî em ê cih bidin çend pênaseyên cuda. Hesen Huseyîn Denîz ji bo romanê van gotinên hanê dibêje: Di romanê de, bûyerên hatibin jiyên an dikarin werin jîyandin bi vegotîneke berfireh a dadikeve hûrgiliyan û taybetmendîyên kesayetên tîne ser zimanê gotin. Roman jî wek çîrokê ye lê cudahîya wê ji çîrokê ew e ku kesayetê hildigre dest, an bûyera hildigre dest ji destpêkê hildigre, bi her alî ve vedike û wiha pêş ve dibe. Nivîskar bûyeran bi jêhatîniya xeyalên xwe dixemilîne û vedibêje.⁴³

Li gorî teorîsyenê navdar ê edebîyatê Mikhail Bakhtin roman ew janr e ku tê de curbicurî û pirqatîya dengên cuda di romanê de wateyeke nû bi dest dixin û hevdu ronî dikin, riwangeh û cîhanbîniyên cihêreng, bi awayekî hunerî bi hev re dikevin dîyalogê. Li gora wî roman tekane janr e ku hîna geşedana wê berdewam e, wek janrên din hişk nebûye skeletê wê, kanona wê tune. Baxtîn difikire ku roman di karîgeriya ken û pirzîmaniyê de pêk hatiye û di her serdemê de di nav janrên din de roleke muxalîf geriyaye.⁴⁴ Bi awireke giştî, li gorî Bakhtin roman, li ser curbecuriya gotinên civakî û ya dengên şexsî, sazîkirîneke hunerî ye. Roman bi riya gotina civakî ya curbecur û bi ya dengên tekane hemû tema, mijar û fikrên xwe orkestra dike.⁴⁵

Haşim Ahmedzade ji bo romanê wiha dibêje: “Roman wek cureyekî edebî ku girêdayî serdema modernîzmê ye û bi hest û xulyayên mirovê modern re tevdigere, bi hûrgilî diçe nav dinyaya karakteran û derûdora wan cih û wextan.”⁴⁶

⁴¹ Remezan Alan, *Folklor û Roman*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2013, r. 53.

⁴² Haşim Ahmedzade, *Ulus ve Roman*, Pêrî Yayınları, İstanbul, 2004, r. 27.

⁴³ Hesen Huseyîn Denîz, *Rênîşanêra Vegotîna Kurdî*, Weşanên Do, Stenbol, 2008, r. 342.

⁴⁴ Umran Aran, *Roman û Gotar*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2019, r. 12.

⁴⁵ Remezan Alan, *Bendname*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2009, r. 64.

⁴⁶ Haşim Ahmedzade, *“Roman û Dîyalog”*, Kovara Wêje û Rexne, Stenbol, hej.2, 2014, r. 108.

Wekî ku tê zanîn roman, cureyekî Rojavayî ye. Bi temasên çandî, pratîkên wergerî û di qata dewletê de bi daxwazên ewrûpîbûnê re derbasî Rojhilatê bûye.⁴⁷ Li edebîyata cîhanê, yekem berhema ku wek roman tê qebûlkirin *Don Kîşota* nivîskarê Spenî Miguel de Cervantes e. Ev roman di sedsala 17emîn, di sala 1605an de çap bûye. Di edebîyata Ingilîzî de yekem roman *Robinson Crusoe* ye ku ev roman di sala 1719an çap bûye û ji aliyê Daniel Defoe ve hatiye nivîsandin. Di edebîyata Tirkî de jî yekem romana ku bi şêweya rojavayî hatiyê nivîsandin *Taaşukû Talat û Fitnat* e. Nivîskarê vê romanê Şemsetîn Samî ye û di sala 1875an çapa wê ya yekem derketiye.

Dema dîroka romana Rojavayî, ji derketina wê ya di destpêka sedsala 17. heta dawîya sedsala 19an, bi gelemperî wek “realîzmê” tê qebûlkirin, romanên kurdî yê ewil xisûsî romanên sosyalîst realîst in. Sedema vê, ji ya wêjeyî wêdetir e. Bi gotineke din, derketina romana kurdî, wek romana Rojavayî rasterast ne encama guherîna civakî û epîstemolojîk ên hundirîn bûn.⁴⁸

Wekî tê zanîn yekemîn romana kurdî Şivanê Kurmanca, di sala 1935an de ji aliyê Erebe Şemo ve, li Erîwanê hatiye çapkirin.⁴⁹ Li gorî Îbrahîm Seydo Aydoğan, romana kurdî ya pexşanî, weke romana zimanên rojhilatî yê din, teqlîdeke romana ewropî ye.⁵⁰ Romanên kurdî yê ewil ji ber ku li Erîwan û Sovyetê çap bûne, tesîra îdolojîyên wek sosyalîzm û komunîzmê di van berhemana de bi awayekî eşkere xwe didin der. Ango em dikarin bibêjin ku romanên ku li Sovyetê hatine nivîsandin romanên îdeolojîk in. Nivîskarên kurd ên din yê ji Yekîtiya Sovyetan, wek Eliyê Evdîrehman, Heciyê Cindî, Sehîdê Îbo û Egîdê Xudo jî romanên xwe li Erîwanê çap kirine. Babetên serekî yê van romanana evîn, kevneşopiyên kurdan, axa û şêxên feodal û xwedîhez, tevgerên civakî yê dîrokî û kedxwarîya gel û belavkirina fikrên sosyalîst û wekhevîya di nav kurdan de ne. Di nav romanana de bi beramberkirina

⁴⁷ Remezan Alan, *Keşkûl*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2019, r. 11.

⁴⁸ Haşim Ahmedzade, *Romana Kurdî û Nasname*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2011, r. 18.

⁴⁹ Helîm Yûsiv, *Romana Kurdî*, Weşanên Ronahî, Amed, 2011, r. 11.

⁵⁰ Îbrahîm Seydo Aydoğan, *Guman2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, Weşanxaneya Rûpelê, Stenbol, 2014, r. 110.

şertên jîyanê yê berî û piştî damezrandina sosyalîzmê armanc dikin îspat bikin ku sosyalîzm ji kapîtalîzmê baştir e.⁵¹

Piştî ku yekem romana kurdî di sala 1935an çap bû û pey re çend romanên din jî derketin, kete qonaxeke bêdengîyê. Di salên 1940î de û her wiha di salên 1970î de tu romanên kurmançî nehatine çapkirin. Heta sala 1980ê, ji bilî Erebe Şemo, Eliyê Evdirehman, Miroyê Esed, Heciyê Cindî û Seîdê Îbo romannivîsên kurmançîxêv derneketine. Hingê, heta sala 1980ê hejmara romannivîsan 5 û ya romanên kurdî jî 12 bû. Ji salên dawîya 1990an vir ve, romana kurdî di guherînek radîkal re derbas dibe. Him hejmara romanên gelek zêde dibe -romanên ku heta niha hatine nivîsandin zêdeyî 250yî ne- him jî di şêwe û naveroka romana kurdî de guherîneke radîkal pêk tê.⁵²

Roman li gorî kategorîyên cihê ên wek tema, terz, mijar û hwd. dikarin bîne senifandin. Ango roman dikarin pala xwe bidin gelek cureyên ji hev cihê û bi van cureyan bîne nivîsandin. Roman dikarin pala xwe bidin tarîxê, dikarin pala xwe bidin psîkolojî û civakê, dikarin pala xwe bidin folklor û serencê (macera) û hwd. Heke bi giştî em li cureyên romanên binerin, em ê bibînin ku gelek cureyên wê hene. Em dikarin navê çend heban li vir rêz bikin: Romanên serencê, romanên polîsiyê, romanên tarîxî, romanên otobîyografîk, romanên polîtîk, romanên realîst, romanên civakî, romanên geştîyê, romanên evîne, romanên perwerdehîyê, romanên gundan, romanên utopîk û hwd.⁵³

Di edebîyata kurdî de hin cureyên edebî hene ku pala xwe didin folklorê. Ji folklorê qest, ew berhem in ku îlhama xwe ji destan, çîrokên gelêrî û efsaneyan digirin. Din nav van cureyên edebî de roman jî heye. Di edebîyata kurdî de hin roman piştî xwe didin zargotin û folklorê. Yekem romana kurdî ya folklorîk Dimdim e ku ji aliyê Erebe Şemo ve, di sala 1965an de hatiye nivîsandin.⁵⁴

⁵¹ Ahmedzade, *Romana Kurdî û Nasname*, r. 20.

⁵² Îbrahîm Seydo Aydogan, "75 Sal û 200 Romanên Kurdî", <http://www.kurdigeh.com/authors.aspx?an=43&aid=31>, 15 Adar 2019.

⁵³ Denîz, *Rênîşanêra Vegotina Kurdî*, r. 343.

⁵⁴ Alan, *Keşkûl*, r. 48.

Li gorî Qanatê Kurdo edebîyat û zargotina kurdî bi hev re girêdayî ye û têkilîyeke xurt di navbera wan de heye. Kurdo, ku bi awayekî berfireh li ser vê meselê hûr bûye û wiha dibêje: Eşkere ye, ku edebîyat û zargotina her miletî bi hev ra girêdaye, hevbendîya wan bi hev re heye. Zanyarên kurd û kurdnas di xebatên xwe de dinivîsin ku di tarîxa peydabûn û pêşveçûna edebîyata kurdî da zargotina cimaetê (çîrok, hekyatên tarîxî, serhatî û serpêhatîya merivan, beyt, kilam) kanîya edebîyata kurdî bûye. Mesele Aladîn Secadî, Gîwî Mukriyanî, Marûf Xeznedar di nivîsarêd xwe da nivîsîne ku zargotina kurdî berepêşîn kanîya peydabûn û pêşveçûna edebîyata kurd bûye. Kurdnasa Sovêtîstanê M.B. Rûdênko di kitêbên xwe da meselan tîne ber çavên xwendevanan, ku Ahmedê Xanî “Mem û Zîn”a xwe ji “Mem û Zîn”a zargotin, ji “Memê Alan”ê zargotin wergirtiye, nivîsîye, ku Xaris Bitlisî “Leyl û Mecnûna” xwe ji “Leyl û Mecnûna” zargotin wergirtiye, ku Feqê Teyran beyta xwe “Şêxê Sedan”a xwe ji beyta zargotina “Şêrê Sisebanê” yan jî ji beyta “Doda Gurca” wergirtiye.⁵⁵ Her wekî tê zanîn, di van salên dawî de li ser *Evdalê Zeynikê, Siyabend û Xecê, Kerr û Kulik, Kela Dimdimê* û hwd. berhemên edebî yên modern hatine afirandin ku gelek ji van berhemên bûne mijara vê xebatê jî.

Wek ku Qanatê Kurdo jî li jor îzeh dike, hin berhemên ku wek klasîk tên qebûl kirin, piştî xwe dane zargotina kurdî. Ango di nivîsandina van berhemên de zargotin bûye îlham. Ev tişt îro di nivîsandina romanên modern de jî didome ku gelek nivîskarên romanên piştî xwe didin folklor û zargotina kurdî û îlhama nivîsandinê ji wê werdigirin. Qanatê Kurdo,⁵⁶ ji bo vê mijarê wiha didomîne: Ew nîşan dîkin ku, arîkarîya hostatîya nivîskar, şayîr û çîroknivîs gelek beyt, serhatiyên dildaran, çîrok û hekyatên tarîxî bûne beyt (destan), serhatî û çîrokên nivîsandî, bûne şaxên edebîyatê. Mesele bi arîkarîya aqil û ferasetî û hostetîya Ehmedê Xanî *Mem û Zînê* û “Memê Alan”a zargotinî bûne şaxê nivîsandiye edebîyatê. Bi arîkarîya nivîsara Erebe Şemo beyta “Dimdimê” (Xanê Çengzêrîn) bûye romana nivîsandî, bi arîkarîya Semendê Siyabendov şaxê serhatîya “Xec û Siyabend” bûye poema nivîsandî. Ev şaxên nivîsandî bi tertiba xwe va, li gelek ciya guhastîne, ne mîna şaxên zargotinê ne. Lê naveroka wan, nêr û meremê wan, navê qehremanên wan kêr

⁵⁵ Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebyata Kurdî*, Özge Yayınları, Ankara, 1992, r. 21.

⁵⁶ *H.b.*, r. 22.

û zêde mîna hev in. Ev yek jî dîsan nîşan dike ku edebîyat û zargotina kurdî bi hev ra girêdayîne, ku hevbendîya wan bi hev ra heye.

Heciyê Cindî jî wek Kurdo dibêje edebîyata devkî ji nivîsê re bûye bingeh û wiha dom dike: Ev edebîyata devkî ya dewlemend, bêguman, ji bo edebîyata nivîskî û pexşana kurdî jî bingeh û hîmê esasî ye. Edebîyata nivîskî li ser vî hîmî ava bûye û şax daye. Çaxa edebîyata kurdî, hêdî hêdî, kiras guherî û ket qalibê nivîskî, berî her tiştî, hingê klasîkên folklorê kurdî, mîna Memê Alan, Siyamend û Xecê, Dimdim, Zembîlfiroş, Binevşa Narîn û Cembeliyê Hekarê, qulipîn ser kaxizan û hatin nivîsîn. Ev, nimûneyên pêşîn ên edebîyata nivîskî û pexşanê ne.⁵⁷

Pêwendîya xurt a folklor û edebîyatê tenê ne di edebîyata kurdî de heye. Li edebîyata cîhanê jî em vê pêwendiyê li gelek deveran dibînin. Yıldırım, wiha dibêje: Di vê mijarê de li Tirkîyê berhemên romannivîsan ên wekî Yaşar Kemal û Fakir Baykurt du mînakên sereke ne. Di vê çarçoveyê de mirov dikare berhemên Murathan Mungan jî wekî mînak nîşan bide. Ji edebîyata biyanî, romannivîsê mezin ê rûsî Pûşkîn, şanonivîs û romannivîsê fransî Marcel Pagnol mînakên balkêş in. Yanî edebîyat timî xwe ji berhemên folklorê xwedî dike.⁵⁸

Ayşe Çamkaran dibêje ku di edebîyata tirkî de jî endamên ekola “Beş Hececiler”, ku îlhama xwe ji helbesta gelêrî ya tirkî digirt, di dewra Mutarekeya Millî û Komarê de bi vegotîna romantîk a neteweyî helbest nivîsîn. Di nezera wan de helbestên wan, cewhera çanda neteweyî, yanî wek rêgezên çanda neteweyî “zimanê gel”, “wezna gel” û “cografyaya gel” (Anadolu) dihewand.⁵⁹

Di vê xebatê de, me jî pala xwe da hin romanên folklorîk ên kurmançî ku ev roman îlhama xwe ji destan, çîrokên gelêrî û efsaneyan digirin û mijarên sereke yên van romanên li ser destan û çîrokên gelêrî yên berê ne. Hejmara wan tam neyê zanîn jî bi kurdîya kurmançî gelek romanên folklorîk hatine nivîsandin. Xebata me ji van romanên yanzdeh liban esas digire û di wan de nixê civakî peyde dike. Yanzdeh romanên ku me ji bo xebata xwe dîyar kirine ev in: *Bilîcan* (Perwîz Cîhanî), *Dimdim*

⁵⁷ Mehmed Uzun, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, İthaki Yayınları, İstanbul, 2010, r. 38.

⁵⁸ Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev - Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2013, r. 39.

⁵⁹ Alan, *Keşkûl*, r. 47.

(Erebê Şemo), *Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan* (Îhsan Colemêrgî), *Dewrêşê Evdî* (Eyup Kiran), *Evîna Mêrxasekî* (Îbrahîm Osman), *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* (Mehmed Uzun), *Ristemê Zal* (Edîp Polat), *Evîna Pinhan* (Sabrî Akbel), *Mem û Zîn* (Ronî War), *Tehar û Zeharê* (Ronî War) û *Siyabend û Xecê* (Ronî War).

Weku encamê em dikarin bibêjin ku pêwendîyeke gelekî xurt bi edebîyat û folklorê re heye. Folklor her çî qas kevin be jî hê jî edebiyatê av dide û fêkîyên wê di cureyên edebî yên nûjen de derdikeve. Destan, çîrokên gelêrî û efsaneyên miletekî dibin bingeh û çavkanîya berhemekê û bi destê nivîskarî vediguhezîna forma romana nûjen. Heke em bi gotina Alan bibêjin rewş ev e: “Şewqa ku ji zargotina kurdî dipengize (hafîzeyê kolektîf, nasnameya netewî, çandekê qedîm û hwd.) li ser rûyê esmanekî din (dema derbasî forma romanê dibe) dibe stêrkeke xuricî.”⁶⁰

3. TÊKILÎYA FOLKLORÊ Û NIRXAN

Bi Serdema Neoletîkê re, mirov derbasî jîyana dêmanî bûn û ji bo wan qonaxekê nû destpê kir. Bi vê serdema nû re gund hatin afirandin û jîyana mirovan a hevpar destpê kir. Jîyana dêmanî û jîyana bi hev re, bi xwe re rêzikên civakî jî anîn. Bi saya van rêzikên civakî yên ewil, pergala civakî xira nebû û berdewam bû. Piştî ku her qewmek li deverêke dinê belav bû û bû niştecîhê wê deverê di heman demê de bû xwedîyê çandekê xweser jî. Ango qewimên ji hev cihê, bi xwe re çandên xweser û ji hev cihê jî anîn. Bi demê re ev qewim bûn xwedîyê edebîyatekê.

Her mirov di nav civakekê de tê ser dinê û dest bi jîyanê dike. Di vê civakê de bi jîyana hevpar re, mirov fêrî rêzik û qaîdeyên civakî dibe. Fêrî çanda wê civakê, nirxên wê civakê û urf û edetên wê civakê dibe. Ji rabûn û rûniştinê bigire, heta şêklê silavdayînê jî li gorî civaka ku lê hatî dinê şikil distîne. Mirov li kîjan civakê were dinê, li gorî rêzikên wê yên civakî adapte dibe. Ewil mirov li civakekê tê ser dinê, paşê fêrî rêzikên wê civakê dibe, paşê van rêzikan nîşanî zaroyên xwe dide, zaroyên wî/wê jî nîşanî zaroyên xwe... Ev çerx her û her bi vî awayî dom dike. Bi vî awayî neslên nû fêrî çandê, nirxên civakî û urf û edetên civakê dibin.

⁶⁰ Alan, *Folklor û Roman*, r. 84.

Her civak bi rêya perwerdehîyê van rêzik û qaîdeyên civakî, urf û edetan û nirxan vediguhêzînin ji neslên sibe re. Veguhêzîna nirxan ji neslên sibe re, bi rêya ziman û edebîyatê pêk tê. Nirxên ku di civakekê de dijîn, bi rêya zimanê wê civakê û bi berhemên ku bi wî zimanî derketine holê, ji neslên sibe re vediguhezînin.

Arnold van Gennep folklorê wiha pêname dike: Folklor ew zanist e ku çanda maddî û manewî ya gelêrî li gorî rêbazên xwe yê taybet lêdikole, berhev dike, disenifîne, tehlîl dike û dinirxîne. Folklor ji du bêjeyên îngilîzî pêk tê: “folk” gel û “lore” zanist an jî lêkolîn.⁶¹ Peyva folklorê yekem car di sala 1846an de, ji aliyê William John Thoms ve hatiye bikaranîn.⁶²

Bi kurdî peyva folklorê tê wateya zanista gelêrî an jî lêkolîna li ser gel. Di diyalektên kurdî de ji bo zanista folklorê peyvên weku “zargotin”, “zanista gel”, “gelnasî”, “xelknasî” û “zanistiya şarî” tê gotin.⁶³ Li gorî Celadet Bedirxan bêjeya folklorê di eslê xwe de îngilîzî ye. Folklor tevayîya adet, çîrok û stranên miletekî ye. Ew adet, çîrok û stranên ko ji nav xelkê bi der ketine û di dora nifşan de bi ser ve ketine û gihaştine nifşên nû. Ji xwe bêjeya folklorê bêjeke bihevketî ye û bi mana “zanîn an zanistîya xelkê ye.”⁶⁴

Etnograf û folklornasê Kanadî Charles Marius Barbeau derbarê folklorê de weha dibêje; Her wexta ku lorîyek ji zarokê re hat gotin; her wexta ku straneke kurt, tiştanokek, lêzgotinokek, zûgotinokek ji bo hîlbijartinê çî di pêşdibistanê an jî di dibistanê de hat gotin; her wexta ku gotinên pêşîyan, fabl, çîrok, bîranînên li ber êgir careke din hatin gotin; her wexta ku bi awayekî hînbûniya xwezayî bi stran, dans û şahiyekê mihîrcanek hate lidarxistin; her wexta ku dê dirunê, neqşê, çêkirina xwarinekê nîşanî qîza xwe dike; her wexta ku cotkarek bi şeweya dê û bavan kurê xwe perwerde dike bê dê rewşa hewayê li gorî tevgera heyvê û bayê çawa bixwîne ji bo çandin û zadrakirinê; her wexta ku hostayek- hesinkar, xerat, sifirker hwd. -şagirtê xwe dielimîne; her wexta ku zanîn, ezmûn (tecrube), şîyan (pêkarî), adet û pratîkên

⁶¹ Yıldırım&Pertev-Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, r. 11.

⁶² Richard M. Dorson, *Folklor û Teoriyên Folklorê Yê Îroyîn*, (Wer: Necat Keskin), Weşanên Avesta, Stenbol, 2017, r. 21.

⁶³ Ramazan Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2018, r. 27.

⁶⁴ Celadet Bedirxan, *Hawar*, j. 30, Weşanên Belkî, Stenbol, 2012. r. 514.

berê bi rêya mînak û gotinan ji hêla nîfşên pîr bo nîfşên nû bêyî pirtûk, çap an jî mamosteyên dibistanan hatin veguhastin; wî çaxî em behsa folklorê dikin.⁶⁵

Sadiq Bahaeddîn Amêdî ku yek ji pisporê folklorê kurdî ye, derbarê folklorê de wiha dibêje: Folklor, bi rastî şehrîstanîya mîletî ye. “Folklor wekî xwe bînkê ye, jîna berçava mîletê tê da ber rûyî diket, her wekî şanoyekî ye awayê jînê mîletî ji hemî aliyan li ber çavan dadinît; yan jî wekî nivîşteka xumalî ye, hemî zanistêd millî tê da têne xwendin, ku jê tête hizirkirin, ji giriftarî û sixintiya, ji hestkirina sipehyatî, keleş û rindiyê; digel têgehiştina raman û bejna hunerî û torî û hozanê û dilxweşiya musîqayê û govend û dîlan û semayê hwd.⁶⁶

Li gorî Erman Artun, folklor, ji zayînê heya mirinê, hemî hêmanên çanda maddî-manewî yên di jîyana mirovan de, bi awayekî zanistî berhev dike, li ser wan lêkolînan dike, wan dinirxîne, şîrove dike û bi vî rengî serencama pêşketina çanda gel nîşan dide û di navbera vê çandê û yên din de cudayî û hevbeşiyên dibîne.⁶⁷

Li jor me cih da çend pênaseyên folklorê yên ji hev cihê. Di van pênaseyan de noqteya hevpar ev e ku folklor lêkolîna li ser jîyana gel e. Wek her neteweyên li ser rûyê dinê kurd jî xwedîyê çand û folkloreke xweser û taybet in. Di edebîyata kurdî de hêmanên edebîyata devkî gelekî cih girtine û ev hêmanên devkî, ji edebîyata nivîskî re bûne çavkanî û bingeh.

Edebîyat eyneya civakê ye. Di wê eynê de mirov çanda wê civakê, orf û edet û folklorê wê civakê dibîne. Dema em li edebîyata kurdî jî dinerin, dibînin ku ev hêmanên folklorîk him di edebîyata devkî û him ya nivîskî de bi awayekî eşkere xwe didin der. Têkilîyeke xurt di navbera folklor û edebîyatê de heye. Li gorî Vladimir Propp, folklor malzaroka edebîyatê ye, wate edebîyatê li ser binemaya folklorê hildaye. Ew dibêje, folklor, edebîyata berî dîrokê ye.⁶⁸ Di berhemên devkî yên wek destan, efsane, çîrokên gelêrî û hwd. û di berhemên nivîskî yên wek romanên folklorîk, destan, çîrokan de mirov derbarê folklorê civakê de kêr zêde dikare tiştinan jê bibîne. Mînak, di destaneke folklorîk de mirov derbarê çanda wê civakê de

⁶⁵ Necat Keskin, *Folklor û Edebiyata Gelêrî*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2019, r. 49-50.

⁶⁶ Sadiq Bahaeddîn Amêdî, *Folklorê Kurdî*, Weşanên Lîsê, Ankara, 2013, r. 11.

⁶⁷ Erman Artun, *Türk Halkbilimi*, Kitabevî Yayınları, İstanbul, 2010, r. 16.

⁶⁸ Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, r. 32-33.

dikare gelek tiştan bibîne: Edetên wan, xwarinên wan, cil û bergên wan, rabûn û rûniştinên wan, şiklê silavdayîna wan û hwd.

Mehmed Uzun jî balê dikişîne li ser têkilîya folklorê kurdî û edebîyata wê: “Ji her netewe û gelî bêtirî kurdan bawerî bi gotina devkî anîye û bi edebîyata devkî û folklorê girêdayî mane. Her lêger û xebata ku dê li ser edebîyata kurdî çêbe, divê xwe bigihîne edebîyata devkî û lê hûr be.”⁶⁹

Li gorî Marif Xeznedar, edebîyata nenivîskî, çavkanîya sereke ye bo edebîyata nivîskî. Gelek berhemên mezin û girîng ên edebîyata nenivîskî, piştî bûn berhemên edebîyata nivîskî. Bo nimûne Ehmedê Xanî ji bo Mem û Zîna xwe îlham ji “Memê Alan”a folklorî wergirtîye.⁷⁰ Dîsa Xeznedar dibêje ku çavkanîya yekem û sereke ya edebîyata kurdî, folklorê kurdî ye.⁷¹

Weku encamê em dikarin bibêjin ku di çanda her neteweyê de folklor heye û edebîyata devkî ji nivîsê re bûye çavkanî û îlham. Çi berhemên folklorîk ên devkî bin û çî yê nivîskî bin di van berhemên de hemanên folklorîk û nixê civakî xwe didin der û bi saya van hemanên folklorîk û nixê civakî mirov dikare di derbarê jîyana civakê de şîrove û analîzên sosyolojîk bike û di derbarê wê civakê de bibe xwedîyê gelek fikir û ramanan.

⁶⁹ Mehmed Uzun, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Weşanên Beybûn, Ankara, 1992, r. 30.

⁷⁰ Pertev, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, r. 36.

⁷¹ Yıldırım&Pertev-Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, r. 39.

BEŞA DUYEM

NIRXÊN CIVAKÎ DI YANZDEH ROMANÊN KURMANCÎ DE

2.1. AŞITÎ

Aşitî, lihevhatin ango sulh yek ji nirxên civakî û gerdûnî ye. Tarhan, aşitîyê him wek hestekî him jî wek nirxekî dibîne.⁷² Di jîyana civakî de roleke girîng a vê nirxê heye. Vê nirxê di gelek berhemên devkî û yê nivîskî de cih girtine. Di romanên kurmançî yê folklorîk de jî ev nirx, di hin cihan de hatiye bikaranîn. Her çî qas ev nirx, di romanên kurmançî yê folklorîk de li gorî nirxên din ên civakî kêr hatibin bikaranîn jî em ê nirxên aşitîyê yê ku hatine tespîtkirin li jê rêz bikin.

Di romana Ristemê Zal a Edîp Polat de, di hevokê kurt de ev nirx bi vî şiklî hatiye bikaranîn:

“... Em dixwazin li ser edalet û hişmendiya Ferîdûn li hev werin.”⁷³

Di vê mînakê de nirxa aşitîyê bi awayekî rasterast hatiye bikaranîn û di vê mînakê de, du nirxên cihê, nirxa aşitîyê û edaletê, bi hev re hatine bikaranîn.

Eyup Kiran di romana xwe ya bi navê Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizek û Rim de, li du cihên jî hev cihê ev nirx bi vî awayî bikaranîye:

“... Aştî ji bo her du seriyên jî tiştekî pêwîst e, muhîm e û rind e. Tiştekî mirovatîyê ye, meriv ji hev çî qas mêr bikuje jî dawîya dawiyê gerek mirov li hev were.”⁷⁴

Di vê mînakê de jî nirxa aşitîyê rasterast hatiye bikaranîn. Nirxa aşitîyê di vê mînakê de ji alîyê nivîskarî ve hinekî hatiye şîrovekirin. Rola vê nirxê û girîngîya wê di vê mînakê de, bi awayekî eşkere derdikeve pêşîya me.

“... Dewrêş got: Hûn ê bibêjin, em aliyê aşitîyê ne, sulhê ne.”⁷⁵

⁷² Nevzat Tarhan, *Değerler Psikolojisi ve İnsan*, Timaş Yayınları, İstanbul, 2016, r. 191.

⁷³ Edîp Polat, *Ristemê Zal*, Evrensel Basım Yayın, Stenbol, 2007, r. 127.

⁷⁴ Eyup Kiran, *Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizek û Rim*, Weşanxaneyê Nûbihar, Stenbol, 2011, r. 251.

⁷⁵ *H.b.*, r. 252.

Di romana Evîna Mêrxasekî ya Îbrahîm Osman de jî ev nirx hatiye bikaranîn û bi vî şiklî ye:

*“... Em şer û pevçûnan naxwazin, heta ji me tê, em xwe ji bela û bobelatan bi dûr dixin, diparêzin. Em miletê oleke aşîxwaz in.”*⁷⁶

Bi qasî tespîtên me, ji bilî van her çar nirxên ku me li jor rêz kirî, di romanên kurmancî yê folklorîk de wekî din tu nirxên aşitîyê nehatine tespîtîkirin. Dema me ev nirx bi nirxên din re muqayese kir, me dît ku ev nirx li gorî yê din kêr hatiye bikaranîn.

2.2. BAWERÎ

Yek ji nirxên civakî yê ku me di romanên kurmancî yê folklorîk de tespît kiriye, bawerî ye. Taybetiyeke vê nirxê ew e ku ev nirx di du wateyan ji hev cihê de hatiye bikaranîn. Nirxa bawerîyê, di wateya ewil de wek *“ewlebûn û pêbawerbûn”*ê hatiye bikaranîn ku li hember mirovan tê gotin. Di wateya diduyê de jî wek *“bawerîanîn û îman”*ê hatiye bikaranîn. Em ê di her du wateyan de vê nirxê li jêr rêz bikin.

Îhsan Colemêrgî di romana xwe ya bi navê Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de, li du deran cih daye vê nirxê:

*“... Bawerîya te ji lawîniya te zêdetir e.”*⁷⁷

*“... Xîret û bawerî tu tişt nîn e ku nekit. Tiştên xweş yê xîretkêşan û xwedî bawerîyan in.”*⁷⁸

Di kitêba Tehar û Ziharê ya Ronî War de jî li çend deveran, vê nirxê di her du wateyan de cih girtiye:

*“... Bawerî hebe, hêvî jî heye, divê em hêviya xwe jê nebirin û em li dermanê xwe bigerin heta ku em lê rast bîn.”*⁷⁹

⁷⁶ Îbrahîm Osman, *Evîna Mêrxasekî*, Weşanên Lîs, Stenbol, 2008, r. 25.

⁷⁷ Îhsan Colemêrgî, *Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2013, r. 44.

⁷⁸ *H.b.*, r. 46.

“... *Ez jê bawer im û tu jî dikarî baweriya xwe pê bînî.*”⁸⁰

“... *Hew li texmînan difikirî û hêviya xwe ji Xwedayê alemê qut nedikir.*”⁸¹

Di romana Evîna Mêrxasekî ya Îbrahîm Osman de ev nirx di wateya bawerîanîn û îmanê de hatiye bikaranîn:

“... *Bi tenê baweriya xwe ji Xwedayê xwe qut mekin! Ya Xwedê kirî betal nabe. Xwedê heye xem tune ye.*”⁸²

2.3. COMERDÎ

Ji kesên ku destvekirî û mal û pereyên xwe bi derdora xwe re parve dikin re comerd tê gotin. Comerdî jî navê tevgerê ye. Comerdî, dibe wesîleya pêşvebirina têkilîyên sosyal ên mirovan.⁸³ Em vê nirxê di gelek çîrok û destanên devkî de dibînin. Di romanên me yê folklorîk de jî vê nirxa civakî gelekî cih girtiye. Em ê li jêr nirxên comerdîyê yê ku me di romanên xwe yê kurmancî de tesbît kirine rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan a Îhsan Colemêrgî de comerdî li çend cihan hatiye bikaranîn:

“... *Bo mirina Derwêş Axa jî Şêx Xelef sed siwaran ve hatin mêvandarî û serxweşiya me. Niha jî xelat û diyariyên wan li ba me veşartîne.*”⁸⁴

Di vê mînakê de nirxa comerdîyê rasterast nehatiye bikaranîn lê em ji hevokê pê derdixin ku Şêx Xelef bi van tevgerên xwe kesekî comerd e û nivîskar jî balê dikişîne vê taybetmendîya wî.

“... *Dema lê dibûne mêvan ser heqşeviyê de xelat û bexşîş jî didane wî.*”⁸⁵

“... *Heqê xwarina hemî rêwiyan wî da û zêrekî Osmanî jî bexşîş da xancî.*”⁸⁶

⁷⁹ Ronî War, *Tehar û Ziharê*, Weşanên Ava, Ankara, 2014, r. 13.

⁸⁰ *H.b.*, r. 52.

⁸¹ *H.b.*, r. 114.

⁸² Osman, *h.b.*, r. 19.

⁸³ Tarhan, *h.b.*, r. 164.

⁸⁴ Colemêrgî, *h.b.*, r. 13.

⁸⁵ *H.b.*, r. 138.

“... *Xancî xwarin li ber rakir. Zêrek dî da destê wî.*”⁸⁷

“... *Di dergehê Mêrdînê de zêrek da destê dergehvanî.*”⁸⁸

Di van her çar mînakên jorîn de jî nirxa comerdîyê rasterast nehatiye dayîn lê ji tevgerên wan, mirov pê derdixe ku comerdîyê dikin.

Mehmed Uzun jî di romana xwe ya bi navê Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê de bi vî şiklî cih daye vê nirxê:

“... *Bila çar tişt ji we kêm nebin: jirî û ciwanmerdî, comerdî û xêrxwazî.*”⁸⁹

Di vê mînakê de nirxa comerdîyê rasterast hatiye dayîn û bi awayekî şîretkî balê dikişîne ser xwe. Di vê mînakê de çar nirxên ji hev cihê, jîrî, ciwanmerdî, comerdî û xêrxwazî, bi hev re hatine bikaranîn.

“... *Xwarin û vexwarina mala Evdal her li ser wî bû.*”⁹⁰

“... *Tu bizanibî ku ez dixwazim malê dinê, milkê Kurdistanê li ber lingê te birijîname.*”⁹¹

“... *Û axa, beg û mezinên kurdan bi mesref, xwarin û vexwarina şagirtan rabûn.*”⁹²

“... *Zarşêrînê, xweşbêjê, tu xweş dibêjî. Dilê me pak, sifra me comerd, risqê me fireh, nefsa me biçûk, mala me mezin e.*”⁹³

Di romana Tehar û Ziharê ya Ronî War de jî li çend cihên ji hev cihê nirxa comerdîyê hatiye bikaranîn:

“... *Tu çî dixwazî bixwaze. Ez ji te re hazir im. Çî hewce dike ew ê were cih.*”⁹⁴

⁸⁶ *H.b.* , r. 139.

⁸⁷ *H.b.* , r. 141.

⁸⁸ *H.b.* , r. 144.

⁸⁹ Mehmed Uzun, *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, Weşanên Îthakî, Stenbol, 2015, r. 56.

⁹⁰ *H.b.* , r. 74.

⁹¹ *H.b.* , r. 74.

⁹² *H.b.* , r. 81.

⁹³ *H.b.* , r. 99.

⁹⁴ War, *Tehar û Ziharê*, r. 26.

“... Destê xwe li bêrika hûçikê xwe xist. Sed û pêncî zêr ji bêrika xwe derxist û da destê rêwî û got: Ha ji te re, here ji xwe re pê hespekî qenc bikire û karê xwe pê bike!”⁹⁵

“... Tu çî dixwazî ji min bixwaze!”⁹⁶

Em nirxa ku di vê mînakê de derbas dibe, di gelek berhemên rojhilata navîn de bi heman formatê de dibînin. Mînak, di çîroka Lempeya Efsûnî ya Eledîn de jî ev hevok li gelek deveran bi heman formatê derbas dibe.⁹⁷ Gelek caran kesê/a comerd ji bo qencî û comerdîya xwe nîşan bide, ji yê/ya pêşberî xwe re heman hevoka li jor vedibêje.

“... Xelatek mezin seba mizgîna nameya Ziharê da xwediyê qantirê û hîna nuh hişt ku xwediyê qantirê ji cem wî veqete.”⁹⁸

“... Mizgîna te ya xêrê be! Ez ê te ji bo vê mizgînê xelat bikim!”⁹⁹

Erebê Şemo di romana xwe ya bi navê Dimdim de -ku ev roman yekem romana kurdî ya folklorîk tê hesibandin- bi vî awayî cih daye vê nîrxê:

“... Kî dihat li dîwanxaneya Xano rûdinişt, kêf dikir. Qehwe, xwarin, fîncanên şerbetê, pilaw, qelîya sêlê, kivav û fêkî tijî li ser texte bû.”¹⁰⁰

“... Ez ne Şah Ebas im, ez merivekî wisa bê însaf nîn im, ji min re kelê çê bike, ez ê te mîna ronîya çavê xwe xweyî bikim û heqekî rind jî bidime te.”¹⁰¹

“... Timî dema ku meclîsa Xano dicivîya, wê çaxê li dîwanxaneyê bo hurmetê nanê meclîsê didan.”¹⁰²

⁹⁵ H.b. , r. 62.

⁹⁶ H.b. , r. 68.

⁹⁷ Gülümser Akharman, *Lempeya Efsûnî ya Eledîn*, (Wer. : Ümran Altinkılıç, Burhan Tek) Weşanên Zîbeqê, Mêrdîn, 2012, r. 8.

⁹⁸ H.b. , r. 68.

⁹⁹ H.b. , r. 118.

¹⁰⁰ Erebe Şemo, *Dimdim*, Weşanên Lîsê, Diyarbekir, 2016, r. 45.

¹⁰¹ H.b. , r. 123.

¹⁰² H.b. , r. 169.

Di romana Mem û Zîn a Ronî War de nirxên comerdîyê bi vî awayî hatine dayîn:

“... Heger kî vî heywanî ji min re terbiye bike, ez ê çavên wî ji pera û malê dinyayê têr bikim!”¹⁰³

“... Ji van seracên hêja re devê xezîneyan vekin, bi awayekî baş wan xelat bikin.”¹⁰⁴

“... Kî bi rêya bajarê Cizîra Botan zanibe ez ê çavên wî bi zêran têr bikim!”¹⁰⁵

“... Minê jî wê gavê bi dilekî xweş, destê xwe biavêta bêrika xwe û tu xelat bikira!”¹⁰⁶

Di nav romanên kurmancî yê folklorîk de nirxên comerdîyê herî zêde di romana Edîp Polat a bi navê Ristemê Zal de cih girtine. Nivîskar, di vê romanê de li gelek noqteyan cih daye vê nirxê:

“... Hemî gencîneyên ser rûyê erdê li pêş çavê te ne tiştekan in! Tu merd î û camêr î!”¹⁰⁷

“... Lawo! Merd be, dîyariyan bide kesên dora xwe.”¹⁰⁸

Di vê mînaka jorîn de bi awayekî şîretkî cih daye nirxa comerdîyê.

“... Ji Zabilê bi rê ket, hetanî Kabilê hat. Bi rê ve, çewalên zêr û zîv vekir, gencîne li gel belav kir.”¹⁰⁹

“... Xortekî gelek comerd û destvekirîye jî. Li ser textê xwe zêran belav dike, lê di cengê de jî serîyan!”¹¹⁰

¹⁰³ Ronî War, *Mem û Zîn*, Weşanên Ava, Ankara, 2013, r. 23.

¹⁰⁴ *H.b.*, r. 26.

¹⁰⁵ *H.b.*, r. 51.

¹⁰⁶ *H.b.*, r. 57.

¹⁰⁷ Polat, *h.b.*, r. 25.

¹⁰⁸ *H.b.*, r. 26.

¹⁰⁹ *H.b.*, r. 28.

¹¹⁰ *H.b.*, r. 31.

“... Sam bi van dîtin û ramanên reml daran gelekî kêfxweş bû. Bexşîş da nûner, xurcika wî tijî zêr kir.”¹¹¹

“... Prensesa Kabilê dema vê bersivê girt, ji kêfa di cih de nesekinî, rabû, di nava civatê de reqisî û tililî kişand; kulmek zêr jî bi ser serê jinika extîyar ve reşand. Piştî destek cil ji bona bexşîşa ji wê re anî.”¹¹²

“... Mîhrab jî nesekinî, seba vê yekê hat û bû mêvanê Zal. Wî jî li xîzanên bajarê Zabilê diravan belav kir.”¹¹³

“... Ristem bi gotina bavê xwe kir, gelek zîv û zêr, hespên khêl û Erebi li serbazên artêşê û li hevalên xwe par kir.”¹¹⁴

“... Gava nûçeya kuştina Ab, serkeftina Ristem gihîşt Zabilê, Zalê kokim rabû ferman da; derê gencîneyê da vekirin, zêr û zîvan li gel da belavkirin.”¹¹⁵

“... Tac û textê mezinahî û mêraniyê bila tu car ji Zalê Zêrîn dûr nemîne! Li ber çavê min, hemî rûyê erdê ne bedelê neynoka te ye. Gencîneya me jî hergav ji te re vekirî ye.”¹¹⁶

“... Şah çû ser textê xwe rûnişt û Ristem jî ji ber ku serpêhewanê Îranê bû, li rex wî cih girt. Devê gencîneyê vekirin û diyariyan li gel belav kirin.”¹¹⁷

“... Dû re deriyê gencîneyê dan vekirin û zêr li leşker û pêhlewanan belav kirin.”¹¹⁸

“... Ez soz didim te, ger tu Ristem rê min bidî, ez dê jî şan û şerefê bidim te, devê gencîneya Semenganê ji te re vekim.”¹¹⁹

¹¹¹ H.b. , r. 45.

¹¹² H.b. , r. 46.

¹¹³ H.b. , r. 68.

¹¹⁴ H.b. , r. 76.

¹¹⁵ H.b. , r. 117.

¹¹⁶ H.b. , r. 128.

¹¹⁷ H.b. , r. 167.

¹¹⁸ H.b. , r. 210.

¹¹⁹ H.b. , r. 217.

“... Min te dîsa wuha saxî û selametî dît, ev ji min re bes e. Hezar qewraşên min yên guharzêrîn di bin fermana te de ne. Derê gencîneyê jî li te vekiriye.”¹²⁰

“... Gava tu vegeerî Tûranê, mohr û kursî, şûr û gencîne hemî wê di bin fermana te de bin.”¹²¹

“... Pêhlewane ku wî ji min re bîne, ez dê gelek diyarî bibexşînim jê re û ez dê qîza xwe jî lê mar bikim.”¹²²

Di kitêba Eyup Kiran a bi navê Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim de jî em rastî vê nirxa civakî hatin:

“... Aşiqan, li ber Paşayê Milan û mêvanên wî bi hêl qolîk lê xistin. Serdarê Ruhayê dest avêt berîka xwe û bexşîş da aşiqan.”¹²³

“... Reqasan û koçekan bexşîş hem ji Hirço Beg hem jî Temir Paşa girtin.”¹²⁴

Di romana Siyabend û Xecê ya Ronî War de ji bo comerdîyê me mîna ke tenê tesbît kir:

“... “Kî Siyabend bigre û bîne em ê wî xelat bikin! Em ê zêr û pereyan, mal û milk bidinê!”¹²⁵

Evîna Merxasekî ya Îbrahîm Osman ji alîyê nirxan ve gelekî dewlemend e. Di vê romana wî de nirxên comerdîyê jî cih girtine û bi vî awayî ne:

“... Silêman Axa mirovekî bi desthilanîn, comerd û zarxweş bû.”¹²⁶

“... Çênabe em te ji mala xwe destevala û tenê bişînin. Barê mehîne hinek cil û xwarin e, ji bo mala we zarokan amade kiriye, ez û du siwar jî em ê bi te re werin, te bigihînin malê.”¹²⁷

¹²⁰ H.b. , r. 244.

¹²¹ H.b. , r. 260.

¹²² H.b. , r. 175.

¹²³ Kiran, h.b. , r. 20.

¹²⁴ H.b. , r. 44.

¹²⁵ Ronî War, Siyabend û Xecê, Weşanên Ava, Ankara, 2013, r. 48.

¹²⁶ Osman, h.b. , r. 81.

¹²⁷ H.b. , r. 109.

“... Wan jî, dest dibirine bêrikên xwe, şabaş didane aşiqan.”¹²⁸

“... Temîr Paşa du zêr ji bêrika xwe derxist, xiste mista selwên.”¹²⁹

Di romana Evîna Pinhan a Sabrî Akbel de jî ji bo comerdîyê çend mînak xuya dibin:

“... Çend sed cot erdê wî hebû. Ji vî erdî tiştêkî hindik diçand. Yê dî jî li gundîyan belavkirî bû. Dilê wî û qelbê wî fireh bû. Te dikarî pariyê di devê wî de biderîni...”¹³⁰

“... Bibû wekî dewletekê. Destê wî vekirî bû, qelbê wî fireh bû. Ji bo wilo malê dinê bi ser de rijiyabû.”¹³¹

Em vê nirxê di romana Bilîcanê de jî li çend deveran dibînin ku bi vî awayî ne:

“... Hesê jî li dû ra hat û destê xwe kire berîka xwe û sê sed diraf li berîka xwe deranî û da dengbêjan.”¹³²

“... Gencên hêja! Bêjin kanê daxwaz û mirazên we çine? Ez dixwazim li vê berevîyê da ji bo wê mêranîya ku we kiriye, we her du birayan xelat bikim. We çi xwest, bi gowayîya vê berevîyê ez xwe ji daxwaza we nahêvişînim.”¹³³

“... Melayê Mîrî buxçika xelatan rakir û li ber Êzdîni danî. Mîr jî ji cî rabû, kurkê xwe yê mîrîtiyê ji milê xwe şiqitand û avîte milê Êzdîni.”¹³⁴

2.4. DIRISTÎ

Diristî, derew nekirin, rastbûn e. Di çi rewşê de jî be kesên dirist, dev ji rastîyê bernadin. Di gotin û kirinên mirovên rast û dirist de hevgerî heye.¹³⁵ Diristî

¹²⁸ H.b. , r. 169.

¹²⁹ H.b. , r. 196.

¹³⁰ Sabrî Akbel, *Evîna Pinhan*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2006, r. 12.

¹³¹ H.b. , r. 55.

¹³² Perwîz Cihanî, *Bilîcan*, Weşanên Doz, Stenbol, 2002, r. 127.

¹³³ H.b. , r. 253.

¹³⁴ H.b. , r. 477.

¹³⁵ Hayati Hökelekli, *Değerler Psikolojisi ve Eğitimi*, Timaş Yayınları, İstanbul, 2013, r. 91.

nirxeke gerdûnî ye. Em di romanên kurmancî yên folklorîk de rastî vê nirxa civakî jî tîn. Lê em dikarin bibêjin ku vê nirxa civakî di romanên me de kêm cih girtiye. Em ê li jêr nirxên diristîyê yên ku me ji romanên xwe yên folklorîk ên kurmancî tesbît kirine rêz bikin.

Îbrahîm Osman di romana xwe Evîna Mêrxasekî de li du cihan ev nirx bikaranîye ku bi vî rengî ne:

“... Xwediyê soza xwe bû. Bi heval û hogirên xwe re dilsoz û dirist bû. Tu caran bi xinizî û bêbextî nêzikî hevalên xwe nedibû.”¹³⁶

“... Ez her roj nanê te dixwim, nikarim bêbextî bi te re bikim.”¹³⁷

Di mînaka ewil de, nirxa diristîyê rasterast hatiye dayîn û pê re taybetmendiyên vê nirxê hatine rêz kirin. Di mînaka duyem de, ev nirx rasterast nehatiye dayîn lê ji hin taybetmendiyên vê nirxê em pê derdixin ku balê dikişîne li ser diristîyê.

Edîp Polat jî di romana xwe ya bi navê Ristemê Zal de, li du deveran, bi vî awayî cih daye vê nirxê:

“... Te soz dabû min ku piştî kuştina Dêwê Sipî tu dê min azad berdî. Ka ad û waada te?”¹³⁸

“... Ji rastiye baştirîn tiştek nîn e mîrê min.”¹³⁹

Erebê Şemo di romana xwe ya bi navê Dimdimê de li dereke tenê ev nirx bikaranîye ku bi vî şiklî ye:

“... Lê ew merivên ku rast nabêjin, em wan dikujin. Lê ew merivên ku rast li xwe mukurîne di nava me de hene û pak dijîn.”¹⁴⁰

¹³⁶ Osman, *h.b.*, r. 132.

¹³⁷ *H.b.*, r. 195.

¹³⁸ Polat, *h.b.*, r. 153.

¹³⁹ *H.b.*, r. 213.

¹⁴⁰ Şemo, *h.b.*, r. 68.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan a Îhsan Colemêrgî de jî ev nirx li du cihan hatiye bikaranîn:

“... Axayê min, çi ji te veşêrim çi ji Xwedê.”¹⁴¹

“... Zagona kê eşîra kurdan destûra vê xeletî û xiyanetê dide. Bila hema rastî jê re bigota. Çi hewce vê xapandinê bû.”¹⁴²

2.5. EDALET

Edalet ango dad yek ji nirxên civakî û gerdûnî ye. Tê wateya bicihanîn û parastina heqîyê. Li gorî Hokelekî edalet, bêalîbûna di hukim û tevgeran de ye û hîmayekirina wekhevîyê ye.¹⁴³ Nirxa edaletê bi rêzikên olî û exlaqî ve girêdayî ne. Di romanên me yê folklorîk de jî ev nirx li gelek deveran hatiye bikaranîn. Em ê li jêr nirxên edaletê yê ku me di romanên xwe de tesbît kirine yek bi yek bidin.

Îhsan Colemêrgî di romana xwe ya Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li çend deveran cih daye vê nirxê ku bi vî rengî ne:

“... Hey lo lo Mîro, tu xûdan dîwanî

Girtiya digirî, sucî nizanî,

Celad kafir in, ma tu almanî?

Hey lo lo Mîro, tu xudan meclîsî,

Girtiya digirî, sîucî napirsî,

Celad kafir in, ma tu urusî?”¹⁴⁴

Di vê mînakê de nirxa edaletê bi awayekî helbestkî hatiye dayîn. Nirxa edaletê di vê mînakê de rasterast nehatiye dayîn lê em ji gotinên wek *“girtiya digirî sîucî napirsî”* fêhm dikin ku ji Mîr daxwaza edaletê tê kirin.

¹⁴¹ Colemêrgî, *h.b.*, r. 8.

¹⁴² *H.b.*, r. 85.

¹⁴³ Hokelekî, *h.b.*, r. 49.

¹⁴⁴ *H.b.*, r. 76.

“... Êdî feqîrek nikare ber mela, qazî û walî jinekê jî bo xwe bînit. Ew neberdit ez dê wan hemiyar di vî bajarî de bikim pêkenîn û hemî qirêjîyên wan jî dê nav gelî de bidim belav kirin.”¹⁴⁵

Di vê mînakê de jî nirxa edaletê rasterast nehatiye dayîn. Di vê mînakê de tişta balkêş ew e ku berpîrsiyarên edaletê dûrî wê ne û li gorî edaletê tevnagerin. Bi awayekî binavgîn balê dikişîne ser nirxa edaletê.

“... Ew hate hewara me û hemberê rayedarên bêbext dade me pîrsî.”¹⁴⁶

“... Cihê hukmê mîrekên kurdan lê be, mirov dikare mafên xwe bipirse. Mirov nas dikin, guhên xwe diden mirov û heq û neheqiyê jêk cuda dikin”¹⁴⁷.

Mehmed Uzun jî di romana xwe ya bi navê Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê de li du cihan nirxa edaletê bikaranîye:

“... Tahar Xan hebû, kalemêrekî rind, yek ji mîrekên kurdan, bavê feqîr û fiqaran, dostê alim û zaneyan, xwediyê heq, hiqûq, edalet, edet û toreyan. Erdê Tahar Xanê fireh û têrzad, hikmê wî nerm û adilane bû.”¹⁴⁸

Di mînaka li jor de nirxa edaletê bi çend nirxên din ên civakî re rasterast hatiye dayîn.

“... Bi rindî, nermî û edalet hukim li xelkê xwe dikir.”¹⁴⁹

Di Tehar û Zeharê ya Ronî war de, li cihekî tenê ev nirx hatiye bikaranîn ku bi vi şiklî ye:

“... Êdî li hember welatîyên xwe bi edalet û bi dilgermî tevdigeriya.”¹⁵⁰

Erebê Şemo jî di Dimdima xwe de li cihekî tenê balê dikşîne ser vê nirxê:

¹⁴⁵ H.b. , r. 176.

¹⁴⁶ H.b. , r. 177.

¹⁴⁷ H.b. , r. 179.

¹⁴⁸ Uzun, h.b. , r. 61.

¹⁴⁹ H.b. , r. 63.

¹⁵⁰ War, Tehar û Zeharê, r. 39.

“... Lawo, sicûdekirin tişteki zehf mezin e û çetin e, çimki tu cezê dibiri, gerek cezê tu wisa rast, bi heqî bibiri, weki ê ku guneh kiribe ji, bizanibe tu rind, helal ji heqê wî hate der.”¹⁵¹

Di vê mînakê de nivîskar li ser girîngîya nirxa edaletê û hin xixûsîyetên wê sekinîye û bi awayekî şîretkî daxwaza edaletê jê hatiye kirin.

Di romana Edîp Polat ya bi navê Ristemê Zal de, nirxa edaletê li gelek caran hatiye bikaranîn ku bi vî rengî ne:

“... Mirovên ku zulm û tadehiyê li feqîr û fuqaran, li xulam û qewraşan bikin û bi malê dunê fexr û tox bin, li ber çavê min kafir in û ji Ehrîmen jî xerabtir in.”¹⁵²

“... Ya padîşahê xwedî edalet! Heq û dadî li te, bicihanîna wan jî li min!”¹⁵³

“... Lawê min! Hetanî ji destê te tê, adil be! Ji rêya rast derneyê!”¹⁵⁴

“... Tu bextewar bî! Him zana û him jî adil bî!”¹⁵⁵

“... Bila kesek ji te mekrûhiya neke, nehêle ku kesek ji te tengezar bibe. Ji rêya camêrî û dadiyê dernekeve.”¹⁵⁶

Di vê mînaka li jor de jî nirxa edaletê rasterast û bi awayekî şîretkî hatiye dayîn û bi nirxa camêrîyê re hatiye bikaranîn.

“... Xasma şîreta min li te, parêzvanê feqîr û fuqaran be.”¹⁵⁷

“... Kesên ku li pey heqqiyê û dadiyê digerin, bila dostê te bin. Deriyê xwe ji wan kesan re veke.”¹⁵⁸

Ronî War di romana xwe ya bi navê Siyabend û Xecê de li devereke tenê cih daye vê nirxa civakî ku bi vî rengî ye:

¹⁵¹ Şemo, *h.b.*, r. 200.

¹⁵² Polat, *h.b.*, r. 11.

¹⁵³ *H.b.*, r. 12.

¹⁵⁴ *H.b.*, r. 76.

¹⁵⁵ *H.b.*, r. 129.

¹⁵⁶ *H.b.*, r. 269.

¹⁵⁷ *H.b.*, r. 282.

¹⁵⁸ *H.b.*, r. 282.

“... Di lîstikên bi hevalên xwe re neheqî li ti kesî nedikir û heta jê dihat nedihîşt ku kes neheqiyê li hev bikin!”¹⁵⁹

Di romana Evîna Mêrxasekî ya Îbrahîm Osman de jî ev nirx tenê carekê hatiye bikaranîn û bi vî rengî ye:

“... Ma di kîjan kitêba edalet û zagonan de hatiye nivîsandin, ku mirov yekî ji bo mêvaniyê vexwende bike, pişt re bide girtin?”¹⁶⁰

Di romana Bilîcanê de jî ev nirx li devereke tenê bi vî awayî hatiye bikaranîn:

“... Em ê te bispêrin destê dadigeha gelîrî. Dadigehê çi biryar girt, em ê cî bi cî bikin.”¹⁶¹

Di vê mînakê de li ser bicihanîna nirxa edaletê hatiye sekinîn. Di vê mînakê de eşkere xuya dibe ku li ser edaletê tu hukim nîn in û bicihanîna wê jî ferz e.

2.6. EFÛKIRIN

Efûkirin, tê wateya borandina li hember xetayekî an cezayekî. Yek ji nirxên civakî yên ku me di romanên kurmancî yên folklorîk de tesbît kiriye efûkirin e. Li jêr em ê van nirxên efûkirinê yên ku me tesbît kirine rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan a Îhsan Colemêrgî de nirxeke efûkirinê derdikeve pêşîya me ku bi vî şiklî ye:

“... Mezin zarokan, bab jî ewladên xwe efû dikin.”¹⁶²

Di vê mînakê de nirxa efûkirinê rasterast hatiye dayîn û rola wê ya li ser ferdên civakê derdikeve pêş. Aîdiyeta vê nirxê di civakê de li mezin û kalan e.

Mehmed Uzun jî di romana xwe ya bi navê Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê de li devereke tenê cih daye vê nirxê:

“... Efû û lebihurîn karê mêran û mezinan e.”¹⁶³

¹⁵⁹ War, *Siyabend û Xecê*, r. 16.

¹⁶⁰ Osman, *h.b.*, r. 39.

¹⁶¹ Cîhanî, *h.b.*, r. 504.

¹⁶² Colemêrgî, *h.b.*, r. 61.

Di Tehar û Zeharê ya Ronî War de jî em vê nîrxê bi vî şiklî dibînin:

“... Padîşahê min, tu mezîne me yî! Me efû bike. Karê mezinan efûkirin e! Li me were rehmê!”¹⁶⁴

Ronî War di Mem û Zîna xwe de li çend cihan ev nîrxê civakî bi vî şiklî bikaranîye:

“... Min ji nezanî qisûr kir, qisûr efûkirin karê mêran e.”¹⁶⁵

Di van mînakên li jor de heman tişt derdikeve pêşîya me: Efûkirin û lêbihûrîn karê mezinan e û ev nîrx rasterast hatine dayîn.

“... Hew vê carê min efû bike êdî ti caran qisûr û bêedebiyek wisa nakim.”¹⁶⁶

“... Mîr ji bo xatirê hersê birayan, her çi qusûra min hebe avêtiye bin lingan. Jixwe li cem Mîr û hakimî jî adet ev e!”¹⁶⁷

Di romana Ristemê Zal a Edîp Polat de jî em rastî vê nîrxê tînin:

“... Min çewtî kir, neheqî li te kir. Bona şerê Suhrab min bang li te kir. Ger min dilê te şikestibe, min bibexşîne.”¹⁶⁸

Ronî War di romana xwe ya bi navê Siyabend û Xecê de ev nîrxê li devereke tenê bikaranîye:

“... Siwaro kesî di bextê kesî de kes nekuştîye. Vî mirovî xwe avêtiye bextê min, wî bide xatirê min qîzê û wî efû bike. Xelk bi sedan mêra ji hev dikujin gava ku jin têkeve dozê her tişt diqede û doz safî dibe! De îcar çi kiribe divê tu wî efû bikî!”¹⁶⁹

Di romana Evîna Mêrxasekî ya Îbrahîm Osman de jî em vê nîrxê li cihekî tenê dibînin:

¹⁶³ Uzun, *h.b.*, r. 114.

¹⁶⁴ War, *Tehar û Zeharê*, r. 105.

¹⁶⁵ War, *Mem û Zîn*, r. 40.

¹⁶⁶ *H.b.*, r. 112.

¹⁶⁷ *H.b.*, r. 143.

¹⁶⁸ Polat, *h.b.*, r. 210.

¹⁶⁹ War, *Siyabend û Xecê*, r. 120.

“... Wisa be, ez jî xortekî wekî te dilpak û zîrek destevala venagerînim. Di nêzikîrîn demê de, ez ê ji Waliyê Amedê re agahî bişînim, êdî xeman nexwe, wer bihesibîne bavê te azad bûye. Tu dikarî bê xem vegeerî mala xwe.”¹⁷⁰

Di romana Bilîcanê de jî em li çend deveran rastî vê nîrxê tîne ku bi vî awayî ne:

“... Li dû ra hemûyê li ber destê Mîr û Mela sûnd xwarin, ku êdî dizî û rêberiyê nekin. Mîr jî ewan hemû aza kirin.”¹⁷¹

“... Taze hûn hemû dibêjin, ez vê carê ji gunehên Deniz Begî û Îldirimî derbas dibim. Lê careke dî ev bûyera biqewume, ez çî carê napejirînim.”¹⁷²

“... Ez weke dayîkeke kurkuştî û xuşkeke birakuştî ji mafê xwe yê sizadanê dibihorim û daxwazê ji we jî dikim, ku gunehên Emer Axayî derbas bin.”¹⁷³

2.7. FEDAKARÎ

Tarhan nîrxê fedakarîyê wiha pênase dike: “Fedakarî, ji bo berjewendîyên xelkê dev ji yê xwe berdane.”¹⁷⁴ Kesên fedakar ewil berjewendîyên pêşberî xwe difikirin û dev ji yê xwe berdidin. Yek ji nîrxên civakî ku me di romanên kurmancî yê folklorîk de tesbît kiriye fedakarî ye. Li jêr em ê nîrxên fedakarîyê yê ku me di van romanên xwe de tesbît kirine yek bi yek rêz bikin.

Mehmed Uzun di romana xwe Rojê ji Rojên Evdalê Zeynikê de li cihekî tenê ev nîrx bikaranîye:

“... Zeynê nexwar, bi lawê xwe da xwarin, li xwe nekir, bi lawê xwe da lixwekirin. Wê mêr nekir û li ber çoka lawê xwe rûnişt û ew xwedî kir.”¹⁷⁵

Di vê mînakê de nîrxê fedakarîyê rasterast derbas nabe lê ji hin taybetîyên vê nîrxê yê wek nexwar, da xwarin û li xwe nekir, da lixwekirin em dizanin ku ev

¹⁷⁰ Osman, *h.b.*, r. 47.

¹⁷¹ Cîhanî, *h.b.*, r. 201.

¹⁷² *H.b.*, r. 245.

¹⁷³ *H.b.*, r. 511.

¹⁷⁴ Tarhan, *h.b.*, r. 172.

¹⁷⁵ Uzun, *h.b.*, r. 79.

fedakarî ye. Di vê mînakê de Zeynê ji bo lawê xwe Evdal hin tevgerên fedakarîyê dike.

Di romana Eyup Kiran a bi navê Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim de li çend deveran ev nirx derdikeve pêşîya me ku bi vî şiklî ne:

“... Ê bila hûn rind zanibin ku ez ne ji bo xwe, ez ji bo we li ber canê xwe didim. Zikê min têr e, malê min pir e.”¹⁷⁶

“... Ez û bavê te ji bo te xwe feda dikin.”¹⁷⁷

Di vê mînaka me ya jor de, nirxa fedakarîyê rasterast hatiye dayîn.

“... Îşelah tiştek bi min nayê, hat jî hat bila canê min ji xalanên me Milan re feda be.”¹⁷⁸

“... Dewrêş û hevalên wî bo jiyana gel, jiyana xwe winda kiribûn û wan ev lehengî rê gelê xwe dabû.”¹⁷⁹

Di romana Îhsan Colemêrgî ya bi navê Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de jî em li du cihan rastî vê nirxê tên:

“... Em canê xwe û zarokên xwe dê ber wî de bidin.”¹⁸⁰

“... Gelek girêdayê Cembelî û jê re pirr fedakar bû.”¹⁸¹

Di Siyabend û Xecê ya Ronî War de jî em li devereke rastî vê nirxa civakî tên:

“... De rabe, destê min jî girêde û min bibe, bila destê te û dergîstiya te ji rûyê min ji hev qut nebin, ê min hey dînya ji min re nebûye mal. Ha ez aniha mirime ha sed sal şûn de ti ferqa wê ji min re tune! Qene wê mirina min bi kêrî tiştekî were!”¹⁸²

¹⁷⁶ Kiran, *h.b.*, r. 75.

¹⁷⁷ *H.b.*, r. 163.

¹⁷⁸ *H.b.*, r. 227.

¹⁷⁹ *H.b.*, r. 280.

¹⁸⁰ Colemêrgî, *h.b.*, r. 15.

¹⁸¹ *H.b.*, r. 28.

¹⁸² War, *Siyabend û Xecê*, r. 53.

2.8. HEVALTÎ – XWEDÎTÎ

Hevaltî, xwedîtî ango dostanî yek ji nirxên civakî û gerdûnî ye. Di romanên me yê folklorîk de jî em li gelek devaran rastî vê nirxê hatin. Em ê li jêr nirxên hevaltî-xwedîtîyê yê ku me di romanên xwe de tesbît kirine rêz bikin.

Di romana Îhsan Colemêrgî ya bi navê Cembelî Kurê Mîre Hekaryan de ev nirx li çend deveran bi vî şiklî hatiye bikaranîn:

“... Ger em jî kurên baban bin, em jî Ehmed nahêlin bi tenê.”¹⁸³

Di mînaka me ya jor de nirxa hevaltîyê rasterast derbas nabe. Em ji hin taybetmendiyên vê nirxê fêrî dikin ku nirxa me hevaltî – xwedîtî ye. Hevaltî – xwedîtî ne ji bo demekê ye, heta hetayê ye û di demên zor û nexweş de heval ji hev re dibin pişt û alîkar. Di mînaka me de jî bi awayekî eşkere xuya dibe ku hevalên wî jê re dibin piştgir û wî bi tenê nahêlin.

“... Piştrast be. Ez sonda xwe naqulipim, serê min jî rêka te de biçit, ez xemê naxwem û poşman nabim.”¹⁸⁴

“... Mîrza zilamekî serwext û beynas e. Şaşiyê naket û aqilmend e. Biryarên wî jî gelekî binecih in. Ji bona te jî dostekî sadîq û dilsoz e. Xirabî û xiyaretê hizir nakit.”¹⁸⁵

“... Bihurîne de me xiyaret jî li te kiribe, em îro paş ve te tenê nahêlin.”¹⁸⁶

“... Ma ne şerme û fihêtiyê axretê ji karwanên hewe veqetim û bimînim tenê. Xencera xwe bide min. Dema tu hatî kuştin da ez jî xwe bikujim.”¹⁸⁷

Mehmed Uzun di romana xwe ya bi navê Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê de li devereke tenê ev nirx bikaranîye û bi vî şiklî ye:

“... Heta ez hebim, quwet terkî min neke, ez ê li vir bim, li cem te.”¹⁸⁸

¹⁸³ Colemêrgî, *h.b.*, r. 13.

¹⁸⁴ *H.b.*, r. 46.

¹⁸⁵ *H.b.*, r. 32.

¹⁸⁶ *H.b.*, r. 121.

¹⁸⁷ *H.b.*, r. 183.

Ronî War jî di Mem û Zîna xwe de li çend deveran cih daye vê nirxê:

“... *Ruh û canê birayên te di oxira te de ye!*”¹⁸⁹

“... *Bila şika te jê tune be ku em ê hersê jî canê xwe di ber te de bidin û xwîna xwe di ber te de birijînin!*”¹⁹⁰

“... *Ne mal û milk, dikarim di ber we de ruh û canê xwe bidim.*”¹⁹¹

Di Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim a Eyup Kiran de jî ev nirx bi vî şiklî derbas dibe:

“... *Em birayên hev in, gerek em dilê hev nehêlin.*”¹⁹²

Îbrahîm Osman jî di romana xwe ya bi navê Evîna Mêrxasekî de ev nirx bi vî şiklî bikaranîye:

“... *Xweşî û nexweşiya jiyanê parî hev dikirin, di rojên zor û teng de, gava pêstirtegiyê barê hev radikirin. Mîna du birayên dilsoz, her tişt bêminet ji hev re dikirin. Serê kîjanî biketa tengasiyê, yê din bi gazî û hewarî ve diçû.*”¹⁹³

“...*Jixwe ji îro û pêve em birayê hev in, tu mineta me li ser hev nîn e.*”¹⁹⁴

Di romana Bilîcanê de ev nirx bi vî awayî rastî me tên:

“... *Bi serê Mîrî eger gîrodarîyeke te hebe, ez bi can û mal va li ber te rawesta me. Gîyanekî min heye, ez ê ewî jî li rêka te de bext bikim.*”¹⁹⁵

“... *Ezbenî, ez li xizmeta te dame. Tu bêje ez zaroyên xwe li ber lingê te û Mîrî da ser jê bikim.*”¹⁹⁶

¹⁸⁸ Uzun, *h.b.*, r. 88.

¹⁸⁹ War, *Mem û Zîn*, r. 85.

¹⁹⁰ *H.b.*, r. 91.

¹⁹¹ *H.b.*, r. 112.

¹⁹² Kiran, *h.b.*, r. 215.

¹⁹³ Osman, *h.b.*, r. 14.

¹⁹⁴ *H.b.*, r. 144.

¹⁹⁵ Cîhanî, *h.b.*, r. 149.

¹⁹⁶ *H.b.*, r. 159.

Di vê mînaka me ya jor de çend noqteyên balkêş hene. Em di vê mînakê de taybetmendiyên çend nirxên civakî yên ji hev cihê bi hev re dibînin. Di hevoka ewil de nirxa hurmetê, di hevoka duyem de nirxên hevaltî – xwedîtî û fedakarîyê bi hev re hatine bikaranîn.

2.9. HURMET

Hurmet, di wikiferhengê de, di wateyên wek rêzgirtin, qedir, qîmet û rûmetê de hatiye bikaranîn.¹⁹⁷ Yek ji nirxên me yên civakî û gerdûnî ku di romanên kurmançî yên folklorîk de jî derbas dibe hurmet e. Vê nirxê di romanên me de gelekî cih girtiye. Hema bibêje di hemû romanên me yên folklorîk de em rastî vê nirxa civakî hatin. Em ê li jêr nirxên hurmetê yên ku me ji romanên xwe tesbît kirine rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan a Îhsan Colemêrgî de em li gelek deveran rastî vê nirxê hatin:

“... *Gelê zomê edep û hurmetekî pîrr zêde da bûn.*”¹⁹⁸

“... *Cembelî jî pîrr qedir û siyanetê ji dayîka xwe re digirt.*”¹⁹⁹

Di van her du mînakên li jor de nirxa hurmetê rasterast hatiye dayîn.

“... *Ez xizmetkarê te me dayê.*”²⁰⁰

“... *Tu dizanî dê û babên min li ba min pîrr qedr û qîmet in. Gotinên wan bona min şemal in û ronahî ne.*”²⁰¹

“... *Şerm kir beriya Cembelî tîrê bavêtê.*”²⁰²

Di mînaka me ya jor de nirxa hurmetê rasterast nehate dayîn lê em ji tevgerên qehremanên kitêbê fêhm dikin ku nivîskar dixwaze balê bikişîne ser nirxa hurmetê. Di civaka kurdan de yek ji nîşaneyên hurmetê ew e ku berî mezin û giregiran dest bi

¹⁹⁷ WikiFerheng, <https://ku.wiktionary.org/wiki/hurmet>, 09 Tebax 2019.

¹⁹⁸ Colemêrgî, *h.b.*, r. 25.

¹⁹⁹ *H.b.*, r. 27.

²⁰⁰ *H.b.*, r. 27.

²⁰¹ *H.b.*, r. 32.

²⁰² *H.b.*, r. 49.

hereketê nayê kirin. Di mînaka me de jî bi awayekî eşkere xuya dibe ku ji hurmetê berî Cembelî tîr nayê avêtin, mafê avêtina tîr ewil didin wî.

*“... Gotin ya te ye Beg. Destûra te hebît ez dê rabim.”*²⁰³

*“... Ezbenî ji min zêde ye ku şîreta li te bikim.”*²⁰⁴

*“... Axa û mirovên xwe destên xwe danîn ser singên xwe û ber silavên Mîr Yezdan ve rabûn ser piyan. Minnetdarî jê wergirtin û rûniştin xwar.”*²⁰⁵

*“... Silav kir, hemî ber ve rabûn ser piyan.”*²⁰⁶

*“... Axa tu mezinê me yî, qedîm de bab û bapîrên hewe hemî bûyeran de pêşiya me bûn. Hûn ser in em pêyên hewe ne.”*²⁰⁷

*“... Rêwiyan destên xwe dane singa xwe, ber ve rabûn û spasî lê kirin. Çawan rabû ser pêyan, rêwî hemû ji ber ve rabûn û şevbaşî lê dan.”*²⁰⁸

Mehmed Uzun jî di romana xwe ya bi navê Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê de li çend deveran bi vî awayî cih daye vê nirxa civakî:

*“... Herkesî qedir û qîmeta Evdal digirt û jê hez dikir.”*²⁰⁹

*“... Mîrê mino, xwedanbext û merivê çêyo, li meclîsa te, ez ne bi destê xwe me. Tu bi qîma xwe yî. Hema te çi navî lê kir, navê lawê min, xulam û koleyê te, ew e.”*²¹⁰

*“... Gotina Tahar Xanê weha bû, lê ji destên wî jî çi dihat, wî teksîr nedikir; alîm, zana û hunermend li dora xwe dicivandin û qedr û qîmet dida wan.”*²¹¹

*“... Evdalê Zeynikê ye, pîrê me dengbêj û stranvanan e. Eger çewtî û qusurekî min hebe, ez benî me, li min megire.”*²¹²

²⁰³ H.b. , r. 61.

²⁰⁴ H.b. , r. 67.

²⁰⁵ H.b. , r. 77.

²⁰⁶ H.b. , r. 85.

²⁰⁷ H.b. , r. 86.

²⁰⁸ H.b. , r. 139.

²⁰⁹ Uzun, h.b. , r. 30.

²¹⁰ H.b. , r. 39.

²¹¹ H.b. , r. 63.

“... Ew bi edep û terbîye bû û ji biçûkan hez dikir û rêz û rêzdarî ji mezinan kêr nedikir.”²¹³

“... Li welatê me kurdan adet û ûsil e, kes dest li kalemêr, pîrejin, birîndar, zarok, jinebî, ketî û sêwiyan ranake. Hele li evîndar û dilketiyan qet ranake.”²¹⁴

Di mînaka me ya jor de yek ji adet û usilên ji nav welatê kurdan hatiye dayîn hurmet e. Nirxa hurmetê rasterast nehatiyê dayîn lê em ji gotinên mînaka li jorîn a “kes dest li kalemêr û pîrejinan ranake” fêr dikin ku ev nîşaneyên nirxa hurmetê ne.

Di Tehar û Zeharê Ya Ronî War de jî ev nirx li çend deveran hatiye bi kar anîn:

“... Bi edebek giran silav da û got: Padîşahê min heger destûra cenabê te hebe dixwazim tiştêkî bibêjim?”²¹⁵

“... Serwezîr, piştî ku gihastibû mexseda xwe dîsa bi edeb û hurmeteke giran ji hizûra padîşah vekîşiya.”²¹⁶

“... Ereb Xoce tavilê xwe da hev, bêhemdî xwe kincên xwe li hev rast kir, destê xwe danî ser sînga xwe, xwe xwar kir û got: Fermo padîşahê min!”²¹⁷

“... Wey ser serê min padîşahê min! Fermana te ew ê were cih, tu ti xeman nexwî! Bila cenabê te zanibe ku çi ji destê min bê ez ê teksîr nekim.”²¹⁸

“... Serwezîrê bajarê Palê hat, bi edeb û hurmeteke gelek giran derbasî hizûra padîşah bû!”²¹⁹

“... Ser çavên min! Tu çawa fermanê bidî ez ê bînim cih!”²²⁰

“... Xanima hêja, ser serê me, tu çawa dixwazî em ê wisa bikin!”²²¹

²¹² H.b. , r. 74.

²¹³ H.b. , r. 114.

²¹⁴ H.b. , r. 104.

²¹⁵ War, Tehar û Zeharê, r. 23.

²¹⁶ H.b. , r. 24.

²¹⁷ H.b. , r. 26.

²¹⁸ H.b. , r. 27.

²¹⁹ H.b. , r. 36.

²²⁰ H.b. , r. 73.

“... *Bejna xwe li hember padişah tewand û bi dengê di xwe de û pabûsî silav da.*”²²²

“... *Ji bo ku mizgînê bigihînim te hatibûm, de bi destûra te be niha divê ez vegerim li ser nobedaran bisekinim da ku şaşiye çêbe.*”²²³

“... *Destên xwe li ber xwe dan ser hev, serê xwe bi rêz tewandin û her duyan bi hev re gotin: Emir bike keybanûya me ya hêja!*”²²⁴

Erebê Şemo di romana xwe ya bi navê Dimdimê de ev nirx li gelek deveran bikaranîye:

“... *Cimaetê ku dît Xano ye, xwe dan aliyekî, rê dan wî, wekî pêşî ew here meçîtê.*”²²⁵

“... *Şahê Şah sax be, Silêman Xan hatiye û îtmaz dike tu destûrê bidî ew bê hizûra te.*”²²⁶

“... *Qurşût di fikra xwe de got, “Mîna bavê xwe bi hurmet e.*”²²⁷

“... *Kerem bikin, rûnên. Lê kesek rûnenişt, heta ku Xano bi xwe rûnenişt.*”²²⁸

“... *Ew ji min zêde ye, -Sîmon got,- wekî ez herim li cem Ebdilrezaq û Şêx Zade rûnêm. Li vir ji min re pak e.*”²²⁹

“... *Ji nişkê ve bû teqîniya dêrî, derî vebû, Xano ji der de hat. Ebdilrezaq û Şêx Zade ji ber ve rabûn ser pîyan.*”²³⁰

“... *Di nava meclîsa wî de, hinek kalên heştê nod salî û zêde hebûn. Ew giş dihatin jorê, li cîyê hurmet rûdiniştin.*”²³¹

²²¹ *H.b.* , r. 88.

²²² *H.b.* , r. 102.

²²³ *H.b.* , r. 118.

²²⁴ *H.b.* , r. 121.

²²⁵ *Şemo, h.b.* , r. 36.

²²⁶ *H.b.* , r. 85.

²²⁷ *H.b.* , r. 92.

²²⁸ *H.b.* , r. 103.

²²⁹ *H.b.* , r. 126.

²³⁰ *H.b.* , r. 129.

Di mînaka me ya jor de nirxa hurmetê rasterast hatiye dayîn. Di civatê de ji bo rûniştina kal û pîran jorê meclîsê wek cihê rûniştinê tê nîşandan ku ev tevger nîşaneyêke nirxa hurmetê ye.

“... *Kalekî bejinbilind, gewdeyekî gir lê, rîdaneke tîr î spî yî kaw lê ji der de hat, giş ji ber wî kalî rabûn ser pîyan. Xano jî, ji cîyê xwe rabû.*”²³²

“... *Xano bi lez serçavê xwe can kir û çû dîwanxaneyê. Ew ku hate dîwanxaneyê, giş ji ber wî ve rabûn, wî silav da wan.*”²³³

“... *Hukmê te, maqûl, ez ê li ser serê xwe biqedînim. Destûrê bide ez herim.*”²³⁴

Ronî War di romana xwe Mem û Zînê de li gelek deveran cih daye vê nirxê ku bi vî rengî ne:

“... *Baglî tavi lê bi hêla Mem ve lezand û hat, derbasî hundûr bû bi edebek giran li hember wî sekinî.*”²³⁵

“... *Mem got, “Peyv û gotinên kal û pîran tevdek cewher in. Divê mirov wan neavêje bin lingan.*”²³⁶

“... *Siltanê me, fermana te li ser serê me û çavên me!*”²³⁷

“... *Pêşîrê ebayên xwe bihev xistin û devê delingên şapikan berdan, gelekî bi edeb li deriyê siltanê xwe Memê Alan xistin.*”²³⁸

“... *Vê gotina Memê Alan aqil ji serê Beglî revand, bû mîna dîne çolan. Lê tevlî vêya jî zû xwe da hev û gelekî bi edep got: Ser herdu çavên min, bes tu emir bike!*”²³⁹

“... *Mem got: Bibêje kalo şîretên te li ser serê min û herdu çavên min e.*”²⁴⁰

²³¹ *H.b.*, r. 131.

²³² *H.b.*, r. 131.

²³³ *H.b.*, r. 167.

²³⁴ *H.b.*, r. 209.

²³⁵ *War, h.b.*, r. 21.

²³⁶ *H.b.*, r. 23.

²³⁷ *H.b.*, r. 25.

²³⁸ *H.b.*, r. 46.

²³⁹ *H.b.*, r. 47.

“... Hema tu çi bibêjî li ser ser û çavên min. Her gotina ku ew ê ji devê te derkeve ji bo min gewhereke ku bi xezîneyan nayê kirîn.”²⁴¹

“... Gava ku wan xortan dîtî siwarekî mîna siltanan bi ber wan ve hat, giştik ji ber wî rabûn ser lingan, bi edebek giran sekinîn û qor girêdan.”²⁴²

“... Bi edebek giran li ser lingan sekinîn û xwe dan benda wê ku tiştê bibêje yan jî rabe bide pêşiya wan û derkevin herin nav bexçeyan.”²⁴³

“... Di dilê xwe de got “Çi qasî bavê vî lawikî ji bavê min mezintir be jî ez bi emrê xwe jê mezintir im, diviyabû ji ber min rabûya ser lingan û hurmeta xwe nîşan bida. Ev çi bêedebiyek mezin e!”²⁴⁴

Di mînaka me ya jor de bi awayekî binavgîn li ser hurmetê bal hatiye kişandin. Wek nîşaneyê hurmetê divê mirov ji pêl kesên ku bi emrê xwe mezintir in, rabe ser lingan. Ev mînaka me bi awayekî neyînî balê dikişîne ser hurmetê. Bi vê taybetmendîya xwe ji mînakên me yên din cihê ye.

“... Memê Alan got: Baş e ezbenî, heçî emr û fermana Mîrê Botan li ser ser û çavên min e.”²⁴⁵

Edîp Polat jî di romana xwe Ristemê Zal de li gelek deveran ev nirx bi vî awayî şixulandiye:

“... Bavo! Ji te re hurmet dikim, destê te radimûsim.”²⁴⁶

“... Li ser navê gelê civatê yekî bersiv da: Tu mezinê me yî, ji me hemîyan jî jîrtir î. Ferman di destê te de ye.”²⁴⁷

²⁴⁰ H.b. , r. 60.

²⁴¹ H.b. , r. 65.

²⁴² H.b. , r. 77.

²⁴³ H.b. , r. 100.

²⁴⁴ H.b. , r. 127.

²⁴⁵ H.b. , r. 144.

²⁴⁶ Polat, h.b. , r. 42.

²⁴⁷ H.b. , r. 51.

“... Zal, Mîhrab û rîspiyên Zabilî gava Sam ji dûr ve dîtin, çûn pêşiya wî, ji hespan daketin, hemî, yek bi yek bejna xwe li ber Sam tewandin û hurmetên xwe pêşkeş kirin.”²⁴⁸

“... Li hember wî rêz bûn û hurmeta xwe jê re nîşandan, bejna xwe li ber wî tewandin.”²⁴⁹

“... Tu xezûrê min î, di dewsa bavê min de yî, jixwe destê min li ber te ranabe.”²⁵⁰

“... Zal birin ber derê dîwanxanê, gava ew çû hundur, silav li kesên dîwanxanê kir. Hemî kesên xwedî eşîr û xwedî sermiyan ji ber wî derket piya. Keyxusrayê Mubarek ji miqamê xwe rabû û ber bi wî ve hat, destê wî maç kir û ew bir li ser textê xwe da rûniştandin.”²⁵¹

Di romana Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim a Eyup Kiran de jî nirxên hurmetê cih girtine:

“... Em eşîr eşîr ji hev veqetin. Bila rîspî li pêşiyê bisekinin, ciwan li dawîyê bin.”²⁵²

“... Her du xort bi wî halên xwe yên heyecan ketin hundirê odayê, li hember Paşê li ser piyan sekinîn, destê xwe li pêş xwe dan ser hev.”²⁵³

“... Paşayê serbilind ku destûra te hebe hêviyeke min heye ez ê ji te rica bikim.”²⁵⁴

“... Dewrêş jî mîna bavê xwe, xwe navmalî dihesiband, berê jî gava dihat dîwanê li serê ligan rûdinişt, her tim hurmet û xizmetan rîspiyan dikir.”²⁵⁵

²⁴⁸ H.b. , r. 75.

²⁴⁹ H.b. , r. 206.

²⁵⁰ H.b. , r. 249.

²⁵¹ H.b. , r. 318.

²⁵² Kiran, h.b. , r. 19.

²⁵³ H.b. , r. 74.

²⁵⁴ H.b. , r. 165.

²⁵⁵ H.b. , r. 198.

Ronî War di romana xwe ya bi navê Siyabend û Xecê de li cihekî tenê balê dikişînê ser vê nirxê:

*“... Lawik hat, derbasî hundur bû, silav da, bi edeb xwe da quncikekê û xwe da benda gotinên wan.”*²⁵⁶

Di romana Evîna Pinhan a Sabrî Akbel de jî em li çend deveran rastî vê nirxê tên:

*“... Smaîl û Salih çûne qesra Hecî Axa. Derketine qatê diduyan. Li derî xistin, bi edep ketine hundir.”*²⁵⁷

*“... Devera ku destê xwe dirêj kiribana, destê wî dihat ramûsandin.”*²⁵⁸

*“... Salih, hate dîwanê. Çû benda Cafer Axa. Destên xwe li ber xwe dan ser hev, bi edebê de sekinî.”*²⁵⁹

Îbrahîm Osman di romana xwe Evîna Mêrxasekî de li çend deveran cih daye vê nirxê:

*“... Destpêkê, kalemêr û rûspiyan, pişt re ji kesên navsere û ciwanan qehwe vexwarin.”*²⁶⁰

*“... - Tu mezin, şareza û rêberê me yî. Hemû agahî li cem te ne û ya rast çi ye tu baştir dizanî. Hema tu bibêje, em jî bikin. Bibêje bimirin bimirin, bimînin bimînin.”*²⁶¹

*“... - Mîrê min, destûr bide ez tişteki bibêjim.”*²⁶²

Berî mirov biştexile, mirov ji mîr, axa û giregiran destûra axaftinê dixwaze ku ev yek jî nîşaneyên nirxa hurmetê ne. Di mînaka me ya jor de nirxa hurmetê rasterast nehatiye dayîn lê ji hin nîşaneyên vê nirxê em dizanin ku ev nirx hurmet e.

²⁵⁶ War, *Siyabend û Xecê*, r. 50.

²⁵⁷ Akbel, *h.b.*, r. 51.

²⁵⁸ *H.b.*, r. 68.

²⁵⁹ *H.b.*, r. 81.

²⁶⁰ *H.b.*, r. 13.

²⁶¹ *H.b.*, r. 20.

²⁶² *H.b.*, r. 24.

“... Gava ku Milhim nêzîkî kom bû, Evdî derket pêşiyê, bi serê hespê bavê xwe girt.”²⁶³

“... Piştî ku gelek kesên din axaftin û her yekî tiştek got, yê herî temen mezin, ku di destpêkê de axaftûbû got:

- Em tev axivîn lê divê em bizanibin ka fikra Temîr Paşa çi ye, ew li ser vê mijarê çi dibêje.”²⁶⁴

“... Axano, begino, rêber û mezinno hûn çi dibêjin, fikra we çi ye?”²⁶⁵

“... Mezin, axa û rûspiyên qefleyê kî bûya, def û zirne pêşî diçûne pêşiya wî.”²⁶⁶

“... Selwan paşpaşkî bi şûn ve çû, ji binê kon derket.”²⁶⁷

Di romana Bilîcanê de jî em li çend deveran bi vî awayî rastî vê nirxê tîn:

“... Ta roja îro li ber apê xwe nerawestabû û xebera xwe nedabû ber xebera wî.”²⁶⁸

“... Silêmanî li ber derê konî, li ser darê edebê rawestabû. Mîrî bi zorê ew da rûniştandinê. Li ser çokan rûnişt.”²⁶⁹

“... Îca Mîr bi vê gotina xwe ra jî rabû ser pîyan. Gava ku mîr rabû şipê, komel jî pê ra rabûn û hemû tev derketin derva.”²⁷⁰

“... Lê zû xwe kom kir û destê xwe da sîngê xer û hema wisan li ber derê xîvetê rawestayî ma. Mîrî dîsan cî nîşanî wî da û vê carê bi dengê bilind, ku rehên kêfxweşî û şabûnê têda bi başî diyar kirin, got:

Silêman fermo lêre! Fermo! Fermo! A lêre! A lêre!

²⁶³ H.b. , r. 27.

²⁶⁴ H.b. , r. 71.

²⁶⁵ H.b. , r. 89.

²⁶⁶ H.b. , r. 168.

²⁶⁷ H.b. , r. 196.

²⁶⁸ Cîhanî, h.b. , r. 19.

²⁶⁹ H.b. , r. 114.

²⁷⁰ H.b. , r. 132.

Silêmanî nepejirand û got:

- Ezbenî eger destûra te hebe, ez ê hema a lêre birûnim."²⁷¹

"... Pêş da Emer Axa serçawanî da Mamê Îsî û dû ra jî komelê hemûyê bi wateya rêzlêgirtinê destên xwe ji Mamê Îsî re bilind kirin."²⁷²

"... Li giştî berevî û dîwanxanan da Bayloz tim li serê jorê, li rex axa û beg û mîran rûdinişt. Gava ku derî li komelekê vekira, giştî komelê bi cahil û ahilan va li ber pîyên wî radibûn. Dema ku navê Baylozî bihata, komelê bi giraniyeke taybetî, bi pîrozî navê wê dihanîn."²⁷³

"... Êzdîn Beg yek bi bejna xwe va ji ber Mîr û hevalan va rabû. Hemûyan dest li stuyên hev ra birin. Êzdîn Beg cî nîşanî mêvanan da û bixwe jî li binîya konî li ser darê edebê rûnişt."²⁷⁴

2.10. MERHEMET

Hökelekî, nirxa merhemetê wiha pênase dike: Merhemet, dilşewatî û şefqet e, şefqeteke asteke bilind e.²⁷⁵ Yek ji nirxên me yên civakî merhemet e. Her çî qasî hejmara vê nirxê li gorî nirxên din ên civakî kêr jî be, dîsa jî di romanên kurmancî yên folklorîk de em li çend deveran rastî vê nirxê tên. Em ê li jêr nirxên merhemetê yên me ji romanên xwe tespît kirine rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de ev nirx li çend deveran hatiye bikaranîn ku bi vî şiklî ne:

"... Ne webît ku tu tîra bavêjî kewên ser hêlînê, bizin û miyên avis."²⁷⁶

Di vê mînaka me ya jor de nirxa merhemetê rasterast nehatiye dayîn. Em ji hin nîşane û taybetmendiyên vê nirxê fêr dikin ku ev nirx merhemet e. Bi awayekî şîretkî, bal li ser merhemetê hatiye kişandin. Tiştê balkêş ku di vê mînakê de xuya

²⁷¹ *H.b.*, r. 139.

²⁷² *H.b.*, r. 214.

²⁷³ *H.b.*, r. 237.

²⁷⁴ *H.b.*, r. 477.

²⁷⁵ Hökelekî, *h.b.*, r. 69.

²⁷⁶ *Colemêrgî, h.b.*, r. 27.

dibe ew e ku ne tenê li hember mirovan lê li hember ajalan jî gerek mirov xwedî merhemet be.

*“... Dilê wê jî pê sot.”*²⁷⁷

*“... Dilê xwediyê malê pê sot.”*²⁷⁸

*“... Ji bo heywanan jî pîrr rehmanî ye.”*²⁷⁹

*“... Tasekê şîrî ji feqîrê Xwedê re bîne, guneh e... qemî dilê wî ber dide.”*²⁸⁰

Di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de jî li çend deveran em rastî vê nirxê tên:

*“... Lawo, Temo... De bilezîne, tu û diya xwe derman û giyayên şîfayê bînin, em dayînin ser perwaz û birînên qulingê. Heye ku Rebê Alemê li gunehê wî binihere û şîfayê xêrê bidiyê.”*²⁸¹

*“... Hingê em ê qulingê belengaz çawan bihewînin û ji mirinê star bikin? Mehrûmê Gulê, em divê jê re çareyekê bibînin.”*²⁸²

*“... Temo ew dibir li deşt û zozanan digerland, Gulê ew dişûşt û pak dikir û Evdal jî pê re dipeyîvî û jê re stran digotin. Ew bûbû lawê duwemîn ê malê.”*²⁸³

*“... Dilê merivan bi wan dişewitî. Gunehê Evdal pir bi wan hat. Çi sûc û gunehên wan zarokan hebûn?”*²⁸⁴

Em nirxa merhemetê di romana Tehar û Zeharê de, li du cihan dibînin ku bi vî awayî ne:

*“... Loma dixwest heçî tiştê genc be bike, efûkar û dil bi rehm be.”*²⁸⁵

²⁷⁷ H.b. , r. 62.

²⁷⁸ H.b. , r. 92.

²⁷⁹ H.b. , r. 100.

²⁸⁰ H.b. , r. 152.

²⁸¹ Uzun, h.b. , r. 42.

²⁸² H.b. , r. 43.

²⁸³ H.b. , r. 43.

²⁸⁴ H.b. , r. 92.

²⁸⁵ War, Tehar û Zeharê, r. 39.

Di mînaka me ya jor de nirxa merhemetê bi nirxên wek qencî û bexşandinê re rasterast û bi awayekî şîretkî hatiye dayîn.

“... Dilê xwediyê qantirê bi halê wê şewitî.”²⁸⁶

Erebê Şemo jî di romana xwe, Dimdimê, de li devereke tenê balê dikişîne ser vê nirxê:

“... Ev çi teba ye? Dîlkutan ne şuxulê mêranîyê ye! Meriv dikare dîl bikuje jî, wexta ku dîl bi te re ne rast be! Lê kutan ne şuxulê mêrxasan e. Her Rom û Îran tiştên wisa hov dikin!”²⁸⁷

Di vê mînaka me ya jor de nirxa merhemetê rasterast derbas nabe lê em ji hin nîşaneyên wê fêhm dikin ku merhemet e. Mirovên xwedî merhemet li hember dîlan bi helwesteke nerm nêzîk dibin û zerarê nadin wan ku em di mînaka xwe de jî vê noqteyê dibînin. Di vê mînakê de tişteke din a balkêş ev e: Muqayesaya tevgerên kurd, rom û îranîyan ên li hember dîlan derdikeve pêşîya me. Li gor nivîskarî, kurd li hember dîlan hovîtîyan nakin lê yên van hovîtîyan dikin rom û îranî ne.

Di romana Ristemê Zal de li çend deveran nirxa merhemetê hatiye bikaranîn:

“... Keko, bila piçekî rehm di dilê te de hebe. Ez dibînim ku dilê te êdî reş bûye. Ji Xwedê bitirse. Xerabiyê bi gel neke!”²⁸⁸

“... Kawûs got: Here bila riya te vekirî be, dilê te bi şifqet be!”²⁸⁹

“... Mafîr ku tu xalib î, divê tu xwîna bêşûc û masûman nerijî. Dilê Ristem bi wan şewutî, heq da wan, hest û ramanên wan fêhm kir.”²⁹⁰

Di romana Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim de jî ev nirx rastî me hatin ku bi vî awayî ne:

²⁸⁶ H.b. , r. 61.

²⁸⁷ Şemo, h.b. , r. 220.

²⁸⁸ Polat, h.b. , r. 92.

²⁸⁹ H.b. , r. 167.

²⁹⁰ H.b. , r. 272.

“... Me bi dijminatî kuştin, em dê bi dostanî veşêrin. Bila meytên wan li erdê li ber teyr û tûran, li ber mişk û maran, li be kêzik û mêşan nemînin.”²⁹¹

“... Efer ji hevalên xwe yê nezîk re got: “Bi şûn de vekîşin, dijminê me ye, hema birîndar e, bi vî halî êsîrê me ye, divê em wî biparêzin. Wî xelas bikin.”²⁹²

Di Siyabend û Xecê de jî ev nirx li deverekê derbas dibe ku bi vî şiklî ye:

“... Siyabend nerî ku zilam digrî û wek baranê hêsiran dibarîne. Giriye Siyabend ji yê zilam bêtir hat, ji zilêm re got: Rabe ser xwe, te agir bi kezêba min xist. Heger ku te qala zarokên xwe nekiriba min ê tu kuştuba.”²⁹³

Di romana Evîna Pinhan a Sabrî Akbel de jî li devereke tenê ev nirx hatiye bikaranîn:

“... Dayê di xizmeta xwe de qurretî nedikir. Bi şefqet û bi merhemet bû.”²⁹⁴

Di romana Bilîcanê de jî li devereke tenê bi vî awayî hatiye bikaranîn:

“... Em dizanin ku tu serekcerdî. Ev çend roj li ser re bihorîne, lê hê kesek ji êla we nehatine û termên kuştîyên we nebirine. Term hemû li ber germayê xerab bûne. Lawo em hevhesîne. Hevhesîyan her li berê da mêr ji hevdu kuştine. Eger destûra te hebe, bila çend kes herin û termên kuştîyên we bînin û hema li nav goristana me da çal bikin. Bila her terman li vir bispêrin axê.”²⁹⁵

2.11. MÊRXASÎ

Mêrxasî, di WikiFerhengê de, di wateyên wek egîdî, qehremanî, pelewani, wêrekî, bistehî, cesûrî, bêtirsî, zîrekî, fêrisî, çelengî de hatiye bikaranîn.²⁹⁶ Yek ji nirxên me yê civakî jî mêrxasî ye. Taybetîyeke vê nirxê ew e ku di nav nirxên ku me di romanên folklorîk de tesbît kirî de ya herî zêde hatiye bikaranîn e. Ev nirx hema bêje di hemû romanên me yê folklorîk de derbas dibe. Em vê nirxê di

²⁹¹ Kiran, *h.b.*, r. 148.

²⁹² *H.b.*, r. 273.

²⁹³ War, *Siyabend û Xecê*, r. 63.

²⁹⁴ Akbel, *h.b.*, r. 11.

²⁹⁵ Cîhanî, *h.b.*, r. 243.

²⁹⁶ WikiFerheng, <https://ku.wiktionary.org/wiki/m%C3%AArxas%C3%AE>, 09 Tebax 2019.

destanên xwe yên qehremanîyê, di efsaneyên xwe û di çîrokên xwe yên gelêrî de jî li gelek deveran dibînin. Em ê li jêr, nirxên mêrxasîyê yên ku me di romanên xwe de tesbît kirine yek bi yek rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de em li gelek deveran rastî vê nirxê tîne ku bi vî awayî ne:

*“... Merxasî û şervaniya Ehmed bala wî kişand. Heval û hogirên xwe gişt ser hespa avêtin xwar.”*²⁹⁷

Di mînaka me ya jor de nirxa mêrxasîyê rasterast derbas dibe û yek ji nîşaneyên vê nirxê hatiye dayîn. Kesên mêrxas bin, dikarin hevalên xwe ji ser hespî bavêjin xwarê.

*“... Dibe herêma Bahdîna, Botan û Hekaryan de çar zilamên mîna Ehmed egîd peyda nebin.”*²⁹⁸

*“... Tîrsa wî niha de ketiye singê hemî neyar û dijminên me.”*²⁹⁹

Di vê mînaka me ya jor de nirxa mêrxasîyê rasterast derbas nabe lê em ji hin nîşaneyên wê fêm dikin ku ev nirx mêrxasî ye. Kesên mêrxas berî ku bikevin cengê tîrsê diêxin dilê neyar û dijminên xwe.

*“... Zilamekî mîna Ehmed egîd û mêrxwas ne meşîne nav agirî û derbeder neke.”*³⁰⁰

*“... Reşo jî di nav cindiyên Hekaryan de mêrxasekî kezeb pola û cengawer dihat nas kirin.”*³⁰¹

Di mînaka jor de, nirxa mêrxasîyê wek wesfekî hatiye dayîn ku ev wesif aîdê Reşo ye û hin nîşaneyên mêrxasîyê yên wek kezebpolâ û cengawerîyê hatine rêz kirin.

²⁹⁷ Colemêrgî, *h.b.*, r. 8.

²⁹⁸ *H.b.*, r. 10.

²⁹⁹ *H.b.*, r. 10.

³⁰⁰ *H.b.*, r. 11.

³⁰¹ *H.b.*, r. 28.

“... Ne zilamê revêyî. Min egîdiya te holên cengê de dîtiye.”³⁰²

“... Kuştin û mirin her dem yê ber kepî me ye. Kurê me êkane ye. Bi xwe jî xwîngerm e, mêrxwas e.”³⁰³

“... Bi kurtî Rustemê zamanî dihate nas kirin. Ser wê mêraniyê de hindî bêjî aqilmend, dijî zulmê, mêvanperwer û hevalê ketî û belengazan bû.”³⁰⁴

“... Gel dostên xwe dost, gel hemberê neyarê xwe jî dijminekî dijwar bû.”³⁰⁵

“... Ez li ber emrê mîrêmîran sekinî me. Amade me biçim mirinê jî.”³⁰⁶

“... Zilam û xortên mayî li gund wekî pilingên lata, cerdewanên bircên kelata hişyar û zêrevan bûn.”³⁰⁷

“... Çawan gurekî dev bi xwîn nav berxa dikeve, welê xudanên egalê bijikandin. Çi kolana ku bi ser de çû xwar, dijmin şikand. Yên kuştî kuştin, yê din jî bazdan û karê revînê kirin.”³⁰⁸

“... Mêrxwasî û cengewariya Ehmed cesaret da egîdên Yezîdiyan jî. Her wekî mertalekê bû li pêşiya wan berxwedaneke hişk û dijwar hate kirin.”³⁰⁹

“... Serê xeberan behsa mêrxwasî û cengaweriya Ehmed bû. Gelekan digotin ne bi desthildan û egîdiya wî ba ye, ew berxwedan nedihate kirin. Mal, rûmet û namûs bo Yezîdiyan nedima.”³¹⁰

“... Kesê destê xweşmêran negirtiye. Ger mêrekî baş î xwe biceribîne. Şêxmûsê Miho kir ku destê xwe bavêje xencera wî, pilingê çiyar xencera xwe hilkêşa,

³⁰² H.b. , r. 37.

³⁰³ H.b. , r. 59.

³⁰⁴ H.b. , r. 66.

³⁰⁵ H.b. , r. 66.

³⁰⁶ H.b. , r. 72.

³⁰⁷ H.b. , r. 102.

³⁰⁸ H.b. , r. 103.

³⁰⁹ H.b. , r. 103.

³¹⁰ H.b. , r. 104.

qevda wê ve dev û lêvên Şêxmûs û hevalên wî xwîné de sor kirin û êxistin ser berên nava hewşê.”³¹¹

“... Mêranî, hişyarî û zîrekvaniya wî çûbû guhên gelean.”³¹²

“... Şêrê deştê û pilingê çîyan.”³¹³

“... Ew mêranî, ew bawerî li te pîroz bit Cembelî.”³¹⁴

“... Bisekinin... hindî min bihîstî tîranîyê mêranî betal kiriye. Hem di qanûna me kurdan de nîne em heşt mirov biçin mirovekî. Ez û ew dê xwe li hevdû biceribînin. Ger wî ez kuştim, xwîna min li gerdana wî helal bit. Jixwe min ew kuşt, eve gihişte ya heqkirî.”³¹⁵

Di romana Rojek Ji rojên Evdalê Zeynikê de jî li çend deveran ev nirx hatiye bikaranîn:

“... Ma li dinê kesekî mîna Siyabend hebû, eger hebûya jî, Siyabend ê dinê lê bikira zîndan.”³¹⁶

“... Siyabendê Silîvî, fêriz û pelewane dinyayê, ji binê Sîpanê Xelatê, ji ser kem û çeçeman bi derîne.”³¹⁷

“... Osmaniyan piştta kurdan mist didan û wan mîna “egîd, fêris û canfedayên dewlet û xelkê” bi nav dikirin.”³¹⁸

“... Êzîdiyan bi mêranî li ber xwe dan û Bengîn û Meyro parastin.”³¹⁹

Di romana Tehar û Zeharê de jî ev nirx li cihekî tenê bi vî awayî derbas dibe:

³¹¹ H.b. , r. 146.

³¹² H.b. , r. 159.

³¹³ H.b. , r. 166.

³¹⁴ H.b. , r. 167.

³¹⁵ H.b. , r. 118.

³¹⁶ Uzun, h.b. , r. 53.

³¹⁷ H.b. , r. 54.

³¹⁸ H.b. , r. 62.

³¹⁹ H.b. , r. 126.

“... *Tehar ji nişka ve xwe çeng kir leşkerekî, ew li erdê xist. Rahîşt şûrê wî û êrîş bir ser leşkerên din! Li odeya Zeharê bû şîrqîna şûran. Tehar çend heb ji leşkeran avêt erdê, çend heb ji wan birîndar kir û çend heb jî ji wan kuşt!*”³²⁰

Di romana Dimdimê de -ku ew bixwe destaneke qehremanîyê ye- li gelek deveran nirxa mêrxasîyê derdikeve pêşîya me:

“... *Mêrxasiya Zoro Begê di nava Kurdan de ji zû ve eyan bû.*”³²¹

“... *Lê wan hemû caran jî, eskerê wî dihate qirê, Kurdan rev li eskerê wî dixist û pejmurde direviyan, diçûne Îranê.*”³²²

“... *Çima ew nizane di nava me de mêrxasî rewşa mêran e, lê ne tucarî, ne jî kirîn û firotan, ew ne mêranî ye.*”³²³

“... *Û ew di hemû şeran de wisa bi mêranî şer dikir û bi serfirazî ji şer vedigeriya dihat.*”³²⁴

“... *Birano lê xin, xweyîno lê xin, hev ra lê xin,*

Heyfa welat, jin-zarêd Kurdan hûn jê derxin.”³²⁵

“... *Ew ji mehekê zêdetir bû li Deşta Şemzînanê û li çiyayên wê, Kurdan eskerên Romê digirtin, dikuştin. Gelek eskerên Romê di vî şerî de qir kirin, herçî mayîn jî reviyar.*”³²⁶

“... *Em ê van rojan rastî dijmin bîn, wê çaxê ez ê mêraniya we lawed Kurdan bibînim!*”³²⁷

“... *Wê hicûma Xano pergala eskerê Îranê şikênand û tirseke wisa kire nava wan, wekî hinek ji wan hespên xwe hiştin reviyar.*”³²⁸

³²⁰ War, *Tehar û Zeharê*, r. 104.

³²¹ Şemo, *h.b.*, r. 20.

³²² *H.b.*, r. 44.

³²³ *H.b.*, r. 95.

³²⁴ *H.b.*, r. 112.

³²⁵ *H.b.*, r. 143.

³²⁶ *H.b.*, r. 144.

³²⁷ *H.b.*, r. 166.

“... Ji hefteyekê zêdetir bû Xano bi eskerê xwe ve û Kurdên qijleyan ve eskerê Qulîxan li wan mêşeyan û gelîyan tîştîşî kiribûn û lê balete bûbûn, qir dikirin.”³²⁹

“... Lê carinan jî Şah Ebas dikete mitalan, wî pak dizanibû, wekî Xano mêrekî zor e, di şeran de jî delk e, dikare tiştêkî bîne serê Qulîxan û esker.”³³⁰

“... Lê wan rojan li dorberê Çîyayê Dimdimê eskerê Kurdan, bi serkarîya Xano, di mêşe de eskerê Îranê pirtîpirtî kiribû, qir dikir.”³³¹

“... Xanoyê Çengzêrîn eskerê me qir kir. Ji binê her kevirekî derdiketin, ji binê her darekê mîna pilingan xwe davêtine me, me qet nizanibû ji ku derdikevin. Esker giş tûrtela kirine li wan newalan, mêşe û gelîyan.”³³²

“... Di vî şerî de, Şebab dîsa mêraniyeke mezin nîşan da, wî werîsê xerboqekirî avête stûyê zabitekî wan û kaş kir bir.”³³³

“... Gelek caran ketibû nava şerên giran, di wan şeran de, çend caran mêrxasî jî kiribû. Di nava eşîra wan de ew naskirî bû, çawa xortekî amîtam, bêtirs, bi dil û ceger.”³³⁴

“... Ê hazir em mirin ji vî halî çêtir e, hata yek ji me sax be, gerek em şer bikin.”³³⁵

“... Lê ji bo kê ev sîleh dane çêkirinê? Ne ji bo rojêke wiha û ji bo me! Tu dixwazî wekî eskerê Îranê mîna par bê, dîsa me qir bike? Ez hatime, wekî heyfa xwe ji eskerê Îranê hildim!”³³⁶

“... Xano ji zû de texmîn kiribû mêrxasiya Şebab, bêtirsiya wî û camêriya wî, lewma wî ji Şebab hez dikir.”³³⁷

³²⁸ H.b. , r. 173.

³²⁹ H.b. , r. 174.

³³⁰ H.b. , r. 175.

³³¹ H.b. , r. 176.

³³² H.b. , r. 176.

³³³ H.b. , r. 193.

³³⁴ H.b. , r. 200.

³³⁵ H.b. , r. 201.

³³⁶ H.b. , r. 206.

“... *Wê lêxistina ji nişkê ve eskerê Îranê bi cinan xist; hinekan xwe şaş kir, tirsîyan, nizanibûn ev şipûk bû bi ser wan de hat. Bû nalenala birîndaran.*”³³⁸

“... *De lê xin, Xwedê vê sibeha ezîz min bi qurbana we bike, lê xin, heyrana we me, wisa lê xin, wekî ew tobe bike, êdî ber bi Kurdan neyê!*”³³⁹

“... *De Cewzo ez êdî te dibînim, min guman heye tu mêraniya xwe dîsa bikî!*”³⁴⁰

“... *Gerek bê gotin, Cewzo mêrxasekî wisa ye, kêmasiya wî tune. Çend caran ketibû taleya eskerê Îranê, lê ji wan taleyan her car bi mêrxasî derdiket, eskerên wan qir dikir û nedihîşt tu derb bigihîjîne wî, nedihîşt eskerê wî qir bibe. Mexlûqet digot: “Lewma Cewzo mêraniya wisa dike û derb li wî nakevîn, çimkî wî kapa guran bi binê kincê xwe ve, bi ser kevçika dilê xwe de dirûtiye.*”³⁴¹

Di vê mînaka me ya jor de jî nirxa mêrxasîyê rasterast hatiye dayîn. Pesinê mêrxasîya Cewzo hatiye dayîn û tevgerên wî yên mêrxasîyê hatine rêzkirin ku ev hemû nîşaneyên nirxa mêrxasîyê ne.

“... *Lê wî di gelek caran de mil dabû Xano û pê re mêranî kiribû.*”³⁴²

“... *Bibêje Şah Ebas, heke ew van giliyên min qebûl neke û ji me venegere, ez ê şer bikim heta ku merivekî min jî sax be.*”³⁴³

“... *Rast e, eskerê Îranê li vir zahf e, lê Kurdan qurfeke wisa kiriye dilên wan, gava ku dibêjin Kurd, tirs dikeve nava dilên wan.*”³⁴⁴

“... *Wexta ku dibe şer, mirov qet nizane ew ji ku derdikevin! Hema mîna teyrokê bi ser me de tîran dibarînin û bi şûr û mertalan li me diqelibin. Serên eskerên*

³³⁷ H.b. , r. 209.

³³⁸ H.b. , r. 226.

³³⁹ H.b. , r. 227.

³⁴⁰ H.b. , r. 227.

³⁴¹ H.b. , r. 228.

³⁴² H.b. , r. 229.

³⁴³ H.b. , r. 233.

³⁴⁴ H.b. , r. 236.

me yên kuştî bi baran bi ser me de hol dikin. Weleh ez bi Hezretî Elî kim, hebûne roj wekî di gelîyan de xwîna eskerê me mîna kişîyaye.”³⁴⁵

“... Carinan di qehwexaneyan de, kalên ku gelek caran li hemberî Şahê Îranê û Padîşahê Romê şer kiribûn, qise dikirin çawa Kurdan bi mêrxasî şer dikir li dijî dagirkeran.”³⁴⁶

“... Wî carinan şevê esker hildida, digot: “Em herin nêçîrê.” Û her cara ku ew diçû, wî erhedê eskerê Îranê qir dikir. Şevê jî, tirsê Kurdan ketibû dilê wan.”³⁴⁷

“... Lê keçno, ez çî bibêjim, hûn dibînin çî wext e, hûn gerek li ber mêran namûsa jina Kurd nexin erdê!”³⁴⁸

“... Ez ji we gişan razî me, we sozên ku dabû cimaetê, wekî hûn ê şer bikin, we bi namûs qedand û bi mêrxasî şer kir.”³⁴⁹

“... De gidîno, bikin bilezînin,

Barûtê zû ji çelan derînin,

Kela Dimdimê hemû bihedînin,

Bila dijmin bibînin teslîma me tunînin...”³⁵⁰

“... Qurfa tirsê mêrxasiya Xano ketibû dilê Serdar Xan jî.”³⁵¹

Di romana Mem û Zînê de jî li çend cihan ev nirx bi vî şiklî hatiye bikaranîn:

“... Beglî gurekî mêra bû. Gava ku hêrs dibû ne ti pel dixwend ne jî ji ti zimanî fêr dikir.”³⁵²

³⁴⁵ H.b. , r. 237.

³⁴⁶ H.b. , r. 245.

³⁴⁷ H.b. , r. 248.

³⁴⁸ H.b. , r. 250.

³⁴⁹ H.b. , r. 256.

³⁵⁰ H.b. , r. 256.

³⁵¹ H.b. , r. 257.

³⁵² War, Mem û Zîn, r. 20.

“... Fermanê bide Siltanê min, ez ji bo te kîjan taxa bajarê Mixribê xera bikim, serê çend kesan ji laşê wan hilqetînim, malê kê talan bikim, warê kê wêran bikim!”³⁵³

“... Kî xwe mêr dihesibînin bila pêşiyê li me bigre, ew ê bi çavên serê xwe bibînin bê derbê mêran çawa ne!”³⁵⁴

“... Ez sozê didim te ku ez ê dahwa te bi kurmancî û bi zora şûr biqedînim.”³⁵⁵

“... Tu zanî ku ez celadê mêra me. Nav û dengê min li heft welatan belav bûye. Dinya û alem dizane ku tirsê min ji kesî û tiştêkî tune ye. Ez bi vî şûrê xwe yê qetlê cendekê lawê bavan li erdê dirêj dikim.”³⁵⁶

“... Kuro ma qey tu min nasnakî, ez Hesên im Hesên! Salê carekê ez deqê şahê ecem dixînim! Ji tirsê û xofa min a giran berî ku derba min bigihîje wan ziravqetyayî dibin û dimrin. Bi tena serê xwe li hember artêşan disekinim, wan bi şûn ve dişînim! Ruh ji şahê ecem distînim. Ma tu dîn î ku ez peyva xwe bixwim û karê xwe neqedînim! De ka bêje kuro, qey tu min nasnakî ha?! ”³⁵⁷

Di romana Ristemê Zal de, ku ew bixwe destaneke qehremanîyê ye, gelek nirxên mêrxasîyê derdikevin pêşiya me ku bi vî awayî ne:

“... Ji bav û kalan ve em pêhlewana in; xelkê heta îroj xwe avêtîye tor û bextê me!”³⁵⁸

“... Tu leheng î, mêr î,
Ji maleke têr î,
Mîna şêrê nêr î,
Ji axa zêr î.”³⁵⁹

³⁵³ H.b. , r. 39.

³⁵⁴ H.b. , r. 69.

³⁵⁵ H.b. , r. 88.

³⁵⁶ H.b. , r. 108.

³⁵⁷ H.b. , r. 110.

³⁵⁸ Polat, h.b. , r. 12.

“... Di nava suwarî û pêhlewânên Zabilê de mêrxasekî mîna wî nîn e.”³⁶⁰

“... Gava dikeve şer û cengê,
Dûman radike ew ji erdê,

Kela dil bi xwîné divemirîne
Li çar alî rim û xencer dibarîne

Ew xortekî pir bi nav û dengî ne,
Ji xeynî pora sipî tu qusura wî nîn e.”³⁶¹

“... Dem û dewran, hêja ji mêrxasekî wuha kezzepola re nebûne şahid.”³⁶²

“... Mîrê min! Tu ji maleke têr î, ji axa zêr î! Kesek mîna bavê te bi nav û deng nîn e. Û tu kes weke te cegerpola û bi dest û pê jî nehatiye dunê.”³⁶³

“... Me şêrekî mêr wulo,

Nedît hetanî îro

Serî sipî, rû jî sor,

Bejna wî dara bi çilo”³⁶⁴

“... Mêrxasekî wulo wê jê dere ku, bi şûrê xwe dê dunyayê bihejîne.”³⁶⁵

“... Ew’ê textê xwe vegire li ser ewran,

Ne Tûran dihêlê, ne Mazenderan,

³⁵⁹ H.b. , r. 26.

³⁶⁰ H.b. , r. 31.

³⁶¹ H.b. , r. 31.

³⁶² H.b. , r. 35.

³⁶³ H.b. , r. 36.

³⁶⁴ H.b. , r. 38.

³⁶⁵ H.b. , r. 45.

Dijmin wê ji ber wî bike elaman!

*Ew dê bibe pêhlewane axirê zeman.*³⁶⁶

*“... Ew dê dîroka welatê me ji nûh ve binivîse. Li welatên Rûm û Hindê, li Çîn û Maçînê navê wî dê li ser mohran bikolin.”*³⁶⁷

*“... Neyarên wî, wê bi bêhna xwêdana mûyên hespê wî bifetisin. Teyrê baz jî wê jê bitirse, wê newêrîbe di ser serê wî re bifire. Fêrisek wusa wê jê derê ku, kesek nikaribe milê wî deyne.”*³⁶⁸

“... Laab im ez, bavê Ab û Neynokdirêj im!

Şev û roj kilamên şer û cengê dibêjim,

Bêşûr û rim, gurz û mertal gahv navêjim

*Di cengê de dîn û har im xwîn dirêjim!..*³⁶⁹

Di mînaka me ya jor de nirxa mêrxasîyê rasterast derbas nabe lê em hin nîşaneyên wê dibînin. Qehremanê me Laab bi awayekî helbestkî pesnê mêranî û mêrxasîya xwe dide û hin nîşaneyên mêrxasîyê yên wek “*di cengê de dîn û har im*” bi rêz dike.

*“... Bûye mêrxasekî kezepola, bi baz re difire, bi xezalê re dibeze.”*³⁷⁰

*“... Lo bavo! Tu hêja kurê xwe nas nakî! Ez karim bi şêran re bipevçim.”*³⁷¹

*“... Min şûrê xwe ji serê wan re tûj kiriye. Ew dê serî li ber min bitewînin!”*³⁷²

³⁶⁶ H.b. , r. 45.

³⁶⁷ H.b. , r. 45.

³⁶⁸ H.b. , r. 55.

³⁶⁹ H.b. , r. 73.

³⁷⁰ H.b. , r. 75.

³⁷¹ H.b. , r. 83.

³⁷² H.b. , r. 84.

“... *Hûn min nas nakin lo! Ez kurê Sam im, mêrê ku li ber min rabe, ez eniya wî bi buhusta dipîvim! Li hember min, ha pêhlewane Tirk Hazervan, ha çengek axa sar!*”³⁷³

Di vê mînaka li jor de jî nirxa mêrxasîyê rasterast derbas nabe lê em ji hin tevger û nîşaneyan fêhm dikin ku ev nirx mêrxasî ye. Qehremanê me behsa mêranîya xwe dike û serî li hember pêhlewane tirk, Hazervan, radike. Bi gotinên xwe yê tûj dixwaze çavê wan bitirsîne û tirsê biêxe dilê wan.

“... *Ya pêhlewane egît û mêrxas! Di nav vî gelî de, mirovê herî jêhatî, wêrek û leheng tu yî.*”³⁷⁴

“... *Roj roja şer e, ne ya kêf û dawetê ye bavo! Ger ez piştta gelek pêhlewanan nedim erdê, bila xwîna te li min heram be!*”³⁷⁵

“... *Ez dê axa welatê Tûranê bi simên hespan bieçiqênim û pozê rima xwe di heyvê de biçikînim!*”³⁷⁶

“... *Pêhlewane serdar Mînas e,*

Çepildirêj e, egît û mêrxas e,

Gir e, giran e weke risas e.”³⁷⁷

“... *Ez Mînas im, egît û gernas im,*

Bi rim û şûr, bi gurz, tîr û das im.”³⁷⁸

“... *Ger ku mêr be, bila were min bi darê zorê bibe û bike seyisê hespê xwe. Ji wî û bavê wî zêde ye!*”³⁷⁹

“... *Xwedê kirî ku mêrxasekî mîna te serî di min re deranî û min xilas kir ji destê wan.*”³⁸⁰

³⁷³ H.b. , r. 88.

³⁷⁴ H.b. , r. 94.

³⁷⁵ H.b. , r. 95.

³⁷⁶ H.b. , r. 95.

³⁷⁷ H.b. , r. 101.

³⁷⁸ H.b. , r. 104.

³⁷⁹ H.b. , r. 104.

“... Ez kê me lo! Bijenê xwarziyê Ristemê Zal im! Ez wuha diçirînim devê pêhlewaniyê mîna te! Ez mêran di mala wan de wuha wesle wesle dikim!”³⁸¹

“... Ristemê Zal li meydanê bûye mîna gurê hare,
Hezar pêhlewaniyê lê civiyane, lê kesek pê nikare!”³⁸²

“... Ristem bi gurzê xwe yê di şiklê serê ga de, li Tûraniyan dixist û wan mîna pelên darên payîzê ji ser hespan diweşand erdê.”³⁸³

“... Rûyê erdê di bin şûrê min de dilerize. Gava ez şûrê tazî hildim jor, deriyê hemî welatan dê vebibe li ber min.”³⁸⁴

“... Ez im neviyê Teyra Sîmir, kurê Zalê kal. Ordîyan belav dikim, pêhlewaniyê radixim li erdê.”³⁸⁵

“... Te di temenê xwe de ewrê zîpikê dîtîye gelo? Ez ew im û rim û şûr û tîran dibarînim. Seriyên digindirînim ser axê. Ger ez navê xwe bêjim, xwîna dilê te wê bisekine. Ez Ristemê Zal im. Sibehê, diya te ya reben wê kefenê te bibire û şînê girêde!”³⁸⁶

“... Ew paşayê welatê Nîvrojê, kurê Zalê Zêrîn e. Kesekî mîna wî xweşmêr nehatiye dunê.”³⁸⁷

“... Bê eslno! Ez Guya me, pêhlewaniyê ku wê li ber min rabe, hêja ji diya xwe çênebûye. Kî dikare avê bike toz, ew bila derê pêş!”³⁸⁸

“... Ristemê Zal di nava cendekan û nalîna birîndaran de, bi şûrê ruhsitên rê ji xwe re vedikir. Her carekî ku şûr dihejand, ji nav dêwan qêrîn û hawar bilind dibû.

³⁸⁰ H.b. , r. 111.

³⁸¹ H.b. , r. 116.

³⁸² H.b. , r. 123.

³⁸³ H.b. , r. 126.

³⁸⁴ H.b. , r. 130.

³⁸⁵ H.b. , r. 140.

³⁸⁶ H.b. , r. 143.

³⁸⁷ H.b. , r. 160.

³⁸⁸ H.b. , r. 161.

Bi her derbeyek şûr dihejand, ji nav dêwan qêrîn û hawar bilind dibû. Bi her derbeyek şûr, deh serî digindirîn. Bi hêza gurzê wî, dilê ezman parçe parçe dibû.”³⁸⁹

*“... Te mêranî û cengaweriya xwe nîşan da. Bi saya te, ez ghiştim text û paytextê xwe.”*³⁹⁰

*“... Ez bi mohr û gustîla Şahê Îranê, nanê Qela Zabilê kim, ez dê welatê Hamawêranê ji destê yekî mîna te zalim û bêbext xelas bikim! Ez dê te li meydana herbê, mîna çivîka şîşê bipirpitînim!”*³⁹¹

*“... Egîtên mino! Şêr û pilingên mino! Lawo, îroj roja cengê ye. Min bi destê xwe mîna bav we mezin kir hûn jî do rojek wuha de karibin dijminan di bin şûr re derbas bikin. Dem dema hêz û qewetê, roj roja namûsê ye! Nerevin, di ber xwe bidin, hetanî şer li dar be, serî pêl nekin. Cîhanê li serê Kawûs bikin tara bêjîngê!”*³⁹²

*“... Yek pêhlewaneke me, bi du hezar mêrên wan e.”*³⁹³

*“... Tu zanî ku cihê Ristem lê hebe, artêş feyde nake! Ez û Gîw besî we ne.”*³⁹⁴

*“... Ez qehremanê vî gelî me. Li hember min ne Tûsê bêtirs, ne Gîwê bi nav û deng, ne Behramê Hêç, ne jî Zenge û Guraze dikarin serî hildin. Ew li ber çavê min ne qurtek qimiz in! Ferman bide, tan û niça li min nexe, tê bibînî ez dê çewa seriyên di ber milan de bifirînim! Tu dê li ber çavê xwe bibînî, ez dê çawa heyva wan ya siûdê di bin ewrên reş û tarî de veşêrim!”*³⁹⁵

*“... Gava Tirk ala min bibînin, ew agir bin jî li ber pêlên min nikarin rawestin. Dawet dê li wan bibe şîn.”*³⁹⁶

³⁸⁹ H.b. , r. 163.

³⁹⁰ H.b. , r. 166.

³⁹¹ H.b. , r. 169.

³⁹² H.b. , r. 175.

³⁹³ H.b. , r. 182.

³⁹⁴ H.b. , r. 183.

³⁹⁵ H.b. , r. 184.

³⁹⁶ H.b. , r. 205.

“... Ez sond dixwim bi sonda tamam, bi serê Keykawûsê Keyanî, hetanî ez li ser rûyê vê erdê bim, ji Tirkan, paşa an jî kole, ez kesekî zindî nahêlim! Kî ji wan têkeve destê min, ez dê serê wî jêkim û eniya xwe jî naqermiçînim.”³⁹⁷

“... Ez im yê ku bi gurzê giran dil û cegera dêwên Mazenderanê parçe parçe kir. Min ne leşker divê, ne jî çek. Ez tenê bes im.”³⁹⁸

“... Ez Ristemê Zal im, dê qirra Tûraniyan bînim. Ez dê tenê kesên ji diya xwe nebûyî bihêlim li ser vê axê.”³⁹⁹

Di romana Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizek û Rim de jî tivavek nirxên mêrxasîyê derdikevin pêşîya me ku bi vî awayî ne:

“... Kero tu kî û ez kî me, te ez nas kirim! Ez kilê çavê Edûla gulîmor im. Hûn hetanî niha li guherên bêkopek geriyane. Ez şêr im we bi çavên serê xwe dît.”⁴⁰⁰

“... Navê Dewrêş hergî diçû di nav eşîran de bi pêş de diçû. Dêngê mêrxasî û mêraniya wî, lez û beza wî, qeweta wî çavên mirovan tije dikir.”⁴⁰¹

“... Şerqîyan xwe di ber Milan de didan kuştin, rûmeta wan ji hêla mêraniyê de zêde bû. Ji hêla merivantiyê de bêqusur bûn.”⁴⁰²

“... Ên ku ji min diqeherin, ji min hez nedikirin bûne sosret, pozê wan şikestî ye, bila hebekî din bihetikin û ez ê herim bi talankeran re cengê bikim. Ez ê herim bi çavên serê xwe bibînim, ez ê artêşa neyaran mîna çêlkewan bela bikim, mezinê wan bibim li Mandelê Deveyan mexel bikim.”⁴⁰³

“... Ez ê herim Qerejdaxê. Mêranî çawan e ez ê rêyî dost û neyaran hemûyan bidim.”⁴⁰⁴

³⁹⁷ H.b. , r. 258.

³⁹⁸ H.b. , r. 320.

³⁹⁹ H.b. , r. 331.

⁴⁰⁰ Kiran, h.b. , r. 136.

⁴⁰¹ H.b. , r. 150.

⁴⁰² H.b. , r. 157.

⁴⁰³ H.b. , r. 186.

⁴⁰⁴ H.b. , r. 188.

“... Dewrêş got: “Bila be Apo, hûn meraq mekin, bi qudrê Xwedê emê wan poşman bikin, ew ê êdî tu caran li ber koçerên Milan, li ber Kurmancan, li ber Kurdan artêşan li dar nexin. Em ê wan belabelayî bikin, bila careke din pişta wan serrast nebe.”⁴⁰⁵

“... Di şer de şûr bi kar anîbû. Şûrê wî tûj bû û bi hêl li kê xistibû, biribû du cihan. Her sê peyayên Şemiran bi ser hev de parçe parçe kiribûn. Loma jê re digotin ‘qesabê mêran’.”⁴⁰⁶

“... Îro roja mêraniyê ye, bi hev re mirin heye, bêyî hev weger tune ye.”⁴⁰⁷

“... Dinê zane û hûn jî zanin, Kurd cara û cara heyfa xwe ji kesî re bernadin. Xwîna wan çiqas birije ewqas şêrgîn dibin.”⁴⁰⁸

“... Çîlo hetanî nîvro nêzîkî bîst sî peya ji dar de xistin. Mîna Rustemê Zal şer dikir.”⁴⁰⁹

“... Bi wan re tirs tune bû, girî jî tune bû, gilî û gazin tew tune bû. Mêranî navê wan ê bingehîn bû.”⁴¹⁰

“... Wexta şûrê Dewrêş li hewa dilîst, hem hespan hem raqîbên wî xof digirtin.”⁴¹¹

“... Kose Weys got: “Gelî serekên eşîran, şêxan û şûxan, Dewrêşê Evdî em giştik nas dikin, kurê Evdê Milhim, mêrxasê Ekrad bi nav û deng e, hetanî niha jêhatbûna xwe û mêraniya we îspat kiriye, bi sedan mêrên me kuştin. Wexta siwarên me didin ser pişta wî, ew du sêkan dikuje, wexta ew dide ser pişta siwarên me dîsa sê çarekan dikuje. Mînanî şêrekî birîndar e. Derbên wî pê re cih dibînin. Em ê nikaribin derbeke kuştinê lê bidin.”⁴¹²

⁴⁰⁵ H.b. , r. 208.

⁴⁰⁶ H.b. , r. 209.

⁴⁰⁷ H.b. , r. 248.

⁴⁰⁸ H.b. , r. 252.

⁴⁰⁹ H.b. , r. 259.

⁴¹⁰ H.b. , r. 260.

⁴¹¹ H.b. , r. 265.

⁴¹² H.b. , r. 266.

“... Dewrêş got: “Hedbênê delal bila tu dîsa ji min re rabe ser lingan, îcar ez ê qira talankeran bînim.”⁴¹³

Di romana Siyabend û Xecê ya Ronî War de jî nirxa mêrxasîyê têra xwe cih digirin ku bi vî awayî ne:

“... Siyabend got: De vaye gotineke û min ji we re got. Hûn niha qerf û henekên xwe bi min bikin! Kengî we derbê mêra dît hûnê wê çaxê fêm bikin!”⁴¹⁴

“... Bala xwe dayê ku Siyabend wek gurekî zozana ku dakeve bin germiyanê jêrîn û li keriyakî miha rast were ketiye nav keleşan! Keleş ji destê wî ketine emana Xwedê! Hin ji keleşan mirine û hinek ji tirsaruhê xwe zorê didin lingan û ji ber Siyabend direvin!”⁴¹⁵

“... Mîrze Beg ji xwe re got, sibhan ji Xwedê re ev gurî çî pêhlewana e, çî egîta e û çî felek û dewran li serê keleşên min qewimandiye!”⁴¹⁶

“... Gava ku gihastin nêzikî wî ew jî bi siwarî kete nava wan. Di ber kê re çû lahûr dawşand wan û ew ji ser hesp avêtin erdê. Keleşan nema zanîbûn bê çî bi serê wan de qewimî. Bala xwe danê digihêje kê dîkuje. Fêm kirin ku şexsê karibe pêhlewaniyê û şer bi Siyabend re bike tune. Keleşên sax mayî tevlî başbazirgan kerwan di cih de hiştin û reviyân!”⁴¹⁷

“... Min zanîbû ku pêhlewana û egîta di ser te re tune, ma qey ez belesebeb vî xatirî rê te didim. Siyabend! Tu mêrê mêra yî!”⁴¹⁸

“... Tirsaruhê wî ket dilê mirovan û hemû kesî hevza xwe kê kir!”⁴¹⁹

“... Tu jî tew ji xwe re dibêjî ez keleş im! Ew li xwe danîne ku bi yeka wek min re biştexile! Ew mêr û mêrxas e, keleşekî bi hezar keleşan e. Ma tu kî yî ku tu xwe bi wî re qiyas dikî, hew tu gurê feqîrê wek min î! Ji te heye ku tu zilam û mêrxas î?”⁴²⁰

⁴¹³ H.b. , r. 271.

⁴¹⁴ War, Siyabend û Xecê, r. 74.

⁴¹⁵ H.b. , r. 75.

⁴¹⁶ H.b. , r. 75.

⁴¹⁷ H.b. , r. 84.

⁴¹⁸ H.b. , r. 86.

⁴¹⁹ H.b. , r. 92.

“...Pîrê, ev şexsê ku tu dibêjî li ku ye?

- *Li serê çiyayê Sîpanê Xelatê, li hember behra Wanê ye, mêrê mêran, şêrê Xwedan ew e! Ma tu çi yî li ber wî?”⁴²¹*

“... Heta niha ti keleşan ti egît û pêhlewanan xwe li ber wî negirtibûn! Bi sedan keleş kuştubûn û bi sedan keleş ji tirsê ruhê xwe ji ber wî reviyabûn!”⁴²²

“... Ji bo xatirê Xwedê ev tu dîn î tu çi yî? Emrê min gihaştiye vê rojê, ez li ewqas deran geriyame hîna li kesekî wek te egît rastnehatime.”⁴²³

“... Tu çi dibêjî Qeregêtran? Bi soz û qerarên mêrê berê, heta ku ez neçim heyfa te hilneynim û dîsa Xecê ji xwe re neynim, xwarin û vexwarin li min heram e!”⁴²⁴

“... Hey gidî nemêrno! Necamêrno! Nemerddno! Ma qey qaweta we digihêje zilamekî girêdayî? Ka werin min gidî rezîlno! Îro xelasiya we ji ber devê lahûrê min tuneye, ez ê şûrê xwe têr bi xwîna we bişom!”⁴²⁵

“... Siyabend dîsa qêriya û got: Xwe bigrin nemerdno, ne min ji we re got xelasiya we ji destê lahûrê min nema! Ez ê îro we bikujim û bikim qurban ji Qeregêtranê Salê re!”⁴²⁶

“... Siyabend li ser piştê hespê xwe diqêriya: Heeeeeyt, ez Siyabend im wergî dîn im, wek pelên daran mirovan ji dara heyatê diweşînim! Xwe bigrin kûçikno! Ruhstîne we nemerda me îro!”⁴²⁷

“... Siyabend got: Ez Siyabend im! Siyabendê dîn im! Qeda serê sibê, bela êvarê me! Hûn zanibin ku îro xelasiya we kesî ji destê min tuneye! Heta ku ez heyfa

⁴²⁰ H.b. , r. 95.

⁴²¹ H.b. , r. 95.

⁴²² H.b. , r. 97.

⁴²³ H.b. , r. 100.

⁴²⁴ H.b. , r. 133.

⁴²⁵ H.b. , r. 136.

⁴²⁶ H.b. , r. 136.

⁴²⁷ H.b. , r. 137.

Qeregêtranê Salê ji we nestînim, cendekên we li wê ortê ji lawirên çolê re nehêlim û Xeca gulîsor ji xwe re nebim, heyat li min heram be!"⁴²⁸

*"... Siyabend her heft bira û donzdeh pismamê Xecê kuşt û pê ve keleşên mane çav berdane revê! Nerîn ku Siyabend qesabê mêra ye û şer pê re ne gengaz e, ruhê şêrîn berê wan da revê!"*⁴²⁹

Di romana Evîna Pinhan de ev nirx tenê carekê hatiye bikaranîn ku bi vî şiklî ye:

*"... Çend heb neyar berteref kiribûn. Ew wekî çemê Firatê bû. Tirsî wî li herkesî belav bibû."*⁴³⁰

Di romana Evîna Mêrxasekî de jî em li çend deveran rastî vê nirxê tînin:

*"... Di heyama xortaniya wan de, mêrên ku li ber mêrxasiyan wan serî netewandane hema bê nebûn. Di gelek şerên di navbera eşîra Begaran û Êzdiyan de Elî tu caran piştî Ereban nekiribû, her dem piştgirî dabû Milhim."*⁴³¹

*"... Di şer û talanan de, her tim li pêş siwaran bû. Hê di temenê ciwaniya xwe de bibû xwediyê gelek serkeftinan û gelek caran, dema ku qewimî, wî bi tena xwe talan vedigerandin."*⁴³²

*"... Li nava siwar û cengaweran, yê herî serkeftî û navdar Evdî bû."*⁴³³

*"... Bêrxê nêr ji bona kêr! Em mêrxas in, çavên Milan û Êzdiyan li me ne."*⁴³⁴

*"... Egîd heke hebin, ji bo şer hene û navê egîdiyê li meydana şer tê bidestxistin. Di şer de, mirin jî serkeftin jî heye."*⁴³⁵

⁴²⁸ H.b. , r. 137.

⁴²⁹ H.b. , r. 138.

⁴³⁰ Akbel, h.b. , r. 68.

⁴³¹ Osman, h.b. , r. 15.

⁴³² H.b. , r. 29.

⁴³³ H.b. , r. 73.

⁴³⁴ H.b. , r. 137.

⁴³⁵ H.b. , r. 137.

“... Li dewsa ku em birevin û heya sax bin bi sernizmî bijîn, bila em di şer de bi mêranî werin kuştin. Mirin ku ji bo xîret û namûsê be, bila serçavan were. Ez amade me.”⁴³⁶

“... Netirsin hevalino, em ê bibînin lehiya êgir, dijmin tarûmar bikin. Em ê bibin çemê Feret, wan di nava pelên xwe yên har de bifetisînin. Em ê xwe bikin gulok, wekî aşîte bi ser wan de herin.”⁴³⁷

“... Mêr û mêrxasan mil dane hev, tirsonek û bêbext gava ku çav bi egîdan ketin, bi ser dê û bavan de direvin, dilê wan kûzekûz e. De lêxin birano, lêxin egîdno, mêr û mêrxasno, lêxin mîna teyrên baz... Lêxin keleşên keleşan, cilê wan î bixwîn bi ser dayîkê wan bişînin, bila di her salvegera mirina wan de, li ber dîwaran bi ser de bigrîn, dilê wan bişewite.”⁴³⁸

“... Dewrêş berê xwe bida kîjan alî, her carê çend siwar bê ruh û can dihiştin. Di her êrişê de derdor di nava tozê de diman. Çavên dijminan jî ji Dewrêş şikiyabûn. Kî çav bi wî diket, direviya. Wî jî, bandora vê tirsê ku li ser dijmin çêkiribû didît, hê diwartir êrişê dikir.”⁴³⁹

“... Li gorî gotinan, wî li hemberî melkemot jî çavê xwe nediqurçand. Hêrs bibûya, hêsin bi sarî badida. Roj li nava rojê talan dianî, kesî nikarî li ber wî dest hilîne.”⁴⁴⁰

Di romana Perwîz Cîhanî ya bi navê Bilicanê de jî ev nirx li çend deveran bi vî awayî hatiye bikaranîn:

“... Bavê Silêmanî, Eliyê Mîrî peyî talanan ketibû. Mêrmêranî şer kiribû. Çend kes ji dijminan kuştibû û termên wan dagîrkerane li ser xaka pak velezandibû.”⁴⁴¹

“...Nav û dengê pehlewantiya Werdê li çar nîkarê Kurdistanê ra derbasî welatên dereke jî bibû. Nav û dengê wê li ber guçkên pehlewaniyê rom û ereb û eceman

⁴³⁶ H.b. , r. 138.

⁴³⁷ H.b. , r. 140.

⁴³⁸ H.b. , r. 142.

⁴³⁹ H.b. , r. 153.

⁴⁴⁰ H.b. , r. 183.

⁴⁴¹ Cîhanî, h.b. , r. 16.

ketibû. Ewî navî her yek li xwazîkekê da şewitandibû. Navê Werdekê bibû pîrzika li ser zimanê xas û nasan. Werdê bibû xewin û xîyala pehlewanan. Êla Mîr Elî Siwaranî cînva bi serê Werdekê sûnd dixwarin."⁴⁴²

"... Serekpehlewani û mêrxasên mala bavê mi dêranê li dû cendê dikevin, şopa wan digerin."⁴⁴³

"... - Kerr û Kulikê Silêmanî pehlewani in.

- *Mêrxas in.*
- *Kiçê Xudê herdu jî pehlewani in.*"⁴⁴⁴

"... Mêrikan hema rastî jî mêrxas in. Gurên dev bixûn in. Mêrvehêr in. Pehlewani in. Mêr li ser pozê xwe re nedîtine û nabînin."⁴⁴⁵

"... Wan bi mêrxasî û pehlewani û xûnxoriya xwe ya li seranserê Kurdistanê da deng vedabûn. Ta wê rojê çi kesî navekî wisan dest nexistibû. Navê wan dilê her pehlewani û biwêrî dilerizand."⁴⁴⁶

2.12. MÊVANPERWERÎ

Nirxeke din a civakî mêvanperwerî ye ku cihê vê nirxê di civaka kurdan de gelekî pîroz e. Di civaka kurdan de qedir û qîmeteke zêde li mêvanan tê dayîn û mazûvan xizmeteke bêqisûr nîşanî mêvanên xwe dide. Mêvanperwerî di gelek destan, efsane û çîrokên gelêrî de jî derbas dibe. Em vê nirxê di romanên xwe yên folklorîk de, li gelek deveran dibînin. Em ê li jêr nirxên mêvanperwerîyê yên ku me di romanên xwe de tespît kirine rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de, li çend deveran em rastî vê nirxê tên ku bi vî awayî ne:

*"... Cihê mêvanan ser seran û ser çavan heye."*⁴⁴⁷

⁴⁴² H.b. , r. 97.

⁴⁴³ H.b. , r. 171.

⁴⁴⁴ H.b. , r. 233.

⁴⁴⁵ H.b. , r. 318.

⁴⁴⁶ H.b. , r. 337.

Di vê mînaka li jor de nirxa mêvanperwerîyê rasterast derbas dibe û em di vê mînakê de qedirdayîna li mêvanan dibînin ku em di jîyana rojane a kurdan de jî vê nirxa civakî gelek caran dibînin.

“... Xasiyetekî Mîr Yezdan jî ew bû ku beriya xwarinê û vexwarinê tu pirs ji mêvanan nedikirin. Eve kurm û kevneşopiyekî mêjû bû di nav eşîrên çiyayî de.”⁴⁴⁸

Di vê mînaka me ya jor de nirxa mêvanperwerîyê rasterast derbas nabe, em ji hin nîşaneyan fêhmî dikin ku ev nirx mêvanperwerî ye. Mîr Yezdan berî xwarinê û vexwarinê tu pirsan ji mêvanên xwe nake. Ewil qedrê mêvanên xwe digire û comerdîya xwe nîşanî wan dide paşê sedema hatina wan dipirse. Wek ku di mînaka me de jî derbas dibe ev di nav eşîrên çiyayî de kevneşopîyeke ji berê de ye ku ev hemû nîşaneyên nirxa mêvanperwerîyê ne.

“... Çi roja hûn tîn ser serê min ser çavên min bihên. Ez êl û urbanê xwe ve li ber emrê Mîrêmîran sekinî me.”⁴⁴⁹

“... Dîwana Şêx Xelef tu caran vala nedima.”⁴⁵⁰

“... Qedr û qîmetek baş jê re girt. Mêvanperweriyekî layiqê wî nîşan da.”⁴⁵¹

“... Mêvan mêvanê Xwedê ne. Ser seran û ser çavan bîn.”⁴⁵²

Di vê mînaka me ya jor de jî mêvanperwerî rasterast hatiye dayîn û ev hevok bûye hevokeke ji rêzê û rojane ku em di jîyana kurdan de gelek caran rastî vê hevokê tîn.

“... Berî şîvê tu pirsan ji mêvanê xwe nekirin.”⁴⁵³

“... Tu ser serê min û babê min hatî Cembelî.”⁴⁵⁴

⁴⁴⁷ Colemêrgî, *h.b.*, r. 39.

⁴⁴⁸ *H.b.*, r. 63.

⁴⁴⁹ *H.b.*, r. 88.

⁴⁵⁰ *H.b.*, r. 96.

⁴⁵¹ *H.b.*, r. 138.

⁴⁵² *H.b.*, r. 150.

⁴⁵³ *H.b.*, r. 151.

⁴⁵⁴ *H.b.*, r. 166.

“... *Wey tu ser serê min, ser çavên min hatî Binevş Xatûn. Bi xêr û xweşî hatî.*”⁴⁵⁵

Di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de Mehmed Uzun bi vî awayî cih daye vê nirxê:

“... *Tu bi xêr û xweşî hatî. Te em dilşad, mala me şên, daweta lawê min geş kir.*”⁴⁵⁶

“... *Lê Evdal û Gulê bernedidan ku ew li malê bisekinin. Ew bi şev û roj li mala Evdal bûn.*”⁴⁵⁷

“... *Evdal û Gulê mêvanên xwe ezimandin û di qedr û qîmetê de kêmanî û qusûr nekirin. Sê roj, ji hal û hewalên wan, rewş û tevgera dinê pê ve, Evdal tu tişt ji wan nepirsî.*”⁴⁵⁸

“... *Mêvanên min ên ezîz û qedirgiran, hûn dizanin, li ba me kurdan, heqê mêvaniyê sê roj e. Ji sê rojan bi şûn de, mêvan jî dibe xwediyê malê û daxwaz û gotina xwe dibêje.*”⁴⁵⁹

“... *Merivên wê derê mêvanperwer û merivên yekane ne.*”⁴⁶⁰

“... *Gava karwanê Bengîn û Meyro gihişte Şengalê, êzîdiyan qedir û qîmeteke mezin dan Bengîn û Meyro û ew bi dil û can ezimandin.*”⁴⁶¹

“... *Bila ew were, bibe mêvanê me, em keç û lawên xwe ji bo wî serjê bikine, lê em nikarin mêvanên xwe bidine.*”⁴⁶²

Di romana Dimdimê de jî em li çend deveran bi vî awayî rastî vê nirxê tên:

⁴⁵⁵ *H.b.*, r. 190.

⁴⁵⁶ Uzun, *h.b.*, r. 29.

⁴⁵⁷ *H.b.*, r. 97.

⁴⁵⁸ *H.b.*, r. 110.

⁴⁵⁹ *H.b.*, r. 111.

⁴⁶⁰ *H.b.*, r. 116.

⁴⁶¹ *H.b.*, r. 122.

⁴⁶² *H.b.*, r. 125.

“... *Qurban, bi qaydeyê me eşîran: “Berê nanxwarin, paşê pirs û hewal dikin.”*”⁴⁶³

“... *Apê Qursût, kerem bike peya be, were kon. Çima wisa li ser piştta hespê sekinîyî?*”⁴⁶⁴

“... *Lewma jî, dîsa gişan zadê serê pêz çê dikirin û dişandine malên hev du, hev du teklîf dikirin. Lê mêvanên ku nan dixwar kuta dikir, wexta çûyîne mîna wan salên berê digotine xwediyê malê, “Ev mal şên be, gelekî, hezar carî zêde be pezê te, hebûna te.”*”⁴⁶⁵

“...*Xwediyê malê jî, digote wan:*

*Ev mal a we ye, hûn li ser çavan hatine, timî derê vê malê ji we re vekirî ye, hûn li ser çavên min hatine, bila pez û dewarê we jî, hebûna we jî zêde be.”*⁴⁶⁶

“... *Birawo, peya be, wiha ne pak e, tu mêvan î, hema nanekî, avekê...*”⁴⁶⁷

“... *Kirîvê Simon, tu mêvanekî me yê ezîz î, kerem bike here li jorê rûnê.”*⁴⁶⁸

Ronî War di romana xwe ya bi navê Mem û Zînê de li gelek deveran cih daye vê nirxê:

“... *Adetên welatê me jî hene. Ez ê ji te re yekê bibêjim, ew ji derdê te re derman e. Wexta ku mêvanek were ber deriyê wan, xwediyê malê bi xwe derdikeve pêşiya mêvan û bi rişma hespê wî digre. Heger mêvanek here ber derî û danekeve ji bo xwediyê malê eybeke pir mezin û giran e. Mêvan ji bo çi hatibin, xwediyê malê xwe dide ber barê wan, paşê mêvan dadikeve.”*⁴⁶⁹

⁴⁶³ Şemo, *h.b.*, r. 46.

⁴⁶⁴ *H.b.*, r. 92.

⁴⁶⁵ *H.b.*, r. 96.

⁴⁶⁶ *H.b.*, r. 96.

⁴⁶⁷ *H.b.*, r. 102.

⁴⁶⁸ *H.b.*, r. 126.

⁴⁶⁹ *H.b.*, r. 71.

“... Gava ku tu ghiştî nava bajêr, ew ê her kes ji hêlekê ve bang li te bikin, wê bibêjin “Rêwiyo were çend rojan li cem me bibe mêvan!”⁴⁷⁰

“... Rêwiyo, xuyaye tu xerîb î, kerem bike were peya bibe li mala apê xwe bibe mêvan. Heta te bêhna xwe berda, em binerin bê xêr e û çî hewala te ye, tu li van deran çî digeri? Wê çaxê em ê bi hev re li rê û çareyekê binerin. Memê Alan bi dîtina wî re ji nav dinyaya xeyalan vegeriya, lê vegerand got: Mala te ava be ji bo mêvanperî û hurmeta te.”⁴⁷¹

“... Tu bi xêr û silamet hatiya mêvanê hêja, kerem bike, em bi hatina te şa bûne, bi hatina xwe, te şeref da me Celaliyan!

Mem bi edebek giran got: Hûn di nav xêr û xweşiyê de bin bira!

Hesen bi destê Memê Alan girt, destê wî xist nav herdu destên xwe û ew derxist jor odeya mêvanan. Çeko reviya cotek doşek jê re raxist û bahlîfên pala danîn ber pişt û teniştê.”⁴⁷²

“... Heger ku xwe li me girtibe û bûbe mêvanê me, ev ji bona me rûmet e, ji bo çî hatibe, divê em li gorî adet û usûlê dinyayê çareyekê jê re bibînin. Birano ga dimre çerm jê dimîne mêr dimre nav jê dimîne.”⁴⁷³

“... Hesen derbasî hêla malê bû, ji jîna xwe re Sitê re got:

Ji bona mêvanê me li hêla malê odeyekê vale bike. Xalîçeyên xwe yên herî xweşik lê raxe. Doşekan biavêje ser xalîçeyan, bahlîfên ber pala deyne ser doşekan. Bêhna xweş li hundur odeyê bireşîne. Mêvanê me zilamekî muhîm û giran e.”⁴⁷⁴

“... Bira tu jî baş pê dizanî ku heqê mêvaniyê li cem me kurdan sê roj in, ji sê rojan û şûnde mêvan dibe xwediyê malê.”⁴⁷⁵

⁴⁷⁰ H.b. , r. 72.

⁴⁷¹ H.b. , r. 73.

⁴⁷² H.b. , r. 79.

⁴⁷³ H.b. , r. 83.

⁴⁷⁴ H.b. , r. 83.

⁴⁷⁵ H.b. , r. 84.

Di mînaka me ya jor de jî gotineke rojane ku di civakê de ji bo mêvanan tê bikaranîn heye: *“Heqê mêvanîyê sê roj in.”* Di civaka kurdan de ev kevneşopî hêj dom dike. Piştî sê rojan mêvan dibe xwedîyê malê û mêvan wesfên xwe yên mêvanîyê winda dike.

“... Xelk û alem hemû zanin ku mala me Celaliyan keheheke ji pola ye, gava yekî wek haziran xwe li me bigre, em ji bo şeref û xatirê hatina wî dikarin dinyayê li hev biqelibînin! Hemî tu li me bûyî mêvan, ez ê serê xwe û her du birayên xwe di oxira te de bikim qurban.”⁴⁷⁶

Di vê mînaka me ya jor de noqteyê balkêş a nirxa mêvanperwerîyê derdikeve pêşîya me: Eger yekî xwe spartibe mala yekî û lê bûbe mêvan, mazûvan ji bilî qedirgirtin û hurmetê, di oxira mêvanê xwe de dikare xwe bike qurban. Em di gelek metnên kurdî yên folklorîk de rastî heman mînakê tîn ku di vê xebata me de jî çend mînakên wê hene.

“... Lêbelê tu jî xweş zanibî ku li cem min mêvan gelekî bi rûmet in, derdê wan derdê min, barê wan barê min e.”⁴⁷⁷

Em vê nîrxê di romana Ristemê Zal de, li du cihan tenê, bi vî awayî dibînin:

“... Ger pêhlewaneke mîna te bibe mêhvanê me, gelê Kabilê dê can û ruhê xwe li bin piyên wî bike palas.”⁴⁷⁸

“... Tu îşev bibe mêvanê min; sibehê Xwedê mezin e.”⁴⁷⁹

Di romana Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim de li çend deveran nirxa mêvanperwerîyê bi vî awayî derbas dibe:

“... Ji hespan peya bûn, hespê wan ji destê wan hatin girtin. Pênc beran li ber Paşayê Milan û mêvanên wî hatin serjêkirin.”⁴⁸⁰

⁴⁷⁶ H.b. , r. 86.

⁴⁷⁷ H.b. , r. 88.

⁴⁷⁸ Polat, h.b. , r. 54.

⁴⁷⁹ H.b. , r. 190.

⁴⁸⁰ Kiran, h.b. , r. 20.

“... Paşayê Milan û her sê mêvanên wî yên giran li ser sifreyê rûniştin. Xizmetkaran karên xwe rind dimeşandin, li ser piyan bûn, çi kêmanî hebûna pê re dianîn cih. Çavên wan li civatê bû.”⁴⁸¹

“... Xizmetkaran ava gulên li destên wan direşandin û şekirê rengîn ê qul îkram dikirin.”⁴⁸²

“... Ji xizmetkar û hundirê malê re bibêje bila xizmeta cimaetê spehî bimeşînin û nanekî rind ji me re çêkin.”⁴⁸³

“... Hirço Beg ji mêvanên xwe yên giran re pir izet û îkram kir.”⁴⁸⁴

“... Eysê ava teze ji kaniyê anîbû. Av û dew tev hatin ber mêvanan, kî av xwest, kî dew xwest, vexwarin. Eysê xizmeteke ji dil û can dikir. Dixwest bavê wê fedîkar dernekeve. Mêvanên wan ji giran cihan bûn, mêvanên eybê bûn. Li pey av û avdewê çay û qehwe vexwarin. Qutuyên tutûnê îkram bûn, qutî ji seriyekî ket nav mêvanan di hêla din re derket. Mêvan û mazûvan kêfa wan bi hev hat û dest bi şêwr û muhbetê kirin.”⁴⁸⁵

“... Mazûvan destê mêvan girtibû û dimeşîyan. Dixwest mêvan xwe ji wî û mala wî venekişîne.”⁴⁸⁶

“... Dewrêş navê wê derê bihîstibû, lê tu caran nedîtibû, fehm kir ku şev jî wa ye reş dibe, nikare riya xwe derxe, wê mecbûrî mêvanê vê malê be hetanî sibehê. Mazûvanê wî dilgermiyeke pir germ rê wî da.”⁴⁸⁷

“... Efer gelek hez kiribû ji bo xizmetkirina mêvanê xwe yê Ekrad ê hemtayê wî.”⁴⁸⁸

“... Ez kirim mêvan pir qedr û qîmet dan min.”⁴⁸⁹

⁴⁸¹ H.b. , r. 21.

⁴⁸² H.b. , r. 25.

⁴⁸³ H.b. , r. 26.

⁴⁸⁴ H.b. , r. 40.

⁴⁸⁵ H.b. , r. 59.

⁴⁸⁶ H.b. , r. 111.

⁴⁸⁷ H.b. , r. 112.

⁴⁸⁸ H.b. , r. 112.

“... *Jê re got: “Law tu westiyayî, a ha şênî wa ye, tu here bin konekî, hemû kes dikarin te mêvanî bikin, ev konê han ê Paşayê Milan e, li wir rojê hezarî mîna te nan dixwin.”*⁴⁹⁰

“... *Dewrêş got: “Law tu fedî nakî, carek ev mêvan in, xwe avêtine malên me, mirov nikane dest nede ber wan.”*⁴⁹¹

“... *Eyşê got: “Ser serê me lawê min, çavên min li riya wan bû ku rojekê ew jî li me bibin mêvan.”*⁴⁹²

“... *Hûn mêvan in, jî rêya dûr hatine, hûn rûnin.”*⁴⁹³

“... *Bi serê hespên wan girtin û ji wan re got: “Merheba, hûn bi xêr hatin, derbasî hundir bibin.”*⁴⁹⁴

“... *Keko, mêvaniya te ser serê me, ser çavên me, me pir bêriya we kiriye.”*⁴⁹⁵

“... *Gelekî jî mazûvan bûn, xwe ji mirovan re dikirin erd.”*⁴⁹⁶

“... *Sebrî ji kevaniya malê re jî got: “Keçê mêvanên me mêvanên giran in, jî wan re riza bûxarî çêkin. Sebrî ji mêvanên xwe re şeltên rengîn avêtin ser kulavan. Ava teze û dew gihandin wan. Misîn tije av li paş wan danî.”*⁴⁹⁷

Di romana Evîna Pinhan a Sabrî Akbel de jî li du cihan ev nirx derbas dibe:

“... *Smaîlê Kej, Salih bire mala xwe... Sifre li erdê danîn... Smaîl ji bo ku mêvanê wî şerm neke pê re diştexilî.”*⁴⁹⁸

⁴⁸⁹ H.b. , r. 118.

⁴⁹⁰ H.b. , r. 122.

⁴⁹¹ H.b. , r. 125.

⁴⁹² H.b. , r. 138.

⁴⁹³ H.b. , r. 179.

⁴⁹⁴ H.b. , r. 185.

⁴⁹⁵ H.b. , r. 210.

⁴⁹⁶ H.b. , r. 218.

⁴⁹⁷ H.b. , r. 230.

⁴⁹⁸ Akbel, h.b. , r. 50.

“... Dayîka Siltan jî got: “Afiyet şeker be kurê min. Ma te çîyê me xwarîye. Heta ku tu şixolekî xwe re bibînî, mêvanê me be. Mêvanê Xwedê li ser çava û ser sera...”⁴⁹⁹

Di romana Evîna Mêrxasekî de nirxên mêvanperwerîyê bi vî awayî derbas dibin:

“... Gava ku siwar gihişt nêzîkî konan, xort çûn pêşwaziyê, bi serê hespê wî girtin, birin li mêrgê tewlandin.”⁵⁰⁰

“... Mêvano, tu bi xêr hatî! Di ser serê min, ser çavê min re hatî!”⁵⁰¹

“... Kesên ku dihatine şînê, tu kes ji wan bêxwarin û vexwarin venedigeriya. Bi dehan kar û berx hatin serjêkirin, li ser birincê Qerecdaxê pêşkeşî mêvanan kirin.”⁵⁰²

“... Binê kon û dîwanxaneyê ji çûyîn û hatina mêvanan xalî nedibû. Qefleyek radibû qefleyek rûdinişt. Nav maliyan bê navber qehwe digerandin. Gelek qurban û debîh hatin serjêkirin, li ser birinc û çeltûkê Qerecdaxê hatin pêşkeşkirin. Sifreyek radibû, yeke din dihate raxistin. Bêhna goşt û birinc bi ser konan diket. Di nava ebrê kêf û cejn û şahî bû.”⁵⁰³

“... Birayê delal, êvar e, wextê şîvê ye, pariyek nanê me bixwe, paşê here.”⁵⁰⁴

“... Xulam û xîzmetkaran bê navber qehweya tehl pêşkeşî mêvanan kirin.”⁵⁰⁵

“... Mêvanê delal li cem me ne edet e heya ku mêvan nên nexwe em jê bipirsin. Mêvan mêvanê Xwedê ne. Ji ku tîn, bi kû de herin, Xwedê dizane.”⁵⁰⁶

⁴⁹⁹ H.b. , r. 51.

⁵⁰⁰ Osman, h.b. , r. 14.

⁵⁰¹ H.b. , r. 14.

⁵⁰² H.b. , r. 32.

⁵⁰³ H.b. , r. 48.

⁵⁰⁴ H.b. , r. 67.

⁵⁰⁵ H.b. , r. 70.

⁵⁰⁶ H.b. , r. 108.

“... Silêman Axa mirovekî maldar, çavfîreh û mêvanperwer bû. Mêvanên wî bi awayekî birêkûpêk dihatin pêşwazîkirin, bi heman nêzîktêdayîne dihatin oxirkirin.”⁵⁰⁷

“... Nabe, hûm mêvanên min in. Devera ku hûn biçine heke bi qasî du gavan jî dûr be, divê ez we bigihînim ciyê we.”⁵⁰⁸

“... Temîr Paşa li binê kona xwe ya mezin rûniştibû. Li ciyê rûniştina mêvanan, kulav û merşên nexşîn hatibû raxistin.”⁵⁰⁹

“... Jixwe ew niha mêvanê Xwedê ye, li ber deriyê me ye. Çava mirov mêvanê xwe dîkujê, an pê re pevdişine? Di erf û edetên me de ciyê bêbextiyek wisa nîn e.”⁵¹⁰

Di romana Bilcana Perwîz Cîhanî de jî li çend deveran nirxa mêvanperwerîyê hatiye bikaranîn ku bi vî şiklî ne:

“... Li dû wê qewimîne ra, Mîrî tewawî giregire û ridênsipiyên xwe berev kiribû û mêvandarîyeke giran danîbû.”⁵¹¹

“... Bira pîrsiyar bê xewş e. Tu ji kû têy û tu yê kû da herî?

- Ez mêvan im apo.

- Ay li ser herdu çavan!”⁵¹²

“... Her kê bihata yeksere diçû dîwanxanê û bavê wî bixwe li ber mêvanan va radibû şîpê ta ku mêvan nerûniştana, ew nedirûnişt.”⁵¹³

“... Hesê Dûdêyî giştî mêvanên xwe derbasî hundurê xîvetê kir û paşê li dû hemûyê ra kete hundur û hema wisan li ber derî rawestayî destê xwe da sîngê xwe û serçavanî da Mîrî û mêvanan.”⁵¹⁴

⁵⁰⁷ H.b. , r. 129.

⁵⁰⁸ H.b. , r. 144.

⁵⁰⁹ H.b. , r. 230.

⁵¹⁰ H.b. , r. 324.

⁵¹¹ Cîhanî, h.b. , r. 27.

⁵¹² H.b. , r. 77.

⁵¹³ H.b. , r. 79.

⁵¹⁴ H.b. , r. 131.

“... Êdî tu ji mirinê filitî. Çi hizrên nebaş jî neke. Tu mêvanê vê malê yî. Ta ku birîna te baş qenc nebe, em nahêlin tu herî.”⁵¹⁵

“... Emer Axa giştî giregire û ridênsipiyên êla xwe gazî kir û mêvandarîyeke giran li ser Kerr û Kulikî danî.”⁵¹⁶

2.13. NEFSBIÇÛKÎ

Li gorî Hökelekli nefsbîçûkî, dilnizmî ye, ji kesên ev wesif li ser wan re mitewazî tê gotin.⁵¹⁷ Kesên mitewazî xwe mezin nabînin, zêde metih û pesnê xwe nadin. Nirxeke din a civakî jî nefsbîçûkî ye. Hejmara vê nirxê di romanên kurmancî yên folklorîk de gelekî kêmtir e. Di romanên kurmancî yên folklorîk de, di romanekê de, li deverê tenê ev nirx derbas dibe. Li jêr em ê cih bidin mînakên vê nirxê.

Di romana Ronî War a bi navê Mem û Zînê de li cihekî tenê ev nirx bi vî awayî derbas dibe:

“... Tu jî baş pê zanî ku li gorî adetên me kurdan ne xweş e ku mirov qala xwe û qala hebûn û dewlemendiya xwe bike.”⁵¹⁸

2.14. PAQIJÎ

Yek ji nirxên civakî paqijî ye. Hejmara mînakên vê nirxê jî di romanên kurmancî yên folklorîk de gelekî kêmtir e. Di romanên kurmancî yên folklorîk de, di du romanên de ev nirx derbas dibe. Li jêr em ê cih bidin mînakên vê nirxê.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li deverê tenê ev nirx bi vî awayî derbas dibe:

“... Keyfa wî gelek paqijiya xanê re hat.”⁵¹⁹

Di romana Bilîcana Perwîz Cîhanî de jî li du deveran bi vî şiklî derbas dibe:

⁵¹⁵ H.b. , r. 241.

⁵¹⁶ H.b. , r. 249.

⁵¹⁷ Hökelekli, h.b. , r. 112.

⁵¹⁸ War, Mem û Zîn, r. 87.

⁵¹⁹ Colemêrgî, h.b. , r. 139.

“... Hindekan destê xwe şoştin û hindekan jî neşûştin. Li dû destşûştinê ra berdestikan pêş da ew xwerekê ku li binê curnan da mabû, derînan û paşê binê curnan temîz şoştin û bi perû yê taybetî binê wan hişk û paqij kirin.”⁵²⁰

“... Li wê navê da Baylozî jî destên xwe pak şoşt û hat û li rex Emer Axayî rûnişt.”⁵²¹

2.15. QENCÎ

Qencî, di WikiFerhengê de, di du wateyan de hatiye bikaranîn. Di wateya ewil de “Alîkarîya ku bê beramber tê kirin, xêr, tiştê baş yê ku mirov bo kesekî dike yan dide kesekî bêyî ku bi xwe tu bedelekê jê werbigire. Di wateya diduyan de, ne guneh (li gorî hin dîn û olan) kirinên ku mirov dikare pê biçe bihuştê an xwe ji dojhê biparêze.”⁵²² Nirxeke din a civakî jî qencî ye. Em vê nirxê di destan, efsane û çîrokên gelêrî de li gelek cihan dibînin. Di romanên kurmancî yê folklorîk de jî li gelek deveran em rastî vê nirxê tên. Em ê li jêr nirxên qencîyê yê ku me di romanên xwe de tesbît kirine rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li çend deveran ev nirx bi vî şiklî hatiye bikaranîn:

“... Baweriya min rastiyê, rindiyê, qenciye, mirovaniyê heye.”⁵²³

Di mînaka me ya jor de nirxa qencîyê bi nirxên wek rastî, rindî û mirovatîyê re hatiye bikaranîn û nirxa qencîyê rasterast hatiye dayîn.

“... Ji ber qencîzîrekahiya wî gundiyan jî çavên xwe pîrr dane.”⁵²⁴

“... Gelek qencî ji her duyan jî dîtibûn û gelek nan û ava wan xwaribû.”⁵²⁵

“... Te rûmet û namûsa Yezîdxanê ji destê neyaran anî der. Em ta ku sax in, qenciya te ji bîr nakin.”⁵²⁶

⁵²⁰ Cîhanî, *h.b.*, r. 216

⁵²¹ *H.b.*, r. 241.

⁵²² WikiFerheng, <https://ku.wiktionary.org/wiki/qenc%C3%AE>, 09 Tebax 2019.

⁵²³ *H.b.*, r. 57.

⁵²⁴ *H.b.*, r. 100.

⁵²⁵ *H.b.*, r. 103.

“... Dît ku ji bo însanan qencîxane herî mezin zanatî ye.”⁵²⁷

“... Te ez ji bin darê zulm û zordaran derxistim. Ez qerdarê te me.”⁵²⁸

“... Di rê de qencî li wan kirin û qencyên wan dîtin.”⁵²⁹

“... Xwedê ji jina xûnkarî razî be. Ew qenciya wê li me kirî, dinya din bihête rêka wê.”⁵³⁰

Di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de ev nirx li cihekî bi vî awayî hatiye bikaranîn:

“... Wî piştî xwe dabû xirabî û nerindiyê û berê xwe dabû xweşî û rindiyê.”⁵³¹

Em vê nirxê di romana Dimdimê de bi vî awayî dibînin:

“... Herin bibêjine Xano, em biçûk û mezinên Şemzînanê tu caran vê qencyê ji bîr nakin.”⁵³²

Di romana Mem û Zînê de li cihekî tenê bi vî şiklî derbas dibe:

“... Mem got:

Keko, mexseda min ne ew e ku ez ji bin qencî û camêriya we hersê bira derkevim. Ez mal û xizneyên bajarê Mixribê giştîkî jî bidim we dîsa jî nikarim bi malê dinyayê berdêla camêrî û qenciya we bidim.”⁵³³

Di romana Ristemê Zal de jî li çend cihan em bi vî awayî rastî vê nirxê tên:

“... Ger tu qencyê bikî, tê dê qencyê bibînî û tu xerabiyê bikî jî ew dê were pêşiya te!”⁵³⁴

⁵²⁶ H.b. , r. 106.

⁵²⁷ H.b. , r. 110.

⁵²⁸ H.b. , r. 150.

⁵²⁹ H.b. , r. 150.

⁵³⁰ H.b. , r. 177.

⁵³¹ Uzun, h.b. , r. 25.

⁵³² Şemo, h.b. , r. 147.

⁵³³ War, Mem û Zîn, r. 135.

Di mînaka me ya jor de nirxa qencîyê rasterast û bi awayekî hişyarkerî û şîretkî hatiye dayîn. Mirov qencîyê bike dê qencîyê bibîne, mirov xirabîyê bike dê xirabîyê bibîne.

“... *Gelo ez dê çawa vî deynî bidim û ji bin vê qenciya te derêm?*”⁵³⁵

“... *Ruhê comerdîyê, xawênîyê û qewîniyê! Qenciye ku te kiriye, mîna tîrêjên rojê li hemî rûyê gerdûnê belav bûne.*”⁵³⁶

Ev nirx di romana Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim de jî li cihekî tenê bi vî awayî derbas dibe:

“... *Ji neyartiyê tu feyde tune ye, her tişt bi rindî xweş e.*”⁵³⁷

Em mînakên vê nirxa civakî herî zêde di romana Evîna Mêrxasekî ya Îbrahîm Osman de dibînin:

“... *Baş e, ez ê ji bo te vê xêrê bikim. Hema di kûr û zirav e, bila di wir de bişike.*”⁵³⁸

“... *Bila Xwedê ji dê û bavê te razî be û çî mexsed û mirazên te li vê dinyayê hebin, hevîdar im bi cî werin.*”⁵³⁹

“... *Di pêsiirtengiyê de, hûn di hawara min hatin. Ez niha sax bim, ev bi saya serê we ye. Vê mêraniya we hişt heya ku ez sax bim li dinyayê, deyndarê we bim. Ji vê deqeyê û pê ve, ez bi jiyana xwe deyndarê we me.*”⁵⁴⁰

“... *Çi gava ku pêdiviya te bi me çêbû, xeberekê bişîne bes e, em her gav li cem te ne.*”⁵⁴¹

“... *Mala te ava. Tu caran vê qenciya te ji bîr nakim.*”⁵⁴²

⁵³⁴ Polat, *h.b.*, r. 92.

⁵³⁵ *H.b.*, r. 111.

⁵³⁶ *H.b.*, r. 334.

⁵³⁷ Kiran, *h.b.*, r. 55.

⁵³⁸ Osman, *h.b.*, r. 65.

⁵³⁹ *H.b.*, r. 66.

⁵⁴⁰ *H.b.*, r. 142.

⁵⁴¹ *H.b.*, r. 143.

“... *Bi navê Xwedê, ev Dewrêş mîna Xoce Xizir e, çi gava ku meriv dibe tengasî, ew li wir amade ye.*”⁵⁴³

“... *Dewrêş em ji nava lepên wan xelas kirin.*”⁵⁴⁴

“... *Mala te ava, Apê Cafer. Ez vê qenciya te ji bîr nakim.*”⁵⁴⁵

Di romana Bilîcanê de jî li devereke tenê ev nirx bi vî awayî rastî me tê:

“... *Emer Axa te barekî giran da ustuyê me. Em ta mirinê jî nikarin ji ber vê qencîya te derkevin.*”⁵⁴⁶

2.16. SEBIR

Sebir, tehemûlkirina li hember rewşên zor e. Alîyê vê nirxê yê menewî xurt e. Sebir nirxeke civakî ye ku em vê nirxê di romanên kurmancî yê folklorîk de jî dibînin. Di gelek romanên me de em rastî vê nirxê hatin. Em ê li jêr nirxên sebirê yê ku me di romanên xwe de tesbît kirine rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li çend deveran bi vî awayî hatiye bikaranîn:

“... *Xûdanê sebrê Mîrê Misrê. Hemî şuxul sebra dirêj û bêhna fireh çêdibin.*”⁵⁴⁷

“... *Kalkên kurdan jî beredayî negotibûn: “Xwediyê sebrê mîrê Misrê.”*”⁵⁴⁸

Di van her du mînakên li jor de nirxa sebirê di nav gotineke pêşîyan de hatiye bikaranîn ku çend formên vê gotinê yê din ên wek “*sebr mala Xwedê ye*”, “*sebr mîrê Misrê ye*”⁵⁴⁹ jî hene. Di xebata me de, bi vê mînakê cara ewil em di nav gotineke pêşîyan de rastî nirxeke civakî hatin.

⁵⁴² *H.b.*, r. 159.

⁵⁴³ *H.b.*, r. 162.

⁵⁴⁴ *H.b.*, r. 162.

⁵⁴⁵ *H.b.*, r. 262.

⁵⁴⁶ Cîhanî, *h.b.*, r. 247.

⁵⁴⁷ Colemêrgî, *h.b.*, r. 16.

⁵⁴⁸ *H.b.*, r. 111.

⁵⁴⁹ Mehmet Oncu, *Gotinên Pêşîyan*, Weşanên Enstituya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2009, r. 595.

“... Nazdara min, wan kir tu neke. Sebrê bike, di vê dinyayê de her tişt wek daxwaza zalim û zordaran naçe serî.”⁵⁵⁰

Di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de jî li cihekî tenê hatiye bikaranîn ku bi vî şiklî ye:

“... Evdalo, mehrûmo, dermanê dilê sebr e. Sebr jî ji xebat û şixûl pêkhatî ye.”⁵⁵¹

War, di romana xwe Tehar û Zeharê de li çend deveran balê dikişîne ser vê nirxê:

“... Em ê sebra Xwedê bikşînin, ka belkî deriyekî xêrê ji me re vebe!”⁵⁵²

“... “Xwediyê sebrê milûkê Misrê ye!” wan jî sebir kiribû û sebrê ji bo wan kêfxweşî anîbû.”⁵⁵³

“... Qeder û qismetê me çî be ew e, em nikarin jê birevin! Qey hîna roja me nehatiye, li xwe zor neyne û hebekî sebrê bikşîne.”⁵⁵⁴

“... Jixwe ji bilî sebrê tiştêk ji destê wî nedihat.”⁵⁵⁵

“... Di dilê xwe de got, “Niha divê ez sebrê bikşînim!”⁵⁵⁶

Ronî War di romana xwe ya bi navê Mem û Zînê de jî li cihekî tenê ev nirx bi vî awayî bikaranîye:

“... Hela em hinekî sebir bikin, qey em ê rêyekê bibînin.”⁵⁵⁷

Di romana Ristemê Zal de jî em vê nirxê dibînin ku careke tenê hatiye bikaranîn:

⁵⁵⁰ H.b. , r. 126.

⁵⁵¹ Uzun, h.b. , r. 80.

⁵⁵² War, Tehar û Zeharê, r. 14.

⁵⁵³ H.b. , r. 22.

⁵⁵⁴ H.b. , r. 82.

⁵⁵⁵ H.b. , r. 98.

⁵⁵⁶ H.b. , r. 111.

⁵⁵⁷ War, Mem û Zîn, r. 95.

“... Niha sebr û sebat ji te re divê. Hinekî bisekine... Her tişt bi bêhna fireh, hêdî hêdî...”⁵⁵⁸

Di romana Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim de em li du deveran rastî vê nirxê hatin ku bi vî awayî ne:

“... Mele digot: “Sebr Ellah rehman, Xwedê bide derman.”⁵⁵⁹

“... Eyûb pêxember tîmsala sebrê bû. Xwedê derdan dide, derman jî dide, serê her tiştî divê sebir hebe.”⁵⁶⁰

Di vê mînaka jor de nirxa sebirê bi bûyereke tarîxî ve hatiye girêdan ku bi rastî jî Eyub pêxember bi sebirê hatibû îmtîhankirin. Di vê mînakê de nirxa sebirê rasterast hatiye dayîn.

Di romana Siyabend û Xecê de jî nirxa sebirê li çend cihan bi vî awayî hatiye şixulandin:

“... Bi hêviya ku rêyekê ji xwe re pêde bike sebir dikir!”⁵⁶¹

“... Bimin jî wisa tê ev ne meşa ciwana ye lê ka hela sebir bike ew ê niha kifş bibe bê ew e yan na!”⁵⁶²

“... Ka sebir bikin law ez ê ji we re bêjim!”⁵⁶³

Em vê nirxê di romana Evîna Pinhan de jî li du cihan dibînin:

“... Umrê wê bi sebrê derbas dibû...”⁵⁶⁴

“... Lazim e ku zehf sebra wan hebe... Carna heval û hogirê wan jî ji wan re dibine dijmin... Derwêş bi sebrê digehe miradê xwe...”⁵⁶⁵

⁵⁵⁸ Polat, *h.b.*, r. 151.

⁵⁵⁹ Kiran, *h.b.*, r. 168.

⁵⁶⁰ *H.b.*, r. 168.

⁵⁶¹ War, *Siyabend û Xecê*, r. 87.

⁵⁶² *H.b.*, r. 112.

⁵⁶³ *H.b.*, r. 114.

⁵⁶⁴ Akbel, *h.b.*, r. 26.

⁵⁶⁵ *H.b.*, r. 41.

Di romana Evîna Mêrxasekî de jî li cihekî tenê ev nirx hatiye bikaranîn ku bi vî awayî ye:

*“... Tu tişt bêyî destûra Xwedê nabe, sebrê bidin xwe, ji bo wan dia bikin.”*⁵⁶⁶

2.17. SOZDAYÎN

Mehmet Oncu di ferhanga xwe de sozdayîne wiha pêname dika: Kirina tişteki de bi dêv qewlkin e.⁵⁶⁷ Nirxeke din a civakî ku di romanên kurmancî yê folklorîk de jî hatiye bikaranîn sozdayîn e. Em ê li jêr nirxên sozdayîne yê ku me di romanên xwe yê folklorîk de tesbît kirine rêz bikin.

Herî zêde Ronî War di romanên xwe de cih daye vê nirxê. Di romana xwe ya bi navê *Tehar û Zeharê* de li çend deveran cih daye vê nirxê ku bi vî awayî derbas dibin:

*“... Lê tu jî xweş zanî ku sozek me bi wî dewrêşî re hebû.”*⁵⁶⁸

*“... Li soza xwe ya ku dabû dewrêş difikirî û ji ber ku ew ê li ser soza xwe nesekiniya dilê wî nerehet bû.”*⁵⁶⁹

*“... Cenabê te jî soz dabû wî dewrêşê ku bi saya wî Xwedê li me hatibû rehmê!”*⁵⁷⁰

*“... Ê bila stêrka sibehê ji evîna me re şahidiyê bike ku heta nefesa xwe ya dawî jî ez ê ji bo *Tehar* bijîm!”*⁵⁷¹

*“... Ne ûcdan bi te re heye û ne îman! Ka soz û qerarê ku min û te bi hev re dabûn?”*⁵⁷²

Di romana Mem û Zînê de li çend deveran ev nirx derbas dibe. Nirxa sozdayîne herî zêde di vê romanê de hatiye bikaranîn:

⁵⁶⁶ Osman, *h.b.*, r. 305.

⁵⁶⁷ Mehmet Oncu, *Ferhanga Biwêjan*, Weşanên Sîtav, Stenbol, 2014, r. 257.

⁵⁶⁸ War, *Tehar û Zeharê*, r. 23.

⁵⁶⁹ *H.b.*, r. 24.

⁵⁷⁰ *H.b.*, r. 36.

⁵⁷¹ *H.b.*, r. 45.

⁵⁷² *H.b.*, r. 149.

“... Tu niha derdê xwe ji birayê xwe re bibêje tuyê bibînî sozên ku ez didim çawa bi cih tînim!”⁵⁷³

“... Ez jî te re sond dixwim bi sonda dinyayê ya mezin, heger tu bi wê jî bawer nabî, ez bi telaqê jinê sond dixwim, derdê te çi be bila barê hustê birayê te be! Ez ê bînim cih!”⁵⁷⁴

Gelek cureyên cihê yê sondxwarinê di civaka kurdan de xuya dibin wek ku li jor jî du cureyên wê hatine rêzkirin. Di ya ewil de, li ser dinyaya mezin, di ya duyem de, li ser telaqê jinê sond hatiye xwarin. Mirov li ser tiştên pîroz û biqîmet sondê dixwin. Ji mînakên sondxwarina civakê mirov dikare di derbarê hêmanên wê civakê yê qudsî û pîroz de hin analîzan bike. Di mînaka me ya jor de nirxa sozdayînê rasterast hatiye dayîn.

“... Birano, mirov xwe li mala mêran digre û mêr bi soz û peyvên xwe tên girêdan.”⁵⁷⁵

“... Bira, ez jî sond dixwim û soz didim ku ji hêla min ve jî heger hatina vî mêvanê me ji bo çi be, ez ê bikim.”⁵⁷⁶

“... Soza mêran ji bo sondê sê car e. Sê caran sond xwarin!”⁵⁷⁷

“... Lê ka îcar em ê çawa ji nav derkevin, carekê me soz daye mêvanê xwe, em nikarin soza ku me daye jî li erdê bixin!”⁵⁷⁸

“... Ez zanim me sond xwariye û vegera ji sondê eyb û gunehekî mezin e.”⁵⁷⁹

“... Me çawa qewlê xwe kiribû bila dîsa wisa be. Bi soz û qewlê mêran hûn herdu bira çawa bixwazin û bikin ez jî bi we re me!”⁵⁸⁰

⁵⁷³ War, Mem û Zîn, r. 89.

⁵⁷⁴ H.b., r. 90.

⁵⁷⁵ H.b., r. 93.

⁵⁷⁶ H.b., r. 93.

⁵⁷⁷ H.b., r. 94.

⁵⁷⁸ H.b., r. 104.

⁵⁷⁹ H.b., r. 105.

⁵⁸⁰ H.b., r. 113.

Di vê mînaka me ya li jor de jî nirxa sozdayînê rasterast hatiye dayîn. Di vê mînakê de bi mêran sond hatiye xwarin ku mirov ji vê sondê dikare çend şîroveyan derbixe. Civakeke ku sond bi mêran bê xwarin civakeke pederşahî ye û otorîte û di destê mêran de ye. Di vê civakê de qudsiyeteke mêran heye û têgihîştineke vilo heye ku mêrên sozê bidin, di oxira wê de mirin jî hebe ji soza xwe venagerin. Di civaka kurdan de ev sond roja îroyîn jî tê xwarin lê bi formê “*Bi soza mêrên berê...*”

Di romana Ristemê Zal de ev nirx careke tenê bi vî şiklî hatiye bikaranîn:

“... *Serê min jî jê bibe, ez dîsa li ser soza xwe me.*”⁵⁸¹

Di romana Evîna Mêrxasekî de jî li çend deveran em rastî vê nirxê tên û bi vî awayî derbas dibin:

“... *Şivan bîstekê fikirî:*

- *Baş e, ez soz didim ev mijar ê bi tenê di nava me her duyan de bimîne.*”⁵⁸²

“... *Em ê qasidan bişînin ba Sultên, dilsoziya xwe jê re diyar bikin, em ê bi Qurana E'zîmşan sond bixwin ku em ê li ber dewletê serî ranekin.*”⁵⁸³

“... *Soza min jî, ya te ye. Te çawa xwest bila wekî te be.*”⁵⁸⁴

“... *Ez bi navê Xwedê û pêxember, sonda qesemê dixwim, soz didim ku tiştekî, ji tu kesî re nebêjim!*”⁵⁸⁵

Di romana Bilîcanê de jî li devereke tenê ev nirx hatiye bikaranîn ku bi vî awayî ye:

“... *Ez ne ew qîza me ku ji bona malê cîhanê, li ser gotina xwe bizîvirim. Ezê heta hetanî li ser gîfta xwe rawestim.*”⁵⁸⁶

⁵⁸¹ Polat, *h.b.*, r. 53.

⁵⁸² Osman, *h.b.*, r. 63.

⁵⁸³ *H.b.*, r. 72.

⁵⁸⁴ *H.b.*, r. 180.

⁵⁸⁵ *H.b.*, r. 181.

⁵⁸⁶ Cîhanî, *h.b.*, r. 98.

2.18. WEKHEVÎ

Wekhevî di ferhengê de di wateya rewşa kesan an tiştan wekhevîtin, rewşa alîgirî û dubendîyê nekirin de hatiye bikaranîn.⁵⁸⁷ Nirxa wekhevîyê nirxeke civakî û gerdûnî ye. Em vê nirxê di çend romanên kurmancî yên folklorîk de dibînin. Her çî qas hejmara vê nirxê di romanên kurmancî yên folklorîk de kêm be jî, em ê li jêr nirxên wekhevîyê yên ku me di van romanên de tespît kirine rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de ev nirx, li çend deveran bi vî awayî hatiye bikaranîn:

“... Nexêr... hema ew jî yek e ji me. Kurmanc e, xwedî eşîr, xwedan malbat e, kurd e û keça kurdan e.”⁵⁸⁸

“... Ma ew jî ne însan in? Ma ne kurd in? Ma ne birayên me, xwîna me nin? Nabenda me û wan de tu ferqên girîng jî nîn in. Tu kes zikê dayîka xwe de axa, beg, mîr nehatiye dinê.”⁵⁸⁹

Di vê mînaka me ya li jor de nirxa wekhevîyê rasterast nehatiye dayîn lê ji hin nîşaneyan balê dikişîne ser wekhevîyê. Ji mînakê em fêhmî dikin ku wesfê însanîyê ji bo wekhevîyê bes e û di nava kurdan de her çî qas bawerîyên cihê hebin jî ew dîsa xwîşk û birayên hev in.

“... Hem hûn jî eşîrekî kurdan yê berêz in. Xwîna me yek e. Mal û xakê kurmancan parve nekiri ye. Ferqa me û hewe tune. Dijminên me hemiyar zordarên ereb, ecem, osmanî ne.”⁵⁹⁰

Di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de jî li du cihan em bi vî awayî rastî vê nirxê tên:

“... Evdal hunermend û ziravbihîstiyar bû. Li ber dilê wî, file jî bi qasî misilmanan, ermen jî bi qasî kurdan ezîz bûn. Ev ne bi tenê dengbêjê kurdan,

⁵⁸⁷ Ferhenga Akademîk, <https://www.ferhengakademik.org/index.php>, 09 Tebax, 2019.

⁵⁸⁸ Colemêrgî, *h.b.*, r. 31.

⁵⁸⁹ *H.b.*, r. 55.

⁵⁹⁰ *H.b.*, r. 78.

herweha dengbêjê gelên din ku li welatê Kurdistanê dijiyan, ermen, suryan, keldanan bû jî.”⁵⁹¹

“... *Însan însan e, çi kurd, çi ermen, çi muslîm, çi xaçperest.*”⁵⁹²

Di vê mînaka me ya jor de nivîskar bi çend peyvên kurt lê yên bi bandor balê dikişîne ser nirxa wekhevîyê. Her çi qas netewe û bawerîyên cihê hebin jî divê mirov wan bide alîkî û ji her netewe û bawerîyan re wekhev be.

Em vê nirxê di romana Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim de li du cihan bi vî awayî dibînin:

“... *Di nava yekîtiya me de ferqa me û Bisilmana tune ye, ew jî Kurmanc in, em jî û em di ber hev de dimirin.*”⁵⁹³

“... *Berî her tiştî em Kurmanc in û birayên hev in, ma ez ê çer biavêjim ser we, qey ez har bûme. Temir Paşa got: “Beynûbeynû, em Kurmanc in, em Kurd in û em birayên hev in.*”⁵⁹⁴

Di romana Siyabend û Xecê de, ev nirx li cihekî tenê bi vî şiklî derbas dibe:

“... *Gelî keleşan, ez jî û hûn jî em evdê Xwedê ne. Lê ji ber ku ez feqîr û gurî me hûn hemû xwe li min dikin yek. Hûn nahêlin ez bi rehetî pariyek nan bixwim û hûn neheqiyê li min dikin!*”⁵⁹⁵

Di romana Bilîcanê de jî li du cihan nirxa wekhevîyê hatiye bikaranîn ku bi vî awayî ne:

“... *Rast e, em hemû Kurd in û birayên hev in.*”⁵⁹⁶

“... *Na birayê min. Her kes nikare here xîveta Mîrî. Tenê teterên mîr û mîrekên kurd û mêvanên bilîncanê diçin xîveta Mîrî. Cihê mêvanên dî cuda ye.*

⁵⁹¹ Uzun, *h.b.*, r. 30.

⁵⁹² *H.b.*, r. 94.

⁵⁹³ Kiran, *h.b.*, r. 61.

⁵⁹⁴ *H.b.*, r. 78.

⁵⁹⁵ War, *Siyabend û Xecê*, r. 73.

⁵⁹⁶ Cîhanî, *h.b.*, r. 25.

Silêman li nav hişê xwe da çû. Dîwanxana bavê wî wisan nîbû. Li cem bav û kalê wî hemû kes beranber bûn.”⁵⁹⁷

Di vê mînaka me ya li jor de nirxa wekhevîyê rasterast nehatiye dayîn û nivîskar bi mînakeke neyînî balê dikişîne ser nirxa wekhevîyê. Ji mînakê em fêhmî dikin ku di civakê de tebaqeyên mirovan hene û her kes ne wekhev e. Her kes li gorî statuya xwe ya civakî hereket dike.

2.19. WETENPERWERÎ

Wetenperwerî hezkirina welat, netew, çand, tarîx û zimên e. Wetenperwerî nirxeke netewî û civakî ye. Cihê vê nirxê di civaka kurdan de cihekî pîroz e. Em vê nirxê di gelek destan, efsane, çîrok û çîrokên gelêrî de dibînin. Her wiha ev nirx di romanên me yên folklorîk de jî rastî me tên. Di romanên kurmançî yên folklorîk de li gelek cihan ev nirx hatiye bikaranîn. Em ê li jêr van nirxên wetenperwerîyê yên ku me di romanên xwe de tesbît kirine yek bi yek rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de, li gelek deveran ev nirx bi vî awayî hatine bikaranîn:

“... Rastî jî yekîtiya kurmançan ji bona me ji nimêja subê ferztir e. Hemberê van neyarên kevnare, hewceye av rawestî, em nerawestin.”⁵⁹⁸

“... Ev xake ji me re diyariyê Gotî, Qasît, Kardoxî û Medya ye. Warê hezar hezar salan e. Îskenderê Mezin, Persiyayî, Moxolên talanker, Teymûrê Leng, Şah Îsmail û Sultan Selîm nekarîne dest danin ser welatê Hekaryan. Ew parî dê bimîne gewiya wan de. Berê çawan çêbûye, niha jî çiyayên Hekaryan dê bona wan bibin gor û goristan. Bes, edayê dostanî û yekîtiya li gel eşîrên kurdan yên herêmê ez jî hevalê gotinên hewe me.”⁵⁹⁹

“... De bila kurd jî hemberê wan de aqilê xwe binin serê xwe û xwe bikin yek. Dost û dijminên xwe nas bikin. Ewqas mîrekên kurdan bona çi ne? Mîrê Botan, Mîrê

⁵⁹⁷ H.b. , r. 79.

⁵⁹⁸ Colemêrgî, h.b. , r. 71.

⁵⁹⁹ H.b. , r. 72.

Bahdînan, Mîrê Hekaryan û Mîrê Bedlîsê? Bo çi ne eve hemî? Bila xwe bikin yêk, rex mîrekî bibin kom û hemberê wan dijminan bisekinin.”⁶⁰⁰

Di van her sê mînakên me yên li jor de nirxa wetenperwerîyê rasterast derbas nabin lê em ji çend nîşaneyan fêhmî dikin ku nivîskar dixwaze balê bikişîne ser nirxa wetenperwerîyê. Noqteya hevpar a van her sê mînakên li jor yekîtiyê ye. Bi yekîtiyê kurd dê bigihjin mirazên xwe û wezîfeya serok, pêşeng û mîrekên kurdan avakirina yekîtiyê ye.

“... Ger hebûya me ittîfaqek

Vêkra bikira me inqiyadek

Rom û ereb û ecem tamamî

Hemiyên ji me ra dikir xulamî.”⁶⁰¹

Mînaka me ya li jor çarînek ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî ye. Nivîskar bi devê Ehmedê Xanî dixwaze balê bikişîne ser nirxa wetenperwerîyê. Xaniyê ku bi hîsiyateke netewî ev beyt bi rêz kirine, rêya felatê di tifaq û yekîtiyê de dibîne.

“... Hewce ye ku em kurmanç jî roj bi roj xwe nêzîkî hev bikin. Pêkvedanên xwîné û mirovatîyê hev ra çêkin. Da ku dijmin jî xofê ji me bikit.”⁶⁰²

“... Hem baş bizane ku ez ne ew zîlam im ku xayînen Yezîdxanê di mala xwe de bihewînim û bikim gorî namûs û rûmeta qewmê xwe.”⁶⁰³

“... Neteweyê kurd, bîş e, rêl e û daristan e şêxê min. Şêremêr tu caran jê xilas nabin. Xwediyê wareke qedîm, zeviyeke qelew e û Mezopotamya ye.”⁶⁰⁴

“... Fatîheyek da evîna Melayê Cizîrî û bihorî. Tê giheşt ku Kurdistan di mêjû de warê du cûn mirovan e. Yek şêhidên welat in yê din jî aşiqên nemir in.”⁶⁰⁵

⁶⁰⁰ H.b. , r. 79.

⁶⁰¹ H.b. , r. 80.

⁶⁰² H.b. , r. 80.

⁶⁰³ H.b. , r. 98.

⁶⁰⁴ H.b. , r. 108.

Em vê nîrxê di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de, li du cihan bi vî awayî dibînin:

“... Pênc çiyayên welêt li ber dilê wî pir bi qedir bûn; Agirî, warê xurtî û serbilindî û biratiya kurd û ermenan; Nemrûd, warê kahniya medeniyetan; Cûdî û Herekol, cihên tarîxeke kevnar, îbret û dersan û çiyayê Sîpanê Xelatê, gora Xecê Siyabendê, hêlîna evîndar û dilketiyan.”⁶⁰⁶

“... Şagirtino, xortên çelengino... Destana Xecê û Siyabendê li ber dilê min pir ezîz e. Ew mîna lehiyekê diherike. Ew avahiya mîletê me, rê û rêçên tarîxa me ye. Di nav wê destanê de, meriv mîlet û însanê kurd baş dibîne. Adetên me û rabûn û rûniştina welêt tê de baş dixuyîn.”⁶⁰⁷

Nîrxê wetenperwerîyê herî zêde di romana Dimdimê de cih girtiye ku bi vî awayî derbas dibin:

“... Em giş xulamên te ne, em ê jî mîna mezinan, kal û bavan şer bikin ji bo welatê Kurdistan.”⁶⁰⁸

“... Kal û bavêd me gotine me û ji me re kirine weysêt, wekî em welatê xwe xweyî bikin. Gotine me, Şah Ebas û Padîşahê Romê timî dixwazin me têkine binê destên xwe. Lê heta niha wan nikaribûye erdê me ji me bistînin. Min guman heye ew ê dîsa nikaribin, hûn jî gerek wê weysêtê xweyî bikin.”⁶⁰⁹

Di vê mînaka me ya li jor de nîrxê wetenperwerîyê rasterast derbas dibe. Mînak me ji tarîxê hayedar dike ku Şah Ebas û Padîşahê Romê dixwazin welatê kurdan bi dest bixin lê bi ser nakevin. Kurd weke wesîyeteke ji bav û kalan mayî dê li welatê xwe xweyî derkevin û rê li pêşîya êrîşên Şah Ebas û Padîşahê Romê bigirin.

“... Em erdên xwe, meskenên pêşiyên xwe pak xweyî dikin. Dibe ku ew dîsa bê ser me şêr. Werin em giş li ber erd û esmên sond bixwin: Heta ku yek jî ji me sax be, em şer bikin, erdê xwe nedin dijmin! Gişan sond xwar bi erd û esmên, wekî heta

⁶⁰⁵ H.b. , r. 143.

⁶⁰⁶ Uzun, h.b. , r. 25.

⁶⁰⁷ H.b. , r. 50.

⁶⁰⁸ Şemo, h.b. , r. 54.

⁶⁰⁹ H.b. , r. 55.

ku yek jî ji wan sax be, şer bikin, e'mrê xwe bidin, lê erdên xwe ji dijminan xwedî bikin."⁶¹⁰

Di vê mînaka me ya li jor de nirxa wetenperwerîyê rasterast hatiye dayîn. Kurd, piştî têkbirina êrîşeke dijmin, bi hev re li ser îhtîmala êrîşeke din sond dixwin ku heta yekî tenê jî ji wan sax bimîne, ji bo erdên xwe şer bikin û canê xwe feda bikin. Di vê mînakê de nîşaneyên nirxa wetenperwerîyê gelekî zelal xuya dibin.

"... Wekî Xanoyê Çengzêrîn ê Xwediyê Kela Dimdimê, qeweta wî zor e, xayînî tu caran ji milletê xwe Kurdan re nekiriye mîna hinekên mayîn. Par ne pêrar, wî alîkariyeke rind da Eşîra Takoran."⁶¹¹

*"... Ev welatê Kurdan e, erdê kal û bavên me ye, em ji berê de li vir bûne, tu hukimet di ser me re tune bûne, em nahêlin hûn bên erdên me zêft bikin. Heta ku merivek ji me sax bimîne, em ê bi we re şer bikin!"*⁶¹²

Di mînaka me ya li jor de nirxa wetenperwerîyê rasterast hatiye dayîn û bi awayekî mêranî û bi tund ji dijmin re bersiva berxwedana welatî hatiye dayîn.

*"... Heke welatê Kurdistanê li ber dilê wî şêrîn e, bila esker hilde, bê hewarîya me."*⁶¹³

"... Kurdistan e, ha Kurdistan e, Kurdistan e ha Kurdistan e,

Cîyê te çîya, mêşe, deşt, mêrg û çîman e.

Cîyê e'mra delal, kêf henekan e,

Cîyê şayîya cahilan, keç û xortan e.

De bira Xwedê xirav ke textê Padişahê Romê û Şahê Îranê,

Her sal tê ser me şêr bi de'wa ne.

Timê şingînîya şûran, mertal û kosemisrîyan e...

⁶¹⁰ H.b. , r. 108.

⁶¹¹ H.b. , r. 113.

⁶¹² H.b. , r. 114.

⁶¹³ H.b. , r. 115.

Belkî em Kurd wan re bivin destan e.

(Lê ew yek qet tu caran nabe...)

Lema her sal ser me şingîniya şûran û kosemisrîyan e...

Wan gelek mal birine ber mîratan e,

Lê wana hila tu xêr nedîtine ji wan şeran e.

*Kurdistan e, ha Kurdistan e, miskenê kal û bavê Kurdan e.*⁶¹⁴

*“... Çi qas mirov li wir hebûn, gişan sond xwar serê xwe bidin ji bo dîne xwe, di oxira dîne Sunîyan û di oxira welatê bav û kalan, erde xwe xwedî bikin ji dijminan.”*⁶¹⁵

*“... Di pey vê caba nebixêr re, biçûk û mezinên ehlê Eşîra Beroderan ketibûn wê heyrê, wekî welatê xwe xwedî bikin û nehêlin dijmin bê û erde wan zêft bike.”*⁶¹⁶

*“... Eferim, eferim, keçêd min, îro roja xîretê ye, gerek biçûk mezin sîlehê hildin, biparêzin welatê kal û bavên xwe ji dijminan.”*⁶¹⁷

Di vê mînaka li jor de jî nîşaneyên nirxa wetanperwerîyê bi awayekî eşkere xuya dibin. Ji bo parastina welatê bav û kalan ne tenê mêr şer dikin. Keç, biçûk û mezin her kes divê sîlehê hilde û serî li dijmin rake.

*“... Wan pak dêhna xwe da eskerê Îranê. Van mêrxasên Kurdan ên navdar te digot qey di vê kerbûna xwe de çap dikin çawa li dijmin bixin, wekî millet xelas bikin ji van zulimkaran.”*⁶¹⁸

*“... Em giş gerej jîyîna xwe mîna Posto wiha bidin, lê nehêlin dijmin bê welatê me ji me bistîne, erz û he'yalê me bê namûs bike û me jî têke xulamên xwe.”*⁶¹⁹

⁶¹⁴ H.b. , r. 187.

⁶¹⁵ H.b. , r. 202.

⁶¹⁶ H.b. , r. 202.

⁶¹⁷ H.b. , r. 204.

⁶¹⁸ H.b. , r. 222.

“... Herçî esker li wê derê, li ser meytê Posto hebûn, gişan sond xwarin, wekî e'mrê xwe bidin, lê welatê xwe xwedî bikin ji dijminan.”⁶²⁰

“... Here bibêje Şah Ebas, ez ne xan im, naxwazim bibim xan, lê navê min Xano, navê Kurdan e, ez naxwazim rutbeya xantîyê, ez her dixwazim, wekî Şah Ebas ji me vegere, neyê ser me şêr vî pirtî erdê kal û bavên me ji me nestîne. Yekê jî, ez ne ew Kurd im, ê xayîniyê ji milletê xwe re dike seba zêran.”⁶²¹

“... Wî ji welatê xwe pir hez dikir û di e'mrê xwe de ji bo erdê kal û bavên xwe şer kir.”⁶²²

“... Lê em bawer dikin, wekî em ê erdê xwe xweyî bikin ji van kafiran, ew şîrê ku welîdeya te daye te li te helal be û tu li ser çavan hatî.”⁶²³

“... Di pey van gilîyên Xano re, gişan li ber erd û esmên sond xwarin, bi qesemên mêrê berê ve, serên xwe bidin, lê erdê xwe nadin kesekî.”⁶²⁴

“... Tu şerm nakî? Ne gerek tu şa bî, wekî kurê me bi mêranî jîyîna xwe da ji bo erdê kal û bavên xwe, ji bo millet, tu gerek kubar bî bi kurê wisa re!”⁶²⁵

“... “Weleh em jî pê qayîl in jîyîna xwe bidin ji bo erdê kal û bavan û ji bo namûsê.”⁶²⁶

Di romana Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim de jî li gelek cihan bi vî şiklî hatiye bikaranîn:

“... Dixwest bi wan re têkiliyeke biaheng û xweşgerm deyne û bi wan re berjevendiya milletê Kurd biparêze. Yekîtiyê bi wan re bi xweşî li dar bixe.”⁶²⁷

⁶¹⁹ H.b. , r. 229.

⁶²⁰ H.b. , r. 230.

⁶²¹ H.b. , r. 233.

⁶²² H.b. , r. 239.

⁶²³ H.b. , r. 240.

⁶²⁴ H.b. , r. 243.

⁶²⁵ H.b. , r. 252.

⁶²⁶ H.b. , r. 256.

⁶²⁷ Kiran, h.b. , r. 22.

“... Cimaeta Milan û Berazan di dawiya şêwr û mişêwrên xwe de ghiştin vê biryarê û gotin: “Namûsa Kurmancan hebe wê bi yek bin, bi dewlet bin, siltanê wan jî wê hebe, edalet wê were welatê wan.”⁶²⁸

Di vê mînaka me ya li jor de nirxa wetenperwerîyê rasterast nehatiye dayîn lê em ji hin nîşaneyên vê nirxê fêhm dikin ku nivîskar dixwaze balê bikişîne ser nirxa wetenperwerîyê. Di vê mînakê de nirxên wek yekîtî û edaletê jî hatine bikaranîn û pêwendiyek di navbera wan de hatiye kirin. Li gorî nivîskarî bi yekîtî û dewletbûna kurdan re wê siltanê wan hebe û wê edalet were welatê wan.

“...Hirço Beg got: “Mal ava, em hemû Kurd in û birayên hev in, li ser rindî û rastiye canê me ji we re feda.”⁶²⁹

“... Lê hûn zanibin bav û kalên me Kurdan ji bo axê gelek car bi milletên din re şer kirine. Li ser her bihosta axê xwîna mezinên me heye.”⁶³⁰

“... Dewrêş dîsa vegeriya ser kal û got: “Apo em ne ji bo qîzan û ne jî ji bo axa û paşa hatine cengê. Em ji bo eşîrên Milan, ji bo axa Kurdan hatine cengê. Em ji bo milkanê Kurmancan li van dera nin. Em xedariya Ereban tu car tehemûl nakin. Vegera me nabei emê herin ya Xwedê wê bide me ya bide wan.”⁶³¹

“... Hezar canên min hebin ez wî hezarî jî li hember Şemiran di ber Kurdan de feda bikim.”⁶³²

“... Dewrêş got: “Birawo qey qedera me wisan bû, bav û kalên me ji Şengalê ji bo serxwebûna xwe hetanî van deran hatine, em ji bo rûmeta xwe, ji bo azadiya xwe li ê dinê dijîn.”⁶³³

“... Evdê hem xwestina Eysê dianî cih hem jî digot: “Rinda min me xwedî kirin berx û beran, ji bo van rojan, navê wan, umrên wan, laşên wan feda bûn ji bo Kurmancan.”⁶³⁴

⁶²⁸ H.b. , r. 41.

⁶²⁹ H.b. , r. 45.

⁶³⁰ H.b. , r. 141.

⁶³¹ H.b. , r. 238.

⁶³² H.b. , r. 243.

⁶³³ H.b. , r. 273.

“... Çîlo hebekî bi qehra zêde jê re got: “Lelaw Dewrêş tu çima van galgalan bi cahiltî û xeşimtî dikî, tu zanî em kî ne em ji bo Milan û ji bo xwe tîn, ne ji bo te, ne ji bo Heso û Huso. Em vegerin kirasê pîrekan jî wê bi dest me nekeve ku em li xwe bikin, jiyan li me heram e.”⁶³⁵

Em vê nîrxê di romana Bilîcana Perwîz Cîhanî de jî li çend deveran dibînin ku bi vî awayî ne:

“... Wî bi hizra rizgarîya welatî serî dadinî ser balgî û bi hîvîya azadîya gelî çav li xewê vedikir. Ew her tim li wê hizrê dabû ku welatê xwe li jêr lekmên dagîrkeran derîne.”⁶³⁶

“... Ez îro li ser vê cayîgeha pîroz li pêşberî we hevniştimanên hêja da, gift û erêkirinê dikim, ta roja ku zindî bim, bi can û dil ji bo parastina welatê xwe û serferaziya gelê xwe têbikoşim. Ez li beranber we û niştimanê xwe de sûnd dixom, ku çi caran li parastina gel û niştimanê xwe li hember hêriş û destdirîjkirinên neyaran da xinizî, qelsî, dexesî û kêmasiyan nekim. Ez sûnd dixom bi Yezdan, ku serê min dê di oxira gel û welatê min da be û hindî ez hebim, ezê li vê erka pîroz da, bi dil û can ji bo gel û welatê xwe bixebitim û wec û karên gel û welatî dê li ser hemû kar û barên dî ra bigirim.”⁶³⁷

“... Mêr li ber av û axa xwe datên kuştinê. Kuştina mêran li rêka welatî da şaşîya gel e.”⁶³⁸

“... Welat dayîk e. Mirovên bê welat bê dayîk in. Her kesê ku welatê xwe baş nas neke, qet bila dayîka xwe jî nas neke. Her kesê ku welatê xwe xoş nevé, bila dayîka xwe jî xoş nevé.”⁶³⁹

“... Lê gava ku we dît welatê we ji alîyê neyar û dijminan da dikeve ber bûveya nemanê, li her kî alî welat da be, herin bergiriya welatê xwe bikin.”⁶⁴⁰

⁶³⁴ H.b. , r. 278.

⁶³⁵ H.b. , r. 221.

⁶³⁶ Cîhanî, h.b. , r. 21.

⁶³⁷ H.b. , r. 146.

⁶³⁸ H.b. , r. 180.

⁶³⁹ H.b. , r. 201.

“... *Gelî komelê! Hûn hemû dizanin, ku mala Hesê Dudevî li ber mala Mîrî da, li ber av û axa welatê xwe da, li ber gelê xwe da çî qas xîzmetên girîng kiribûn. Hesê Dudê û her heft kurên wî li giştî jîyana xwe da li xizmeta gel û welatî da bûn.*”⁶⁴¹

“... *Dengê komelê bilind bû:*

- *Ji bo rizgariya gel û welatî em hemû bi dil û gîyan amade ne.*

- *Em hemû amade ne ji bo rizgariya welatê xwe gîyanê xwe bext bikin.*

- *Li rêka welatî da em cangorî ne.*”⁶⁴²

Di mînaka me ya jor de jî hin nîşaneyên nirxa wetanperwerîyê hatine rêz kirin. Ferdên komelê bi hev re yek tiştî dibêjin ku ji bo rizgarîya gel û welatê xwe bi dil û can hazir in û di vê oxirê de jîyana xwe jî bidin.

2.20. XÊRXWAZÎ

Tarhan, nirxa xêrxwaziyê wiha pênase dike: “Xêrxwazî, piştgirîya madî û manewî ji kesên mihtaç re ye.”⁶⁴³ Öztürk jî xêrxwaziyê wek nirxeke civakî dibîne.⁶⁴⁴ Nirxa xêrxwazîyê di civaka kurdan de xwedîyê roleke girîng e; lewma em vê nirxê di destan, efsane û çîrokên gelêrî de, li gelek deveran dibînin. Di romanên kurmançî yên folklorîk de jî ev nirx li gelek deveran rastî me tê. Em ê li jêr van nirxên xêrxwazîyê yên ku me di romanên xwe de tesbît kirine yek bi yek rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li çend deveran ev nirx bi vî awayî derbas dibe:

“... *Deşt û zozanên deverê de çî daxwaza wî hebe, ez amade me ku cî bînim û pêşkeş bikim.*”⁶⁴⁵

“... *Me ji bilî qencyê tu caran xirabî ji wan nedîye.*”⁶⁴⁶

⁶⁴⁰ *H.b.*, r. 312.

⁶⁴¹ *H.b.*, r. 494.

⁶⁴² *H.b.*, r. 495.

⁶⁴³ Tarhan, *h.b.*, r. 148.

⁶⁴⁴ Öztürk, *h.b.*, r. 135.

⁶⁴⁵ Colemêrgî, *h.b.*, r. 10.

“... *Bi kurtî Rustemê zamanî dihate nas kirin. Ser wê mêraniyê de hindî bêjî aqilmend, dijî zulmê, mêvanperwer û hevalê ketî û belengazan bû.*”⁶⁴⁷

Di mînaka me ya jor de nirxa xêrxwaziyê rasterast nehatiye dayîn û bi çend nirxên ji hev cihê re, bi hev re hatiye bikaranîn.

“... *Ez xulamê te me. Destê te maçî dikim. Ta ku ez sax im qenciya te ji bîr nakim.*”⁶⁴⁸

“... *Xêrxwazî û dilnazikiya xwediyê malê gomana bêşuxuliyê ber dilê wî sist kir.*”⁶⁴⁹

Di mînaka me ya jor de nirxa xêrxwaziyê rasterast hatiye dayîn.

“... *Mêrê rojên tengavî û yê ketinan dihate naskirin.*”⁶⁵⁰

Di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de jî ev nirx bi vî awayî derbas dibe:

“... *Wî bi dengê xwe birînên birîndaran diceriband, dilê bêkes, bî û sêwiyan germ dikir, xewn û xeyalên keçên destgirtî û qelindayiyên dineqîşand.*”⁶⁵¹

“... *Neçar û feqîran sê roj û sê şevan xwarin û vexwarin.*”⁶⁵²

“... *Bila çar tişt ji we kêr nebin: jirî û ciwanmerdî, comerdî û xêrxwazî.*”⁶⁵³

“... *Evdalo, dilpako, dilê min jî welê dibê. Bila ew li cem me bimîne, em wî bihewînin, em lê binerin.*”⁶⁵⁴

Di romana Tehar û Zeharê de jî li du cihan, ev nirx bi vî şiklî hatiye bikaranîn:

⁶⁴⁶ *H.b.*, r. 13.

⁶⁴⁷ *H.b.*, r. 66.

⁶⁴⁸ *H.b.*, r. 92.

⁶⁴⁹ *H.b.*, r. 94.

⁶⁵⁰ *H.b.*, r. 96.

⁶⁵¹ Uzun, *h.b.*, r. 24.

⁶⁵² *H.b.*, r. 33.

⁶⁵³ *H.b.*, r. 56.

⁶⁵⁴ *H.b.*, r. 99.

“... *Li xîzan û bêkesan ew ê mal û xwarin bihata belav kirin!*”⁶⁵⁵

“... *Ji kêfa vê hesreta wan ya ku çûbû serî re, li feqîr û xizanan xwarin hat belavkirin.*”⁶⁵⁶

Em vê nirxê di romana Dimdimê ya Erebê Şemo de jî dibînin ku bi vî awayî derbas dibin:

“... *Bibêje, şerm meke, çi qeweta me heye em ê bidine te. Kê xwe li Eşîra Berodoran girtiye, bê alîkarî nemaye.*”⁶⁵⁷

“... *Divê bê gotin, mezinan gişan ji Qadî Begê hez dikir, ne ku bi tenê ji bo mêrxasiya wî, wisa jî jê hez dikirin ji bo hurmeta wî, merdiya wî û timî alîkariya belangazan jî dikir.*”⁶⁵⁸

“... *Em ji we razî ne. Ez şa me, wekî em bi namûs vedigerin, wekî me Roma xayîn î dijminê Kurdan ji ser we hilda û hûn xelas kirin ji zulma Roma bêbext. Em bi dilşayî diçin welatê xwe, Çiyayê Dimdimê. Em giş razî ne ji hurmeta we.*”⁶⁵⁹

Di romana Mem û Zînê ya Ronî War de jî li çend deveran derbas dibin û bi vî awayî ne:

“... *Ka hûn bi ya min bikin em ê rabin berê xwe bidin tewlxana hespan, em ê kihêlan derxînin, em ê zîn û taximê wan girêdin, tengan bişîdînin û zêran biavêjin ser pişta wan. Heta ku ji me hat em ê li feqîr û fuqaran belav bikin!*”⁶⁶⁰

“... *Lingên xwe avêtibûn rikêbê wan, siwar bûbûn û ji qesr û qonaxa xwe derketibûn, li nav bajêr geriyabûn, zêr li feqîr û fuqareyan belav kiribûn.*”⁶⁶¹

“... *Hinek ji malê xwe li feqîr û fuqareyan belav kirine.*”⁶⁶²

⁶⁵⁵ War, *Tehar û Zeharê*, r. 19.

⁶⁵⁶ *H.b.*, r. 22.

⁶⁵⁷ Şemo, *h.b.*, r. 46.

⁶⁵⁸ *H.b.*, r. 112.

⁶⁵⁹ *H.b.*, r. 148.

⁶⁶⁰ War, *Mem û Zîn*, r. 9.

⁶⁶¹ *H.b.*, r. 9.

⁶⁶² *H.b.*, r. 12.

“... Herin devê xezîne û defîneyên xwe yê giran vekin û ji bo xatirê feqîr û fuqareyan, li kuçe û kolanan pereyan birijînin. Divê nefsa ku birçî be hûn têr bikin û heçî kesên tahzî be bi libas bikin. Ji bo xatirê feqîr û fuqareyan qurban û dehiyan serjêbikin.”⁶⁶³

“... Derketin text, ferman dan û devê xezîne û defîneyan vekirin. Li kuçe û kolanan pere rijandin. Ji bona xatirê feqîr û fuqareyan qurban û dehî dan serjêkirin. Ji bona xatirê feqîr, fuqare û sêwîyan çî ji destê wan hat, textsîr nekirin.”⁶⁶⁴

“... Piştî ku mal û pere li feqîr û fuqareyan belav kirin, yê tahzî bi libas kirin û qurban û dehî ji bo xizanan serjêkirin, berê xwe dan taxa Qureyşîyan.”⁶⁶⁵

“... Tu dizanî ku em sê bira ne û wextê ku barê yekî dikeve em xwe dixin bin û radikin.”⁶⁶⁶

“... Xwedê derd daye, derman jî daye. Em ê dermanê derdê birayê xwe bibînin û wî ji vê kula han xelas bikin.”⁶⁶⁷

“... Hesen got: Heger derdê wî çî be em mecbûr in jê re çareyekê bibînin.”⁶⁶⁸

“... Heger berdêla wê çî be ez ê dilketiya wî bînim û miradê wî bînim cih!”⁶⁶⁹

“... Birayê biçûk tim kole û xulamê birayên xwe yê mezin e. Hezar carî bi vî şûrî û bi vê himêliyê ku doza mêvanê me di bajarê Cizîrê de çî be ez ê bi dil û can biqedînim.”⁶⁷⁰

Di romana Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim de li du cihan ev nirx hatiye bikaranîn:

“... Kekê Evdê, ma biratî, merivantî, hevaltî û cîrantî wakîno ye?! We çima xeber neda me, emê jî bi we re bihatana.”⁶⁷¹

⁶⁶³ H.b. , r. 13.

⁶⁶⁴ H.b. , r. 14.

⁶⁶⁵ H.b. , r. 14.

⁶⁶⁶ H.b. , r. 90.

⁶⁶⁷ H.b. , r. 91.

⁶⁶⁸ H.b. , r. 92.

⁶⁶⁹ H.b. , r. 94.

⁶⁷⁰ H.b. , r. 94.

“... *Li Berriyê belkî deh caran di gaziya me hatiye, em minetdarê wî ne.*”⁶⁷²

Di romana Siyabend û Xecê de, li cihekî tenê hatiye bikaranîn ku bi vî şiklî ye:

“... *Bi hêviya ku belkî xêra wî qebûl bibe, heta jê dihat xêr fikir û baweriya ku Xwedê delîlê heyîriyan e, xwe ji Xwedê nedikir!*”⁶⁷³

Di romana Evîna Pinhan de jî li du cihan bi vî şiklî derbas dibe:

“... *Ma qey keda Dayîkê li ser kê nebû? Nîvê heft şevan xewa xwe li xwe biribû û li xwe xew heram kiribû. Wekî Hizir gihabû jinikên bi sancî.*”⁶⁷⁴

“... *Her carekê ku ketiba tengavîyê Hecî Ilyas, tevlî xulamê xwe li dîwanê hazir dibûn. Emrê wî bêqusur anîbûn cih...*”⁶⁷⁵

Di romana Evîna Mêrxasekî de, li devereke tenê derbas dibe û bi vî şiklî ye:

“... *Jin û mêr berê li ziyaret û goran geriyan, kulor û xwarinên ku amade kiribûn wekî xêr dan hev.*”⁶⁷⁶

2.22. XWEŞBÎNÎ

Nirxeke din a civakî xweşbînî ye. Em vê nirxê di romanên kurmancî yê folklorîk de li çend deveran dibînin. Her çi qas hejmara vê nirxê kêm be jî, em ê li jêr nirxên xweşbînîyê yê ku me di romanên xwe de tesbît kirine yek bi yek rêz bikin.

Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li cihekî tenê derbas dibe ku bi vî awayî ye:

“... *Careka din jî biryar ya te ye. Çênebit jî em dîsa mirovên hev in. Dilsarî û dubendî neqeba me de çênabit.*”⁶⁷⁷

⁶⁷¹ Kiran, *h.b.*, r. 193.

⁶⁷² *H.b.*, r. 217.

⁶⁷³ War, *Siyabend û Xecê*, r. 10.

⁶⁷⁴ Akbel, *h.b.*, r. 11.

⁶⁷⁵ *H.b.*, r. 68.

⁶⁷⁶ Osman, *h.b.*, r. 22.

⁶⁷⁷ Colemêrgî, *h.b.*, r. 81.

Di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li çend deveran ev nirx derbas dibe ku bi vî şiklî ne:

*“... Qîza me bi qîma xwe ye. Ew çi, çawan bixwaze, em ê welê bikin.”*⁶⁷⁸

*“... Bi rindî, nermî û edalet hukim li xelkê xwe dikir; wijdan, serbestî û însaniyetê ji kesên nemuslim, cihû, ermen, suryan, keldan, êzîdiyan kêr nedikir.”*⁶⁷⁹

*“... Kurd û ermenan li hev dikirin, diçûn û dihatin ser hev û bi hev re merivatî û kirîvatî danîbûn.”*⁶⁸⁰

*“... Kurdino, qasid bê zewal e. Ez dengbêjê xelkê me. Makine, ermenan mekujine. Ermen pismam û cîranên me ne. Guh medinê, xedar û mêrkuj bê nan û xwê ne. Bêbextî li ermenan mekine. Bêbextî ne karê camêran e.”*⁶⁸¹

Em vê nirxê di romana Dewrêşê Evdî Kulîlkek Bilbizêk û Rim de, li devereke tenê bi vî awayî dibînin:

*“... Lawê min a pêwîst mirovatî ye. Dixwaze bila Bisilman be, dixwaze bila cihûd be, dixwaze bila fileh be, mirovatî bi mirovan re tune be ew ê çer bibe. Ha Bisilman be, ha Êzîdî be ferq nake.”*⁶⁸²

2.23. ZÎREKÎ

Zîrekî ango jêhatîbûn yek ji nirxên civakî ye ku em vê nirxê di romanên kurmancî yên folklorîk de jî dibînin. Hejmara vê nirxê jî di romanên me yên folklorîk de kêr e. Em ê li jêr van nirxên zîrekîyê yên ku me di romanên xwe de tespît kirine yek bi yek rêz bikin û cî bidin wan.

Ev nirx di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li çend deveran bi vî awayî derbas dibin:

*“... Rastî jî jinên yezîdiyan pîr jêhatî ne.”*⁶⁸³

⁶⁷⁸ Uzun, *h.b.*, r. 31.

⁶⁷⁹ *H.b.*, r. 63.

⁶⁸⁰ *H.b.*, r. 90.

⁶⁸¹ *H.b.*, r. 91.

⁶⁸² Kiran, *h.b.*, r. 95.

“... Reşo, tu zilamekî dest hilî. Kuro tu fêris î, Rûstemekî mêran î. Te xwarin jî hazir kir?”⁶⁸⁴

“... Nizanî westiyar çî ye. Guhên wî simtîn e. Derfetê nade ku gotinekê gundiyan dubare bibit. Berê wî diden kê aliyê diçe. Saeta çêrandinê çêrandin, ya avdanê avdan, ya mexelê jî dide mexelê.”⁶⁸⁵

“... Baedrê di gundîniya xwe de gavanekî welê emîn û zîrek nedîtibû.”⁶⁸⁶

“... Xasiyet û xebatkariya wî heya guhê Şêx Xelef jî çû.”⁶⁸⁷

“... Şevan jî nedima betal. Gelek şuxulên mala Şexê û Ferman jî dikirin.”⁶⁸⁸

Di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li cihekî tenê em rastî vê nirxê hatin:

“... Bengîn jîr û serwext bû, di rabûn û rûniştina xwe de giran û efendî, di fahmkirin û bîrbirînê de lezgîn û sivik, di kar û xebatê de bi înad û sebat bû.”⁶⁸⁹

Di romana Dimdimê jî li cihekî tenê bi vî şiklî derbas dibe:

“... Osman Xan, ez xulam, dibêjin, “Xîret avêtine ber kelb, wî jî qebûl nekiriye û xîret xwedî kiriye.” Xîret kubariya mêran e.”⁶⁹⁰

⁶⁸³ Colemêrgî, *h.b.*, r. 33.

⁶⁸⁴ *H.b.*, r. 51.

⁶⁸⁵ *H.b.*, r. 100.

⁶⁸⁶ *H.b.*, r. 100.

⁶⁸⁷ *H.b.*, r. 100.

⁶⁸⁸ *H.b.*, r. 101.

⁶⁸⁹ Uzun, *h.b.*, r. 99.

⁶⁹⁰ Şemo, *h.b.*, r. 76.

ENCAM Û HILSENGANDIN

Nirx, kevîrên bingehîn ên jîyana civakî ne. Civak, bi parastina nirxan re gaveke saxlem diavêjin dahatûyê. Bandora nirxan a li ser mirovan û hereketên wan berbiçav e, her wiha tesîra nirxan li ser civakê jî heye. Lewma em nirxan li gelek aliyê jîyanê dibînin. Ji Serdema Neolîtîkê heya Serdema Modern û Postmodern a îro, mirovahîyê qîmet û nirx daye gelek tiştan. Van nirxan bi demê re gelek form guherîne û xwe bi çand û orfê re girê dane. Her netewe xwedîyê çandeke xweser û taybet e lewma nirxên her netewî jî ji hev cihê ne. Her çiqas nirxên hevpar ên gerdûnî jî hebin, bi giştî nirxên civakan ji hev cihê ne û girîngî û cihê van nirxan di nav civakê de jî ne wek hev in. Mînak, di civaka kurdan de nirxa mêvanperwerîyê xwedîyê cihekî taybet e lê di civaka elmanan de ev nirx ne ew qasî muhîm e.

Edebîyat eyneya civakê ye. Bi vê eyneyê mirov dikarê li civakê binere û derbarê wê civakê de bibe xwedîyê fikir û ramanan. Bi berhemên devkî û yê nivîskî ên edebî mirov dikarê kunyeya civakekê derbêxe ango mirov di derbarê wê civakê de kêzêde bibe xwedîyê hin agahîyan. Ev berhem jixwe folklorîk bin mirov dikare ji aliyê çandê ve, vê civakê ji nêz ve nas bike. Qesta me ya folklorîkê ew e ku ev berhem çavkaniyên xwe ji destan, efsane, çîrokên gelêrî yê anonîm bistînin.

Di edebîyata kurdî de jî gelek berhemên folklorîk hene ku piştî xwe dane destan, efsane, çîrokên gelêrî û hwd. Di vê xebatê de me jî berê xwe da romanên kurmancî yê folklorîk. Me di van romanên kurmancî yê folklorîk de (*Bilîcan, Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizêk û Rim, Dimdim, Evîna Mêrxasekî, Evîna Pinhan, Mem û Zîn, Ristemê Zal, Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê, Siyabend û Xecê, Tehar û Zeharê.*) çî nirxên civakî hebin yek bi yek tesbît kir û di beşa duyem de cih da van nirxan. Di vê beşê de jî em ê tehlîlekê li ser van nirxên civakî yê ku me di romanên xwe de peyde kirine bikin û hin agahîyên îstatîstîkî bidin.

Ji ber ku ev roman piştî xwe didin folklorê û civakê romanên kurmancî yê folklorîk ji aliyê nirxên civakî ve gelekî dewlemend in. Di her yanzdeh romanên xwe de jî me nirxên civakî tesbît kirin. Nirxên civakî yê ku me di romanên xwe de tespît kirine ev in: *Aşitî, bawerî, comerdî, diristî, edalet, efûkirin, fedakarî, hevaltî, hurmet,*

merhemet, mêrxasî, nefsbîçûkî, paqijî, qencî, sebir, sozdayîn, wekhevî, wetenperwerî, xêrxwazî, xweşbîni û zîrekî.

Di yanzdeh romanên ku me xwendî de, bi giştî şeş sed û yek (601) mînakên nirxên civakî hatin tesbît kirin ku me hemû yek bi yek di beşa duyem de rêz kir. Hejmara ku me tespît kirîye ev qas e, dibe ku hejmar ji van zêdetir jî be. Ev hejmar dide nîşandan ku romanên kurmancî yê folklorîk di nava xwe de gelek nirxên civakî dihewînin û ji alîyê nirxên civakî ve têra xwe dewlemend in.

Nirxa *aşitîyê*, di sê romanên folklorîk de derket pêşberî me. Di romana Dewrêşê Evdî de li du cihan, di romana Evîna Mêrxasekî de li cihekî û li cihekî jî di romana Ristemê Zal de hatiye bikaranîn. Bi giştî çar caran em rastî mînakên vê nirxê hatin. Dema em bi nirxên din ên civakî re muqayese dikin, em dibînin ku hejmara vê nirxa civakî li gorî yê din zaf kême.

Nirxa *bawerîyê*, di sê romanên folklorîk de derket pêşberî me. Di romana Cembelî Kurê Mirê Hekaryan de li du cihan, di romana Evîna Mêrxasekî de li cihekî û di romana Tehar û Zeharê de li sê cihan hatiye bikaranîn. Bi giştî şeş caran em rastî mînakên vê nirxê hatin. Ev nirxa civakî jî li gorî nirxên din ên civakî, di romanên me yê folklorîk de kême cih girtiye.

Nirxa *comerdîyê* di her yanzdeh romanên me de jî derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li sê cihan, di Cembelî Kurê Mirê Hekaryan de li pênc cihan, di Dewrêşê Evdî de li du cihan, di romana Dimdimê de li sê cihan, di Evîna mêrxasekî de li çar cihan, di Evîna Pinhan de li du cihan, di Mem û Zînê de li çar cihan, di Ristemê Zal de li şanzdeh cihan, di Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li pênc cihan, di Siyabend û Xecê de li cihekî û di romana Tehar û Zeharê de li cihekî hatiye bikaranîn. Bi giştî pencî caran em rastî mînakên nirxa comerdîyê hatin ku ev ne hejmareke kême e.

Nirxa *diristîyê* di çar romanên me de derket pêşberî me. Di romana Cembelî Kurê Mirê Hekaryan de li du cihan, di Dimdimê de li cihekî, di Evîna Mêrxasekî de li du cihan, di Ristemê Zal de li du cihan hatiye bikaranîn. Bi giştî heft caran em rastî

mînakên vê nîrxê hatin. Mînakên nîrxê diristîyê jî di romanên me de zêde cih negirtiye.

Nîrxê *edaletê* di heşt romanên me de derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li cihekî, di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li çar cihan, di romana Dimdimê de li cihekî, di Evîna Mêrxasekî de li cihekî, di Ristemê Zal de li şeş cihan, di Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li du cihan, di Siyabend û Xecê de li cihekî û di romana Tehar û Zeharê de li cihekî hatiye bikaranîn. Bi giştî jî hevdeh caran em rastî mînakên vê nîrxê civakî hatin.

Nîrxê *efûkirinê* di heşt romanên me de derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li sê cihan, di Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li cihekî, di Evîna Mêrxasekî de li cihekî, di Mem û Zînê de li sê cihan, di Ristemê Zal de li cihekî, di Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li cihekî, di romana Siyabend û Xecê de li cihekî û di romana Tehar û Zeharê de li cihekî hatiye bikaranîn. Bi giştî dozdeh caran em rastî mînakên vê nîrxê hatin.

Nîrxê *fedakarîyê* di çar romanên me de derket pêşberî me. Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li du cihan, di romana Dewrêşê Evdî de li çar cihan, di Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li cihekî û di Siyabend û Xecê de jî li cihekî hatiye bikaranîn. Bi giştî heşt caran em rastî mînakên vê nîrxê hatin.

Nîrxê *hevaltîyê* di şeş romanên me de derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li du cihan, di Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li pênc cihan, di Dewrêşê Evdî de li cihekî, di Evîna Mêrxasekî de li du cihan, di Mem û Zînê de li sê cihan, di Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li cihekî hatiye bikaranîn. Bi giştî çardeh caran em rastî mînakên vê nîrxê hatin.

Nîrxê *hurmetê* di her yanzdeh romanên me de jî derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li heft cihan, di Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li yanzdeh cihan, di Dewrêşê Evdî de li çar cihan, di Dimdimê de li deh cihan, di Evîna Mêrxasekî de li heşt cihan, di Evîna Pinhan de sê cihan, di Mem û Zînê de yanzdeh cihan, di Ristemê Zal de şeş cihan, di Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de şeş cihan, di Siyabend û Xecê de li cihekî û di romana Tehar û Zeharê de jî li deh cihan hatiye bikaranîn. Bi giştî jî

heftê û heft caran em rastî mînakên vê nîrxê hatin. Piştî nîrxa mîrxasîyê, di nav nîrxên me yê civakî de nîrxa herî zêde hatî bikaranîn hurmet e.

Nîrxa *merhemetê* di heşt romanên me de derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li cihekî, di Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li pênc cihan, di Dewrêşê Evdî de li du cihan, di Evîna Pinhan de li cihekî, di Ristemê Zal de li sê cihan, di Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li çar cihan, di Siyabend û Xecê de li cihekî û di romana Tehar û Zeharê de li du cihan hatiye bikaranîn. Bi giştî, nozdeh caran em rastî mînakên nîrxa merhemetê hatin.

Nîrxa *mîrxasîyê* di her yanzdeh romanên me de jî derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li şeş cihan, di Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de nozdeh caran, di Dewrêşê Evdî de li çardeh cihan, di Dimdimê de sî û yek cihan, di Evîna Mîrxasekî de li deh cihan, di Evîna Pinhan de li cihekî, di Mem û Zînê de li şeş cihan, di Ristemê Zal de çil û du cihan, di Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li çar cihan, di Siyabend û Xecê de şanzdeh cihan û di romana Tehar û Zeharê de li cihekî hatiye bikaranîn. Bi giştî, sed û pêncî caran em rastî mînakên nîrxa mîrxasîyê hatin. Di nav nîrxên me yê civakî de nîrxa herî zêde hatî bikaranîn mîrxasî ye.

Nîrxa *mêvanperwerîyê* di neh romanên me de derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li şeş cihan, di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li neh cihan, di Dewrêşê Evdî de li hejdeh cihan, di Dimdimê de li şeş cihan, di Evîna Mîrxasekî de li yanzdeh cihan, di Evîna Pinhan de li du cihan, di Mem û Zînê de li neh cihan, di Ristemê Zal de li du cihan û di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li heft cihan hatiye bikaranîn. Bi giştî, heftê caran em rastî mînakên vê nîrxê hatin.

Nîrxa *nefsbiçûkîyê* tenê di romaneke me de derket pêşberî me. Di romana Mem û Zînê de li cihekî tenê hatiye bikaranîn. Di nav nîrxên me yê civakî de nîrxa herî kêr hatî bikaranîn nîrxa nefsbîçûkîyê ye.

Nîrxa *paqijîyê* di du romanên me de derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li du cihan û di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li cihekî hatiye bikaranîn. Bi giştî, sê caran em rastî mînakên nîrxa paqijîyê hatin. Hejmara vê nîrxê jî li gorî nîrxên din ên civakî kêr e.

Nirxa *qencîyê* di heşt romanên me de derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li cihekî, di Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li heşt cihan, di Dewrêşê Evdî de li cihekî, di Dimdimê de li cihekî, di Evîna Mêrxasekî de li heşt cihan, di Mem û Zînê de li cihekî, di Ristemê Zal de li sê cihan û di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li cihekî hatiye bikaranîn. Bi giştî, bîst û çar caran em rastî mînakên vê nirxê hatin.

Nirxa *sebirê* di neh romanên me de derket pêşberî me. Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li sê cihan, di Dewrêşê Evdî de li du cihan, di Evîna Mêrxasekî de li cihekî, di Evîna Pinhan de li du cihan, di Mem û Zînê de li cihekî, di Ristemê Zal de li cihekî, di Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li cihekî, di Siyabend û Xecê de li sê cihan û di romana Tehar û Zeharê de li pênc cihan hatiye bikaranîn. Bi giştî, nozdeh caran em rastî mînakên vê nirxê hatin.

Nirxa *sozdayîne* di pênc romanên me de derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li cihekî, di romana Evîna Mêrxasekî de li çar cihan, di Mem û Zînê de li heşt cihan, di Ristemê Zal de li cihekî û di romana Tehar û Zeharê de li pênc cihan hatiye bikaranîn. Bi giştî, nozdeh caran em rastî mînakên nirxa sozdayîne hatin.

Nirxa *wekhevîyê* di pênc romanên me de derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li du cihan, di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li sê cihan, di Dewrêşê Evdî de li du cihan, di Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li du cihan û di romana Siyabend û Xecê de li cihekî hatiye bikaranîn. Bi giştî, deh caran em rastî mînakên vê nirxê hatin.

Nirxa *wetenperwerîyê* di pênc romanên me de derket pêşberî me. Di romana Bilîcanê de li heft cihan, di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li heşt cihan, di Dewrêşê Evdî de li neh cihan, di Dimdimê de li nozdeh cihan û di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li du cihan hatiye bikaranîn. Bi giştî, çil û pênc caran em rastî mînakên nirxa wetenperwerîyê hatin.

Nirxa *xêrxwazîyê* di neh romanên me de derket pêşberî me. Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li şeş cihan, di Dewrêşê Evdî de li du cihan, di Dimdimê de li sê cihan, di Evîna Mêrxasekî de li cihekî, di Evîna Pinhan de li du

cihan, di Mem û Zînê de yanzdeh cihan, di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de li çar cihan, di Siyabend û Xecê de li cihekî û di romana Tehar û Zeharê de li du cihan hatiye bikaranîn. Bi giştî, sî û du caran em rastî mînakên nirxa xêrxwazîyê hatin.

Nirxa *xweşbînîyê* di sê romanên me de derket pêşberî me. Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li cihekî, di romana Dewrêşê Evdî de li cihekî û di romana Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê de li çar cihan hatiye bikaranîn. Bi giştî, şeş caran em rastî mînakên vê nirxê hatin.

Nirxa *zîrekîyê* di sê romanên me de derket pêşberî me. Di romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan de li şeş cihan, di romana Dimdimê de li cihekî û di romana Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê de jî li cihekî hatiye bikaranîn. Bi giştî, heşt caran em rastî mînakên nirxa zîrekîyê hatin.

Romanên kurmancî yên folklorîk ji aliyê nirxên civakî ve têra xwe dewlemend in. Di yanzdeh romanên folklorîk de bi giştî 601 nirxên civakî hatin tesbît kirin. Di nav van romanên de ji aliyê nirxan ve ya herî dewlemend, bi sed û du nirxan ve romana Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan e. Di vê romanê de ji bilî nirxên aşitî, nefsbîçûkî û sozdayîne hemû nirxên din ên civakî hatin dîtin. Romana Ristemê Zal jî ji aliyê nirxan ve têra xwe dewlemend e, di vê romanê de jî heştê û çar nirxên civakî peyde bûn. Romana Evîna Pinhan ji aliyê nirxan ve li gorî romanên din ên folklorîk qels e. Bi giştî di vê romanê de tenê sêzdeh nirxên civakî peyde bûn.

Di romanên kurmancî yên folklorîk de nirxên civakî yên ku herî zêde hatine bikaranîn ev in: Mêrxasî (150), hurmet (77), mêvanperwerî (70), comerdî (50), wetenperwerî (45). Di romanên kurmancî yên folklorîk de nirxên ku herî kêma hatine bikaranîn ev in: Nefsbîçûkî (1), paqijî (3), aşitî (4), xweşbînî (6), zîrekî (8). Bi van îstatîstîkên di destê me de em dikarin şiroveyeke bi vî awayî bikin; Di civakê de cihê her nirxî ne wek hev e. Qîmet û cihê hin nirxan ji yên din bêtir e. Di civakê de, cihê nirxên ku zêde tên bikaranîn ji yên din qîmetir e. Di romanên me de jî nirxên wek mêrxasî, hurmet û mêvanperwerî derdiketin pêş lewma em dikarin bibêjin ku ev her sê nirx di civaka kurdan de xwedîyê cihekî taybet in.

Bi van daneyên ku me bi dest xistî hat dîtî ku romanên kurmancî yê folklorîk ji aliyê nîrxên civakî ve xwedîyê naverokeke dewlemend in û em gihîştin wê encamê ku ji bo gelek xebatên akademîk ên nû yê derbarê nîrxan de wê bibin çavkanîyên sereke.

Di romanên kurmancî yê folklorîk de nîrxên civakî bêtir bi rêya rasterast hatine dayîn ango nîrxên civakî di mînakê de rasterast derbas dibe. Lê carinan jî nîrxên civakî bi rêya binavgîn dihat dayîn. Ango her çî qas di mînakê de nîrxên civakî rasterast nehatibe dayîn jî, ji wateyê an jî ji gotinan mirov pê derdixist ku ew nîrxê civakî ye. Di romanên kurmancî yê folklorîk de em rastî her du rêyan jî hatin.

Di romanên kurmancî yê folklorîk de bikaranîna nîrxan jî ne wek hev e. Carinan di metnekê de an jî di hevokê de tenê cureyê nîrxekê derbas dibe, ku di romanên me de jî bêtir di vê formê de ne, carinan jî di metnekê de an jî di hevokê de du, sê an jî bêtir nîrxên ji hev cihê bi hev re hatine bikaranîn. Em di romanên xwe yê folklorîk de li çend deveran rastî hevokên di vê formê de jî hatin.

Temayên romanên kurmancî yê folklorîk ji ber ku bêtir li ser şer û qehremaniyê ne, nîrxên herî zêde hatî bikaranîn jî mîxasî ye ku 150 caran em di romanên xwe de rastî vê nîrxê hatin. Ji aliyê nîrxan ve jî romana herî dewlemend Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan e. Di vê romanê de 102 nîrxên peyde bûn. Romana ku tê de herî kêr nîrxê tespît bûyî, Evîna Pinhan e ku bi giştî tenê 13 nîrxên derbas bûne.

Di bingeha hişmendîya netewebûnê ya ku civakan li ser piyan dihêle û berdewamîya wan dike, parastina nîrxan û veguhezîna wan e. Lewma, di vî warî de romanên kurmancî yê folklorîk bi wê naveroka xwe ya dewlemend gelekî muhîm in.

Nîrxê kevîr û qolonên bingehê jî yê civakî û çandê ne. Bi saya van kevîr û qolonan civak dikarin li ser lingan bimînin. Heke civakek nîrxên xwe yê civakî wînda bike, dê dahatûya wê civakê bikeve xetereyê an jî wê bi asimilasyon û îzolasyonê re rûbirû bimîne. Li hember vê xetereyê jî çeka herî bihêz, li xwedî derketina nîrxan û parastina çandê ye. Lewma em dikarin bibêjin ku nîrx, ji bo dahatûya civakekê roleke gelekî mezîn û girîng dilîzîn. Bi xwedî derketin û parastina

nirx û çandê û veguhezîna wan ji neslên sibe re, dê civak li hember her cure xetereyan serbikevin û dê navê wan her û her li ser dinê bimîne. Weku encamê em dikarin bibêjin ku nirxên civakî erka muhafezekirina ahenga civakê pêk tînin.

Di serê hêmanên ku ferdên civakê peve girê dide û berdewamîya wê civakê pêk tîne nirx in. Nirx, piştgirîyeke sosyal pêk tînin û qalibên hevpar ên tevgerên ku civakê de riayet dibin, dîyar dikin. Nirxên civakî yên ku di romanên kurmancî yên folklorîk de derbas dibin, ji bo nîzama civakî û parastina aşîfîya civakî roleke gelekî muhîm dilîzin. Lewre romanên kurmancî yên folklorîk di vî warî de balê dikişînin ser xwe.

Bandora nirxan a li ser zarok û xwendekaran berbiçav e. Di vî warî de, li hemû dinê, bi rêya perwerdehî û dibistanan ev nirx li zarokan tînin qezenckirin. Di qada kurdî de, romanên kurmancî yên folklorîk dê ji bo xebatên perwerdehîya nirxan ên di pêşerojê de bînin kirin roleke çalak bilîzin û dê bibin yek ji wan çavkanîyên sereke.

Roman ji bo veguhezîna nirxan cureya herî xurt a edebî ye. Di nav van romanên de romanên folklorîk wek xezîneyekê ne, tê de gelek nirxên civakî peyde dibin. Bandora nirxên civakî li ser romanên folklorîk ên kurmancî û xwînerên van romanên jî heye. Peydabûna nirxên civakî di romanên folklorîk de bandoreke erênî li van berhevanan dikin. Alîyê van berhevanan yê dîdaktîk derdikeve li pêş ango ev berhem bi hewandina van nirxên civakî xwedîyê hin peyaman in. Parastina çandê, hezkirina wetan û netewê, xwedî derketina nîzama civakî, yekîtî û piştevanîya civakî û hişmendîya netewî peyamên sereke yên romanên kurmancî yên folklorîk in.

Ev nirxên ku me di romanên xwe yên kurmancî yên folklorîk de tesbît kirine, di derbarê jîyana civakî û jîyana rojane ya kurdan de gelek agahîyan didin me. Bi van nirxên civakî mirov dikare derbarê civaka kurdan de pencereyekê veke û bibe xwedîyê gelek zanyaran û di derbarê wan de profîlekê çêbike û hin analîzên sosyolojîk bike. Bi pencereya tarîxê ku me li jîyana civakî ya kurdan mêzand, me dît ku di jîyana wan de nirxên civakî yên wek mêrxasîyê, hurmet û mêvanperwerîyê gelekî biqîmet in û îro jî qîmetê van nirxan wek do ye.

ÇAVKANÎ

Ahmedzade, Haşim, *Romana Kurdî û Nasname*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2011.

Ahmedzade, Haşim, *Ulus ve Roman*, Pêrî Yayınları, İstanbul, 2004.

Ahmedzade, Haşim, “*Roman û Dîyalog*”, Kovara Wêje û Rexne, Stenbol, hej.2, 2014.

Akbel, Sabrî, *Evîna Pinhan*, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2006.

Akharman, Gülümser, *Lempeya Efsûnî ya Eledîn*, (Wer. : Ümran Altinkılıç, Burhan Tek) Weşanên Zîbeqê, Mêrdîn, 2012.

Alan, Remezan, *Keşkûl*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2019.

Alan, Remezan, *Folklor û Roman*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2013.

Alan, Remezan, *Bendname*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2009.

Amêdî, Sadiq Bahaeddîn, *Folkloru Kurdî*, Weşanên Lîsê, Ankara, 2013.

Aran, Umran, *Roman û Gotar*, Weşanên Peywend, Stenbol, 2019.

Artan, Erdem, *Üniversite Gençliği Değerleri: Korkular ve Umutlar*, TESEV Yayınları, İstanbul, 2005.

Artun, Erman, *Türk Halkbilimi*, Kitabevi Yayınları, İstanbul, 2010.

Aydogan, İbrahim Seydo, *Guman2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*, Weşanxaneyê Rûpelê, Stenbol, 2014.

Aydogan, İbrahim Seydo, “75 Sal û 200 Romanên Kurdî”, <http://www.kurdigeh.com/authors.aspx?an=43&aid=31>, (Pêgehîn: 15 Adar 2019).

Bedirxan, Celadet, *Hawar*, j. 30, Weşanên Belkî, Stenbol, 2012.

Bilgin, Nuri, *Sosyal Psikolojide Yöntem ve Pratik Çalışmalar*, Sistem Yayınları, İstanbul, 1995.

Bolay, Hayri, *Değerlerimiz ve Günlük Hayat*, Dem Dergi, İstanbul, 2007.

Brigitte, Beil, *İyi Çocuk, Zor Çocuk. Doğru Davranışlar Çocuklara Nasıl Kazandırılır?* (Çev. Cuma Yorulmaz), Arkadaş Yayınevi, Ankara, 2003.

Colemêrgî, Îhsan, *Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2013.

Çırak, Ersu, *Cengiz Aytmatov Romanlarının Değerler Eğitime Katkısı*, Yüksek Lisans Tezi, Uşak, 2013.

Dorson, M. Richard, *Folklor û Teoriyên Folklorê Yên Îroyîn*, (Wer. : Necat Keskin), Weşanên Avesta, Stenbol, 2017.

Denîz, Hesên Huseyîn, *Rênîşanêra Vegotina Kurdî*, Weşanên Do, Stenbol, 2008.

Erol, Güngör, *Değerler Psikolojisi Üzerine Araştırmalar*, Ötüken Yayınları, İstanbul, 1998.

Ferhenga Akademîk, <https://www.ferhengakademik.org/index.php>, (Pêgehîn: 08 Tebax 2019).

Gökçe, Orhan, *Türk Gençliğinin Sosyal ve Ahlaki Değerleri*, Selçuk Üniversitesi Ata Dergisi, Konya, 1994.

Göz, Kemal, *Toplumsal Değerler Bağlamında Yaşama Hürriyeti*, Pamukkale Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, İstanbul, 2014.

Hökelekli, Hayati, *Değerler Psikolojisi ve Eğitimi*, Timaş Yayınları, İstanbul, 2013.

Îzolî, D. , *Ferheng*, Weşanên Deng, Amed, 2007.

Karababa, Ali, *Değerler ve Değerler Psikolojisi*, Pegem Akademi Yayınları, Ankara, 2015.

Keskin, Necat, *Folklor û Edebiyata Gelêrî*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2019.

Kiran, Eyup, *Dewrêşê Evdî Kulîlka Bilbizek û Rim*, Weşanxaneyê Nûbihar, Stenbol, 2011.

Korukcu, Adem, *Değişim Sürecinde Toplumsal Değerlerin Eğitiminde Din Eğitimi*, Marife Dini Araştırmalar Dergisi, Konya, 2012.

- Kurdo, Qanatê, *Tarîxa Edebyata Kurdî*, Özge Yayınları, Ankara, 1992.
- Nuray, Kurtdede Fidan, *Sosyal Bilgiler Dersinde Değerler Eğitimi: Nitel Bir Araştırma*, The Journal of Academic Social Science Studies, 2013.
- MEB, [http://mufredat.meb.gov.tr/Dosyalar/2018130153652546-DKAB_\(4-8.%20S%C4%B1n%C4%B1f\)_DOP_%202018.pdf](http://mufredat.meb.gov.tr/Dosyalar/2018130153652546-DKAB_(4-8.%20S%C4%B1n%C4%B1f)_DOP_%202018.pdf), (Pêgehîn: 08 Tebax 2019).
- Mocan, Ahmet, *Abdullah Ziya Kozanoğlu'nun Tarihi Romanlarındaki Değerlerin Türkçe Eğitimi Açısından İncelenmesi*, Yüksek Lisans Tezi, Muğla, 2011.
- Oğuzkan, A. Ferhan, *Eğitim Terimleri Sözlüğü*, TDK Yayınları, Ankara, 1993.
- Oncu, Mehmet, *Ferhenga Biwêjan*, Weşanên Sîtav, Stenbol, 2014.
- Oncu, Mehmet, *Gotinên Pêşiyar*, Weşanên Enstituya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2009.
- Osman, İbrahim, *Evîna Mêrxasekî*, Weşanên Lîs, Stenbol, 2008.
- Osman, Sarı, *Sosyal Değerler Emek ve Sosyal Edebiyata Dair Bazı Düşünceler*, FSM İlmî Araştırmalar İnsan ve Toplum Bilimleri Dergisi, İstanbul, 2013.
- Özensel, Ertan, “*Sosyolojik Bir Olgu Olarak Değer*”, Değerler Eğitimi Dergisi, 1(3), İstanbul, 2003.
- Öztürk, Ayşe, *Değerler Eğitimi Programının 6 Yaş Çocuklarının Sosyal ve Duygusal Gelişimlerine Etkisi*, Selçuk Üniversitesi SBE, Konya, 2011.
- Öztürk, Hüseyin Emin, *Batı Çocuk Klasiklerinde Temel Değerler*, Nar Yayınları, İstanbul, 2008.
- Pertev, Ramazan, *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2018.
- Polat, Edîp, *Ristemê Zal*, Evrensel Basım Yayın, Stenbol, 2007.
- Şemo, Erebb, *Dimdim*, Weşanên Lîs, Diyarbekir, 2016.

- Tarhan, Nevzat, *Değerler Psikolojisi ve İnsan*, Timaş Yayınları, İstanbul, 2016.
- TDK, “Türk Dil Kurumu Sözlüğü”, <http://sozluk.gov.tr/>, (Pêgehîn: 05 Sibat 2019).
- Turna, Murat, *Türk Romanında Değerler Çözülmesi*, İz Yayıncılık, İstanbul, 2015.
- Ulusoy, Kadir&Dilmaç, Bülent, *Değerler Eğitimi*, Pegem Akademi Yayınları, Ankara, 2012.
- Uzun, Mehmed, *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, Weşanên Îthakî, Stenbol, 2015.
- Uzun, Mehmed, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Weşanên Beybûn, Ankara, 1992.
- Uzun, Mehmed, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Îthaki Yayınları, İstanbul, 2010.
- War, Ronî, *Mem û Zîn*, Weşanên Ava, Ankara, 2013.
- War, Ronî, *Siyabend û Xecê*, Weşanên Ava, Ankara, 2013.
- War, Ronî, *Tehar û Ziharê*, Weşanên Ava, Ankara, 2014.
- WikiFerheng, <https://ku.wiktionary.org/wiki/hurmet>, (Pêgehîn: 09 Tebax 2019).
- Yazıcı, Mehmet, *Değerler ve Toplumsal Yapıda Değerlerin Yeri*, Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Elazığ, 2014.
- Yıldırım, Kadri, Ramazan Pertev - Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2013.
- Yazıcı, Kubilay, *Değerler Eğitime Genel Bir Bakış*, Türklük Bilimi Araştırmaları Dergisi, Ankara, 2006.
- Yûsiv, Helîm, *Romana Kurdî*, Weşanên Ronahî, Amed, 2011.

PÊVEK

ROMAN NIRX	BILÎCAN	CEMBELÎ KURÊ MÎRÊ HEKARYAN	DEWRÊŞÊ EVDÎ	DIMDIM	EVÎNA MÊRXASEKÎ	EVÎNA PINHAN	MEM Û ZÎN	RISTEMÊ ZAL	ROJEK-JI ROJÊN EVDALÊ ZEYNIKÊ	SIYABEND Û XECÊ	TAHIR Û ZEHA RÊ	TÊHEV
AŞITÎ			2		1			1				4
BAWERÎ		2			1						3	6
COMERDÎ	3	5	2	3	4	2	4	16	5	1	5	50
DIRISTÎ	2			1	2			2				7
EDALET	1	4		1	1			6	2	1	1	17
EFÛKIRIN	3	1			1		3	1	1	1	1	12
FEDAKARÎ		2	4						1	1		8
HEVALTÎ	2	5	1		2		3		1			14
HURMET	7	11	4	10	8	3	11	6	6	1	10	77
MERHEMET	1	5	2			1		3	4	1	2	19
MÊRXASÎ	6	19	14	31	10	1	6	42	4	16	1	150
MÊVANPERWERÎ	6	9	18	6	11	2	9	2	7			70
NEFSBIÇÛKÎ							1					1
PAQIJÎ	2	1										3
QENCÎ	1	8	1	1	8		1	3	1			24
SEBIR		3	2		1	2	1	1	1	3	5	19
SOZDAYÎN	1				4		8	1			5	19
WEKHEVÎ	2	3	2						2	1		10
WETENPERWERÎ	7	8	9	19					2			45
XÊRXWAZÎ		6	2	3	1	2	11		4	1	2	32
XWEŞBÎNÎ		1	1						4			6
ZÎREKÎ		6		1					1			8
TÊHEV	42	102	64	76	57	13	58	84	50	27	35	601

TABLOYA NIRXÊN CIVAKÎ YÊN DI ROMANÊN KURMANCÎ YÊN FOLKLORÎK DE PEYDABÛYÎ